

K.T.
ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN JÎNDAR
MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind



DÎWANA MELA YASÎN YUSRÎ
(METIN û LÊKOLÎN)

Semih GEZER

121302110

Şêwirmendê Tezê
Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ

ÇEWLÎG - 2015

T.C.
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi



MELA YASİN YUSRİ DİVANI
(METİN ve İNCELEME)

Semih GEZER

121302110

Tez Danışmanı

Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ

BİNGÖL – 2015

NAVEROK

KURTE	vi
ÖZET.....	vii
ABSTRACT.....	viii
PÊŞGOTIN	ix
LÎSTEYA PÊVEKAN	x
KURTBÊJE.....	xi
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM	4
A –JIYAN Û BERHEMÊN MELA YASÎN YUSRÎ.....	4
1.1. Jiyana Mela Yasîn Yusrî	4
1.1.a. Nav û Mexlasa Wî.....	4
1.1.b. Malbat û Zarokatiya Wî.....	5
1.1.c. Zewac û Zarokên Wî.....	6
1.1.d. Xwendina Wî û Seydayên Wî.....	6
1.1.e. Muderîstiya Wî	7
1.1.f. Leqebên Wî Yên Îlmî	8
1.1.g. Hin Alimên Li Ber Destê Wî Perwerde Bûne.....	9
1.1.h. Cihên Lê Wezîfe Kiriye.....	10
1.1.i. Wefata Wî.....	11
1.2. Berhemên Mela Yasîn Yusrî	12
1.2.a. 1. Seyfu'l-Meslû'l-'Ela Mu'elefi'l-Me'lûl	12
1.2.a.2. Fetwayên Mela Yasîn.....	12
1.2.a.3. Rîsaleya Faîzê	12
1.2.a.4. Rîsaleya Tefsîra Ayeta Pêncî û Nehemîn Ya Sûreya Nîsayê.....	12
1.2.a.5. Rîsaleya Derheqê serjêkirina Ajalan.....	12
1.2.b. Berhemên Wî Yên Kurdî	13
1.2.b.1. Rewdu'l-Heyat.....	13
1.2.b.2. Eqîda Îmanê	14
1.2.b.3. Tuhfetu'l-Esdîqa	15
1.2.b.4. Tecwîd	16
1.2.b.4. Dîwan.....	16
B – KESAYETIYA EDEBÎ YA MELA YASÎN YUSRÎ.....	20

2.1. Zimanê Wî.....	20
2.1.a. Devoka Cizîrê	20
2.1.b. Unsûrên Xeyrê Kurdî.....	21
2.1.b.1. Unsûrên Erebi.....	21
2.1.b.2. Unsûrên Farisî	22
2.1.b.3. Unsûrên Tirkî	22
2.2. Kesayetiya Wî Ya Edebî	23
2.3. Helbestvanên Ku Bandor Li Mela Yasîn Kirine	25
2.3.a. Mela Ehmedê Cizîrî	25
2.3.b. Ehmedê Xanî.....	29
2.3.c. Mela Huseynê Bateyî	30
2.3.d. Seydayê Hecî Fettah (Mela ‘Ebdulfettah Hezroyî).....	32
2.3.e. Şêx ‘Eskeriyê Axtepî	34
2.4. Helbestvanên Ku Mela Yasîn Bandor Li Wan Kiriye.....	35
2.4.a. Mela Selameddîn.....	35
BEŞA DUYEM.....	36
A – JI ALIYÊ TEŞEYÊ VE VEKOLÎNA DÎWANÊ	36
1.1. Taybetiyên Teşeyê.....	36
1.1.a. Awayên Rêza Helbestên Dîwanê	36
1.1.b. Rêz û Hejmara Helbestan	36
1.2. Teşeyên Nezmê	37
1.2.a. Helbestên Ji Malikan Pêk Tên	37
1.2.a.1. Qesîde	37
1.2.a.2. Xezel.....	39
1.2.a.2.1. Xezela Musemmat	40
1.2.a.2.2. Xezela Mulemma.....	42
1.2.a.3. Qit‘a.....	43
1.2.a.4. Mesnewî	43
1.2.b. Helbestên Ku ji Bendan Pêk Tên	45
1.2.b.1. Muselles	45
1.2.b.2. Texmîs.....	46

1.2.b.3. Muxemmes	49
1.2.b.4. Museddes	50
1.2.b.5. Tesmîn.....	51
1.2.b.6. Tetsî.....	52
1.2.b.6. Te‘şîr	54
1.2.b.7. Taştîr	55
1.2.c. Wezin (Kêş)	56
1.2.d. Serwa (qafiye) û cûreyên wê	57
1.2.d.1. Li gorî cihê wê yê di risteyê de	58
1.2.d.1.1. Serwaya Kutayî	58
1.2.d.1.2. Serwaya Navekî.....	59
1.2.d.1.3. Serwaya Sereta	59
1.2.d.2. Li gorî Dengan	60
1.2.d.2.1. Serwaya Lawaz.....	60
1.2.d.2.2. Serwaya Asayî	60
1.2.d.2.3. Serwaya Zêdebar	61
1.2.d.2.4. Serwaya Regezdozî (Cînas).....	61
1.2.d.3. Paşserwa (Redîf)	62
B – ANALÎZA UNSÛRÊN KULTURÎ	63
2.1. Dîn.....	63
2.1.a. Xwedê	63
2.1.b. Pêxember	64
2.1.b.1. Mihemmed	64
2.1.b.2. Adem.....	64
2.1.b.3. Îsa	65
2.1.b.4. Eyyub	66
2.1.b.5. Yusif.....	67
2.1.b.6. Nûh.....	67
2.1.b.7. Mûsa.....	68

2.1.b.8. Suleyman.....	68
2.1.c. Kitêbên Pîroz.....	69
2.1.d. Çar Xelîfe.....	70
2.1.e. Keça Hezretî Mihemmed û Pîrekên wî.....	70
2.1.f. Hezretî Mehdî.....	70
2.1.g. Çar Îmamên Mezheban û Îmamê Rebbanî	71
2.1.h. Cin, Horî û Melek	71
2.1.i. Cînet (Bihuşt).....	72
2.1.j. Îqtîbas	73
2.1.j.1. Îqtîbasên Ji Ayetan.....	73
2.1.j.2. Îqtîbasên ji Hedîsan.....	77
2.2. Têgehên Tesewifî	78
2.3. Navên Cihên Taybet.....	81
2.3.a. Welat, Bajar û Gund.....	81
2.3.b. Çem, Çiya, Newal (Wadî).....	82
2.3.c. Cihên Pîroz.....	82
2.4. Yar û Evîndar	83
2.4.a. Yar (Me'şûq).....	83
2.4.b. Evîndar ('Aşiq)	85
2.4.c. Teswîrên Xweşikiyê.....	86
2.5. Rewşên Evînê	87
2.6. Tiştên Siruştî.....	88
2.7. Dem	88
2.8. Ajal û Perende (Heywan)	89
2.9. Riwet (Nebat)	91
2.9.a. Gul û Kulîlk	91
2.9.b. Dar û Ber.....	93
2.10. Unsûrên Stêrnasî (Astirolojî).....	94
2.11. Gewher û Medenên Giranbiha	95
ENCAM	96
BEŞA SÊYEM.....	98
METNÊ DÎWANÊ	98

ÇAVKANÎ.....	233
PÊVEK.....	236



KURTE

Edebiyata Kurdî ya Klasîk ji serdema Eliyê Herîrî heta sedsala bîst û yekê bi gelek helbestvanan û berhemên wan gihîştîye asteke bilind. Dîwanên ku di vî warî de hatine nivîsandin ji hêla naverok û şeklî ve kevneşopiya nûsîna edebiyata klasîk bi awayekî zelal nişan didin.

Mela Yasîn Yusrî, yek ji wan helbestvanên Edebiyata Kurdî ya klasîk e ku di sedsala bîstî de bi helbestên xwe yê klasîk di nav alimên medreseyan de hatiye naskirin. Yusrî bi helbestên xwe yê ji hêla edebî ve bi hêz in dide xuyakirin ku wî tradîsyona edebiyata Kurdî ya Klasîk heta serdema jiyaye jî bi awayekî serkeftî domandiye.

Me di vê xebata xwe ya li ser Dîwana Mela Yasîn Yusrî de tîpguhêziya metnê kir û helbestên wî nirxandin. Em ji hêla teşeyên nezmê û unsûrên kulturî ve li ser helbestên wî rawestiyan; me di vê xebata xwe de dîsa cih da jiyan û berhemên helbestvan. Armanca me ji vê xebatê ev e ku Mela Yasîn Yusrî bidin nasandin û ev tez bibe wesîle da ku dîwana wî wekî berhemên klasîk ên din di Edebiyata Kurdî de cihê xwe bigire.

Bêjeyên Sereke: Dîwana Mela Yasîn Yusrî, Mela Yasîn Yusrî, teşeyên nezmê, edebiyata kurdî, unsûrên çandî.

ÖZET

Klasik Kürt Edebiyatı, Eliyê Herîrî'nin yaşadığı dönemden yirmi birinci yüzyıla kadar bir çok şairin yetiştiği ve eserlerini verdiği bir edebiyattır. Bu edebiyat geleneğinin ürünü olan onlarca divan günümüze kadar gelmiş ve Molla Yasî'nin divanı da bunlardan bir örnektir.

20.yüzyılda yaşayan Molla Yasîn Yusrî, Klasik Kürt edebiyatında bu geleneğin önemli bir temsilcisi olup yazdığı şiirlerle daha çok Kürt medreselerinde ulema tarafından tanınan bir şairdir. Edebî açıdan güçlü olan şiirleri, Klasik Kürt Edebiyatı yazı geleneğinin, şairin yaşadığı yüzyıla kadar devam ettiğini göstermektedir.

Tez çalışmasında divan metnini transkribe ederek şiirlerini içerik ve şekil yönüyle inceledik. Nazım şekilleri ve kültür unsurları bağlamında söz konusu şairin şiirleri üzerinde durduk ve hayatı ve eserleri hakkında bilgi verdik. Bu çalışmada gayemiz Molla Yasîn Yusrî'yî tanıtmak ve yazdığı divanı Klasik Kürt edebiyatına kazandırmaktır.

Anahtar Kelimeler: Mela Yasîn Yusrî'nin Dîvanı, Mela Yasîn Yusrî, nazım şekilleri, Kürt Edebiyatı, kültür unsurları.

ABSTRACT

Classical Kurdish literature covers the works of poets of the period starts from the time Eliyê Herîrî lived to the 21st century. Dozens diwans as a production of this literary tradition have survived until today and Mullah Yasrî's diwan is an example of them.

Mullah Yasîn Yusrî who lived in the 20th century is an important representative of this tradition in classical Kurdish literature. He is mostly known by ulema in Kurdish madrasa. His poems that are powerful in terms of literacy shows that the writing tradition of classical Kurdish literature continued until the century the poet lived.

In this paper, the text of diwan was transcribed and its poems were examined regarding content and form. Poems were studied within the context of verse styles and cultural elements, and information about his life and works was provided. The purpose of this study is to introduce Mullah Yasîn Yusrî and introduce his dwan into the classic Kurdish literature.

Keywords: Mulla Yasîn Yusrî's diwan (collected poems), Mulla Yasîn Yusrî, poetic forms, Kurdish literature, cultural elements.

PÊŞGOTIN

Tradîsyona nûsîna edebiyata kurdî ya klasîk bi sedan sal e ji terefê alim û melayên kurd ve di medreseyên kurdan de tê domandin. Ev tradîsyon ji serdema Elî Herîrî heta niha bê navber hatiye. Di sedsala bîstî de malbata Axtepî wekî ekolek li vê tradîsyonê xwedî derketine. Mela Yasîn Yusrî jî hem wekî alimekî hem jî wekî helbestvanekî di vê pergala medreseyan de cih girtiye. Li gel kitêbên dînî dîwanek jî nivîsandiye.

Ji serdema Melayê Cizîrî heta niha di medrese û dergahên kurdan de ji aliyê alim û şêxan ve gelek dîwan hatine nivîsandin lê belê îro ev bi gelemperî negihîştine ber destê xwendevanan. Dîwana Mela Yasîn Yusrî jî yek ji wan berhemana e. Ji bo ku Edebiyata Kurdî bi awayekî çêtir bê zanîn divê berhemên klasîk ji nav gel werin tomarkirin û xebatên akademîk li ser wan bîn kirin.

Ev xebata me li ser destxeta dîwana Mela Yasîn Yusrî ye ku nûnerekî Edebiyata Kurdî ya klasîk a di sedsala 20î ye. Ev dîwan di pirtûkxaneyê taybet a malbata Mela Yasîn de cih digire û ev dîwan cara yekem dibe mijara xebata me. Me ev dîwan ji bo xebata xwe ya masterê ji malbata wî wergirt. Ji bo ku em vê dîwanê bi dest bixin gelek caran me bi malbata helbestvan re hevdiîn pêk anî. Helbestên Mela Yasîn tev di kitêbekê de cih nagirin ji ber vê yekê di berhevkirin, tesnîfkirin û birêkûpêkirinê de em rastî astengiyên cûrbicûr hatin.

Di pêvajoya amadekariya vê xebatê de gelek kesan alîkarî da me. Di serî de spasiyên xwe ji şêwermendê xwe birêz Prof. Dr. Hasan Çiftçi re pêşkêş dikim. Ji malbata Mela Yasîn Yusrî re spas dikim ku ev destxet da me û bi me re derheqê helbestvan de gelek agahî parve kirin. Bi taybetî ji kurên Mela Yasîn Mihemmed Toprak û Mela Selameddîn re spasiyên xwe pêşkêş dikim. Di hêla teknîk û hwd. de ji birêz Canser Kardaş, Şahiner Güler, İhsan Şehitoğlu û Emin Arslan re jî gelekî spas dikim.

LÎSTEYA PÊVEKAN

- Pêvek 1. Destxeta Tesmîna Mela Yasîn a ji bo Xezela Mela Ehmedê Cizîrî
- Pêvek 2. Destxeta Mesnewiya Mela Yasîn
- Pêvek 3. Destxeta texmîsa Mela Yasîn a ji bo xezela Mela Ehmedê Cizîrî
- Pêvek 4. Destxeta Mela Yasîn Methiyeya ji bo Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî
- Pêvek 5. Destxeta te'şîra Mela Yasîn ji bo Xezela Mela Ehmedê Cizîrî
- Pêvek 6. Destxeta Tetsiya Mela Yasîn ji bo tardiyeya Mela Ehmedê Cizîrî
- Pêvek 7. Destxeta xezela Mela Yasîn
- Pêvek 8. Texmîsa Mela Yasîn a ji bo malikên Hezretî Ebûbekirê Siddîq
- Pêvek 9. Destxeta qesîdeya Mela Yasîn a ji bo Beyana Silsileyê Sadatên Neqşebendî
- Pêvek 10. Destxeta 'Eqîda Îmanê ya Ji bo Mezinan rûpela ewil û ya dawî
- Pêvek 11. Destxeta xezela Mela Yasîn a Erebi
- Pêveka 12. Destxeta qesîdeya Mela Yasîn a ku ji bo Ayetullah Xumeynî nivîsandiye
- Pêveka 13. Helbesta Mela Yasîn a ku di Keşkula Kurmancî de derbas dibe
- Pêveka 14. Helbesta Mela Yasîn a ku di Stêrkên Edebiyata Kurdî de derbas dibe

KURTBÊJE

amd.: Amadekar

Bn.: Bend

bnr.: Binêrin

c.: Cîld

h.b.: Heman berhem

hş.: Hîcrî Şemsî

H.: Hîcrî

Haz.: Hazırlayan

Jd.: Ji dayîkbûna wî/ wê

J.: Jimare

M.: Mîladî

m.: Malik

Ms.: Mesnewî

Msl.: Muselles

Msd.: Museddes

Mx.: Muxemmes

R.: Rûpel

Q.: Qesîde

Q.: Qit'a

X.: Xezel

Wer.: Werger

W.: Wefat

Taş.: Taştîr

Tes.: Tesmîn

Te‘ş.: Te‘şîr

Tx.: Texmîs

Ts.: Tetsî

TDK.: Türk Dil Kurumu



DESTPÊK

Bingeha edebiyata gelên rojhilata navîn Edebiyata klasîk e. Ji vê edebiyatê berhemên cûrbicûr derketinê holê. Dîwan, mewlûdname, mihracname, siyer, ferhengên menzûm, mesnewiyên musteqîl û hwd. berhemên numûne yên vê edebiyatê ne. Di nav berhemên klasîk de dîwan cihekî xwe yê taybet heye. Ev jî ji ber ku ji aliye teşe û cûreyên helbestan ve dewlemend e. Bi saya vê dewlemendiyê mirov dikare hêza edebiyata miletekî bibîne û derbareyê wî gelî de jî hinek agahiyên dîrokî bi dest bixe.

Agahiyên ku me li jor dane ji bo edebiyata qewmê kurd jî her wiha ye. Em dê li ser dîwaneke kurdî rawestin.

Girîngî û Armanca Mijarê

Ji sedsala 16an heta niha dîwan wek berhemeke Edebiyata Kurdî ya Klasîk li çar perçê Kurdistanê bi dehan hatine nivîsîn. Ji van dîwanan hinek hatine çapkirin û hinek ji wan wek destnivîs li cem şexsan in. Dîwanên ku gihîştine ber destê me wek ên Melayê Cizîrî, Melayê Bateyî, Ehmedê Xanî, Pertew Beg, Wedaî, Nalî, Qanî, Şêx Şemseddînê Qutbê Exlatî û dîwanên din dewlemendiya Edebiyata Kurdî ya Klasîk bi hêz dikin.

Ji bo ku em hêza vê edebiyatê xurt bikin me xebata teza xwe yek ji wan berhemên klasîk hilbijart û em li ser wê xebitîn. Ev dîwana ku em li ser xebitîn heta niha nebûye mijara xebatekê û li cihekî nehatiye weşandin. Ji ber vê yekê ev xebat ji bo me pir girîng e. Armanca ew e ku em bi vê xebata xwe vê berhemê bi gelê kurd bidin nasîn. Wek Dîwana Seydayê Mela Yasîn gelek berhem hene ku niha tînan zanîn lê li ser wan xebateke ilmî nehatiye kirin.

Naverok û Rêbaza Tezê

Xebata me bi navê *Dîwana Mela Yasîn Yusrî*; Metin û Lêkolîn hatiye diyarkirin. Ev xebat ji destpêk, du beş, encam û metnê dîwanê yê transkrîbekirî pêk tê. Me di destpêkê de armanca û çarçoveya tezê rave kir. Çavkanî hatin nirxandin û li ser rêbaza tezê agahî hat dayîn.

Beşa yekemîn ji du sernavan pêk tê: “Jiyan û Berhemên Mela Yasîn Yusrî û Kesayetiya Mela Yasîn Yusrî.” Li vir me bi hûrgilî behsa jiyana Yusrî kiriye. Em jê haydar bûne ku ew li ku derê ji dayîk bûye, li ku xwendiyê, wî ji kê îcazet

standiye. Me berhemên wî jî dane nasîn. Em li ser xusûsiyetên zimanê helbestvan û helbestvanên kurd ên ku bandor li wî kirine sekinîn.

Beşa duyem jî wek a yekem ji du serenavan pêk tê: “Ji Aliyê Teşeyê ve Vekolîna Dîwanê û Analîza Unsûrên Kulturî.” Me di vê beşê de teşeyên nezmê û qalibên erûzê yên ku Mela Yasîn bi kar anîne tesbît kirine. Her teşeyeke nezmê hatiye pênasekirin û ji helbestan mînak hatine dayîn. Me helbestên ku ji wan mînak girtine bi nimroyan diyar kirine. Em dîsa li vir li ser serwa û paşserwayê sekinîne û me bi mînakan pênaseyên wan kirine.

Di beşa sêyemîn de me cih daye metinê dîwanê yê ku ji terefê me ve hatiye transkrîbekirin.

Çavkaniyên Tezê

Çavkaniyên xebata teza me ya bingeh destnivîsên Seydayê Mela Yasîn Yusrî bi xwe ne. Dîwana Yusrî ne dîwaneke mureteb e. Helbestên wî bi piranî di destnivîsa ku destpêka wê Tuhfet’ul-Esdîqa ye de cih digirin. Li ser daxwaza me Kurê Seydayê Mela Yasîn Muhemmed Toprak helbestên wî bi tevahî nivîsîn û ew jî wek destnivîsek kete destan. Lê belê me ji bo xebata xwe wek çavkaniya eslî destnivîsên Seydayê Mela Yasîn Yusrî qebûl kirin.

Çavkaniyên din jî malbata Yusrî bû. Derbareyê jiyana û berhemên wî de me agahî ji kurên Seyda wergirtin. Ev çavkaniyên şexsî Mela Selameddîn û Muhemmed Toprak in. Ji bilî van çavkaniyên sereke helbet hin çavkaniyên edebî jî hene ku me ji bo teknîka teze ji wan îstîfade kir. Ew jî ev in:

Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi: Biçim-Ölçü-Kafiye*.

Ahmet Talat Onay, *Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar*.

Haluk İpekten, *Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz*.

Rêbaza Amadekirina Metina Dîwanê

Di amadekirina metinê de rêbazên me bi kar anîne ev in:

- a) Me ji bo transkrîbsiyona dîwanê destnivîsên Seydayê Mela Yasîn Yusrî esas girtin.
- b) Alfabeya transkrîbsiyonê ya ku me bi kar aniye li jêrê hatiye destnîşankirin:

ح	h
ذ	z
ض	ḏ, z̤
ص	ṣ
ط	ṭ
ظ	ẓ
ع	‘
غ	ḡ
ء	’
ى	î, ê

c) Me helbestên Yusrî li gorî tertîba dîwanê kirine rêzê û ev tertîb wiha ye: Qesîde (Munacat, Ne‘t, methiye û hîcwiye), xezel (xezelên musemmat û mulemma), musemmat (muselles, muxemmes, texmîs, museddes, musemmen, tetsî, te‘şîr), mesnewî û qit‘a.

- c) Me ji bo her helbest û her malikên helbestan nimroyek danî. Ev yek ji bo referansên malik û bendên ku di nav xebata tezê de tên bikaranîn karê xwîner hêsan dike.
- d) Me ji bo malik û bendên ku di beşa yekemîn û duyemîn de wek mînak nîşan dane alfabeya transkrîbsiyonê bi kar neaniye.
- e) Peyvên wek cîhan, rih, cîger, qîtal û peyvên hwd. Li gorî îmlaya wan a eslî hatine nivîsîn. Ev wiha ne: rûh, ciger, qital, cihan û hwd. Dema ku em van peyvên di forma wan a resen de nenivîsin wezin xera dibe an ji holê radibe.
- f) Me riste û malikên ku ne aîdê Yusrî ne bi awayê îtalîk nivîsîne.

BEŞA YEKEM

A –JIYAN Û BERHEMÊN MELA YASÎN YUSRÎ

1.1. Jiyana Mela Yasîn Yusrî

1.1.a. Nav û Mexlasa Wî

Navê helbestvan di nasnameyê de Yasîn e. Di nava gel de bi navên Mela Yasînê Şemê û Mela Yasînê Sergewra tê nasîn. Ji ber ku navê diya wî Şemsîxan e, jê re Mela Yasînê Şemê hatiye gotin û ji ber ku li Sergewra jî muderistî kiriye navê Mela Yasînê Sergewra jê re hatiye gotin. Piştî derketina qanûna paşnavan, paşnavê malbata wî bûye Toprak.

Mela Yasîn di helbestên xwe de nasnavê (mexlasa) *Yusrî* bi kar aniyê. Bi tenê di helbestekê de Yasîn Yusrî derbas dibe.

Malikên ku nasnavê wî di wan de derbas dibin ev in:

(X. 2/11 m.)

Eger çenda ku şehbâz û cihângîr im di nezmê da

Welî derd û xeman **Yusrî** kirin lal wan zimanê min

(Taş. 2/14 bn.)

Dizanim derd û ekdarê hebîbê cumle ihsan in

Li **Yasîn Yusrî** lew derd û elem tev jê re nişan in

Hezar hemd û şukur bo Heq Te‘ala derdê derman in

Ilac û melhema cerhê tivingê zenb û ‘isyan in

Ji ber vî ‘Eskerî jê hemd û şukr û hem temenna kir

1.1.b. Malbat û Zarokatiya Wî

Mela Yasîn, kurê Mela Derwêş e. Navê diya wî Şemsîxan Xanim e. Mela Derwêş ji Mûşê koçî Pasûrê kiriye û di nava gel de alimekî navdar e. Ji bo eslê malbata Mela Yasîn sê riwayet tên gotin. Ji wan riwayetan a yekem binemala malbata wî ji Mezopotamyaya Başûr, a duyem jî îdia dike ku malbat ji dorhêla Şamê hatiye. Li gorî rîwayetêke din jî malbata wî ji aliyê bav ve digihê Şêx Mihyeddînê Erebî. Seyîdbûna wî ji binemala Hezretî Mihemmed tê. Lê belê ev agahî ne misoger e. Ji ber vê yekê Mela Yasîn naxwaze bi vê agahiyê were nasîn û ev agahî tenê bi malbata xwe re parve kiriye¹.

Mela Yasîn, li gundê Xerzika navçeya Pasûrê (Qulp) a Amedê hatiye dinê. Tarîxa rojbûna wî di kutikê de li gorî salnameya rûmî wekî 1314 hatiye tomarkirin. Lê li gorî gotina wî û derdora wî ev tomara di kutikê de ya birayê wî Hesên e. Rastiya sala zayîna wî li gorî riwayeta dayika wî 1906 e (H. 1315/1316). Hê ew şeş mehî bû, bavê wî diçe rehma Xwedê. Berî bavê wî wefat bike ji jina xwe re dibêje: “Yasîne min bîne, ji dûr ve careke dawî lê binêrim.” Wexta ku diya wî Yasîn tîne û ji dûr ve şanî wî dide, hinekî lê dinêre û ji jina xwe re dibêje: “Teqez tu wî bidî xwendin. Înşallah ew ê bibe alimekî mezin.” Diya wî ji aliyekî xwe ve felc e. Ji mêrê wê zêde mal û milk jê re nemîne. Wê demê xelaya ku jê re dibêjin “xelaya mezin” çêdibe. Dayika wî derfetê nabîne ku zaroyên xwe xwedî bike. Radihêje zaroyên xwe û diçe cem birayê xwe. Xalên wî Yasînî xweyî dikin. Piştî çend salan Mela Yasîn û dayika xwe ji cem wan diçin. Wê demê ew şeş salî ye. Wexta ji gundê xalên xwe derdikevin û diçin, diya wî hertim li pişt xwe mêze dike. Ev rewş di wî emrî de bala wî dikişîne. Piştî çend salan ew ji dayika xwe ve rewşê dipirse, dayika wî ve bersivê didiyê: “Kurê min, wê demê min nizanîbû em ê bi ku derê ve biçin û em li rastê mabûn. Min hêvî dikir belkî xalên te poşman bibin û yekî bişînin pey me. Ji ber vê yekê min li pişt xwe dinêrî.” Bi wê biçûkatiya xwe bibû xweyê ezmeke mezin a xwendinê. Di rê de Yasînî bi dengê bilind sûretê Yasîne jiber dixwend. Etarek di ber wan re derbas dibe û wî dibîne, bi heyranî lê guhdar dike û dûvre qumaşê gumlekekî diyarî wî dike. Diya wî di cih de jê re didirû û lê dike. Ji bo vê bîranînê

¹ Hevdîtina taybet: Muhemmed Toprak, kurê Mela Yasîn, Nîsan 2015.

ew vê gotinê dibêje: “Di jiyana min de tu kinc û cil weke wî gumlekî xweş li ser min rûneniştîye û ewqasî kêf nedaye min.”²

1.1.c. Zewac û Zarokên Wî

Mela Yasîn, yekem car dema xwendevaniyê de zewiciye. Jina wî ya pêşî keça Îbrahîm, Zeynep Xanim e. Ji vê zewacê bi navên Eleddîn, Selameddîn û Hadî sê kurê wî çêbûne. Ji wan hersiyar niha tenê Selameddîn sax e û bi awayekî fermî melatîyê dike. Cara diduwan piştî tehsîla medreseyê bi neviya Şêx Mihemmed Selîm (Hezanê), keça Şêx Mesûm Reyhanet Xanim re dizewice. Ji vê zewaca wî zarokên wî çênabin û du sal piştî zewacê jina wî Reyhanet Xanim diçe rehma Xwedê. Mela Yasîn piştî mirina van herdu jinên xwe, cara sisiyan bi keça Mela Yûsuf, Yasemîn Xanim re dizewice. Ji vê zewaca wî ya sisiyan şanzdeh zarokên wî çêdibin. Çar ji van zarokan hê di biçûkatiya xwe de diçine ser rehma Xwedê, ji wan donzdeh jî hê sax in³.

1.1.d. Xwendina Wî û Seydayên Wî

Ji bo xwendina Mela Yasîn bavê wî wesiyyet li jina xwe kiriye. Ji ber wesiyyeta mêrê xwe Şemsîxan mecbûr maye ku Yasîn bide xwendin. Piştî dayika wî ji cem xalên wî vediqete li gundekî cî digire. Melayê gund ê fexrî (li gorî rîwayetekê Mela Salih) wî li cem xwe dide xwendin. Mela Yasîn jî di karên malê de alîkariya malbata seydayê xwe dike. Ew ji aliyekî dersên xwe yê Qur’ana pîroz distîne û pê re ew û dayika xwe hemû karên malê dikin. Dersên Qur’ana pîroz, eqîde û mewlûdê ji vî melayî distîne. Perwerdehiya dînî ya ewil li vir diqedîne û dixwaze biçe cem seydayên meşhûr dersên din bistîne. Ji ber vê yekê dema hinekî mezin dibe ji gund diçe. Di wê serdemê de navçeya Amedê Farqîn, bi gelek mirovên navdar tê zanîn û bi medrese û muderîsên xwe meşhûr e. Seyda Mela Huseynê Qiçik û Seyda Mela Yehyayê Ferhendî di nava gel û telebeyan de yê herî navdar in. Mela Yasîn dixwaze

² Seydayê Mela Yasîn Yusrî, *Baxçê Jiyanê Piştî Mirinê* (amd. Muhemmed Toprak), Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2011, r. 5.

³ Z. Fuat Toprak, “Seyda Molla Yasin Hayatı ve İlmi Kişiliği”, *Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi* Diyarbakır 2009, hejmar1, r. 122-131.

ji van herdu seydayan ji yekî dersan bistîne. Teqdîra Xwedê Seydayê Mela Yehya dibe seydayê wî.

Jiyana medreseyê ya Mela Yasîn ji ya hevalên wî diwartir derbas bûye. Ji ber ku sêwî û bêkes e, gelek zehmetî û tengasî kişandiye. Mela Yasîn di dema xwendevaniya xwe de bi qabiliyeta axaftin, xebatkarî, zîrekî, ezm û feraseta xwe meşhûr bûye. Dema ew hêj telebe bûye seydayê wî Mela Yehya dersên gelek telebeyên xwe bi wî dane dayîn. Wî di temamê serdema feqîtiya xwe de ji sê seydayan ders girtiye. Giramera Erebi, Fiqih, Tefsîr, Hedîs, Siyer, Mentiq, Hesab û dersên rêzê yên medreseyê xwendine. Dema li cem Mela Yehya dixwîne ji hevaldersê xwe Mela Îbrahîm jî hinek ders standiye. Di medreseya Seyda Mela Yehya de rihberdan mecbûrî ye. Telebeyên reha xwe qût bikin ji medreseyê têne derxistin. Seyda Mela Yasîn wek telebeyên din dike dilê xwe ku ji cem Mela Yehya here. Piştî demekî kurt vê fikra xwe bi cih tîne û ji cem Mela Yehya diçe. Lê belê ji tu Seydayên din dersan nagire û dîsa vedigere cem wî. Derdor vê rewşê li ser nexwestina rihberdana Mela Yasîn şîrove dike. Lê bi gotina Mela Yasîn, wî di jiyana xwe de tu carî gûzan li riha xwe nexistiye. Piştî veqera cem Mela Yehya ji wir hew vediqete û xwendina xwe ya medreseyê li cem wî li gundê Ferhendê yê girêdayê navçeya Ferqînê, diqedîne. Di 1933yan de îcazeta xwe jî ji Mela Yehya distîne.

Hevalên Mela Yasîn ên medreseyê (ên têne zanîn); Mela Salih, Mela Muhammed Uyanik û Mela Şemseddînê Çîçikî ne. Mela Şemseddîn jî piştî Mela Yasîn îcazeta xwe distîne ji seydayê xwe Mela Yehya destûrê dixwaze û heta îcazeta xwe standiye li cem Mela Yasîn xwendiyê. Dawiya dawîn hem dibe hevalê wî hem jî dibe telebeyê wî⁴.

1.1.e. Muderîstiya Wî

Di medreseya wî de perwerdekarî û hîndekarî di nav hev de dihate dayîn û qet ji hevdu nedihate veqetandin. Li gorî wî li ser telebeyan tenê mafê seydayan nîne; mafê dayika wî, bavê wî, malbata wî, gundiyên wî û hamû gelên misliman heye. Di heman demê de ew di wê baweriyê de bû ku li ser wan hemûyan jî mafê seydayan

⁴H.b., r. 124.

heye. Li gorî wî seyda di nava çî şert û mercan de be jî divê dersan bide, xwendekar di nava çî şert û mercan de be jî divê dersan bistîne, gelê misilman di nava çî şert û mercan de be jî divê xwedî li telebeyan derkeve û piştgiriyê bide wan. Bi van wesîleyan jî ked û fedakariya tu kesî vala dernediket. Mela Yasîn bi kinc û bergên xwendevanên xwe re, têkiliyên wan ên bi hev re, ên bi civakê re û ger hewcedarî pê bidîta heta bi zewacan wan re jî eleqedar dibû. Xwendekarên medreseya wî pênc wextan bi cemaetî nimêj dikir. Di medreseya wî de disîplîneke cidî hebû. Xwendekar xodserane nedihate berdan û ji tiraliyê re destûr tûne bû⁵. Ji her alî ve divê bibûna pêşengên civakê. Car caran her çiqas hejmara xwendekaran bigihêje şêst-şêst û pêncan jî ew bi wan re yek bi yek eleqedar dibû. Heta mecbûr nedima dersên xwe teslîmî tu kesî nedikirin. Wî piştî nimêja sibeyê dest bi dersan dikir û encex heta nimêja ‘eşayê xilas dikir. Bi vegotina ewil ger xwendekar têngihîştibe wî vegotina carekê nedihesiband. Rê û rêbazên cuda û bi şêkil û mînakên cuda ders dubare dikir. Ev dubarekirin heta xwendekar têngihîştin dihat domandin. Her carê ji xwendekaran dipirsî: “Gelo hatiye famkirin an na?”. Li erênîya bersîvan nedinêrî û famkirina wan ji çavên wan kontrol dikir. Armanca wî ne dayina dersê bû, hînkirin bû û heta telebe hîn nedibûn jî ew bernedidan⁶. Dema ders dida heta bi tetbîqên dersê jî îzafe dikir. Bêje û biwêjên di demên berê de dihatine bikaranîn jî werdigerandin zimanê demê. Ji bo ku disîplîna medresaya wî ewqas baş bû, gelek telebe ji wir derketine û çûne hin medreseyan din. Taybetiyên dersdariya Mela Yasîn ev bûn; hafîzeyeke biqewet, zîrektiyeke ronak, axaftineke zelal, merîfeta vegotinê, qabiliyeta qani‘kirinê, hunera teswîrê, ilmekî kûr, kesayetiyeke edebî, bidisîplîn û bêtewîzbûn⁷.

1.1.f. Leqebên Wî Yên Îlmî

Mela Yasîn di medreseyan de ji pêncî salî zêdetir ders dane û tê zanîn ku di warê fiqhê de jî gelek fetwayên wî hene. Fetwayên ku wî dane hingî baş bûn ji aliyê aliman ve rasterast dihatine pejirandin û tu rexne li wan nedihatine kirin. Pirsên ku jê dihatin kirin bi gelemperî bersiva wan dida . Xwedî ilmekî mezin bû. Ji ber vê yekê jê re wisa digotin: “Eger rojekê hemû kitêbên di medreseyan de têne xwendin werine

⁵ Hevdîtina taybet: Mela Selamadîn Toprak, Nîsan 2015.

⁶Z. Fuat Toprak, *h.b.*, r. 127.

⁷Hevdîtina taybet : Muhemmed Toprak, Gulan 2015.

şewitandin Mela Yasîn dikare dîse wan jiber binivîse.” Li heremê û derdorê wekî leqeb jê re “Reîsu’l-ulema (Reîsê aliman)”, “Behra Ilmê”, “Çiyayê Ilmê” dihate gotin. Mexlesa “Yusrî (Ê ku tiştan hêsan dike) di helbest û berhemên xwe de bi kar tanî. Di nava gel de ev leqeb zêde nedihatîn zanîn lê belê di nav telebeyên wî û ehlê ilmê de dihatin zanîn⁸.

1.1.g. Hin Alimên Li Ber Destê Wî Perwerde Bûne

Mela Şemseddînê Çîçikî

Mela Evdillahê Xerzî

Mela Eliyê Çirikî

Mela Seîdê Taxikî

Mela Heyder (Xetîpoglû)

Mela Mihemmedê Dengnekirî

Şêx Seyîd

Mela Mihemmedê Bilicî

Mela Salihê Dîda

Mela M.Wahîdê Dêrikî

Mela Abdussemedê Ferhendî

Mela Ebdulquddûs (Miftiyê Erxeniyê)

Mela Mihemedê Emmê (Miftiyê Çinarê)

Mela Abdulletîfê Şemamiyê

Mela Îbrahîmê Xudûrî

Mela Mistefayê Mûşî

Mela Henîfiyê Entabî

⁸Hevdîtina taybet : Mela Selamedîn Toprak, Gulan 2015.

Mela Mahmûdê Şixretepe

Mela Resûlê Farqînî

Mela Mihemmed Şerîfê Hedayî

Mela Îzzetê Bekiranî

Mela Dawidê Şoşibî

Mela Tahirê Bilbilî

Mela Nesreddinê Mermerî

Mela Kamilê Dêrikî

Mela Salihê Pasûrî

Ji bilî van gelek telebeyên ji Erzerom, Agirî, Mûş, Bedlîs, Mêrdîn, Dîlok, Riha û ji gelek deverên din hatine li ber destê Yusrî perwerde bûne. Wî nêzî hezar telebe perwerde kirine û ji sedî bêtir îcazet dane⁹.

1.1.h. Cihên Lê Wezîfe Kiriye

Di dema Mela Yasîn tê de jiyaye de ededê hilibijartina melayan hebû. Li gorî wê ededê mezinên gund alimê herî baş ji bo gundên xwe dixwestin û ji bo melatîyê dianîne gundên xwe. Mela Yasîn di dema telebetiya xwe de perwerdehiya telebeyan dida, bi vê xisleta xwe di derdorê de dibe alimekî navdar. Beriya ku ew îcazeta xwe bistîne mala xwe dibe gundê Taxikê, ê ku girêdayê Farqînê ye, û li wir melatîyê dike. Bi vê wezîfeyê re heta perwerdehiya xwe diqedîne û îcazeta xwe bistîne car caran diçe gundê Ferhendê. Piştî standina îcazeta xwe ji gelek gundan tê vexwendin lê ew li cihê wezîfeya xwe yê pêşî li gundê Taxikê dimîne. Li wir demeke dirêj melatîyê dike, perwerdehiya telebeyan dike. Bi rêzê cihên ku Mela Yasîn bi cih bûye û wezîfe kiriye ev der in:

1. Taxik/Farqîn
2. Weysika Jêrîn/Farqîn

⁹Z. Fuat Toprak, *h.b.*, r. 126.

3. Xidilyas/Amed
4. Qewşan/Sitewr
5. Tilbisim/Dêrika Çiyayê Mazî
6. ‘Etşa/Farqîn
7. Çinar (Navend)
8. Barê/Çinar
9. Taxik/Farqîn (Cara Diduyan)
10. Fetla Jorîn/Bismil
11. Kilêsiyê/Farqîn
12. Çirik/Farqîn
13. Birsin/Pîran
14. Sergewra/Bismil
15. Xidilyas/Amed (Cara Diduyan)
16. Gundik/Farqîn
17. Şerefika/Bismil
18. Boşat/Farqîn
19. ‘Etşa/Farqîn (Cara Diduyan)
20. Amed (Navend)¹⁰

1.1.i. Wefata Wî

Mela Yasîn 8ê Çileya 1994an, li Amedê di mala kurê xwe Z. Fuad de berbanga sibehê diçe rehma Xwedê. Cenazeyê Seydayê Mela Yasîn ji aliyê feqiyê wî, Mela Seîdê Taxî ve tê şuştin . Nimêja wî ya cenaze jî li Mizgefta Mezin a Amedê piştî nimêja nîvro tê kirin. Mela bi gotina “Ev mirovê çûye rehma Xwedê wekî ku hûn wî baş nas dikin û li vê derdorê mirovekî xwedî ilm û seydayê gelek aliman Mela Yasîn e” wî bi cemaetê dide nasîn. Mirovekî kal li pey cenazeyê wî dibeze û çend caran dibêje “Çiyayekî ilmê çû!” Bi hezaran mirov beşdarî cenazeyê wî dibin¹¹.

¹⁰ Hevdîtina taybet: Muhemmed Toprak, Gulan 2015.

¹¹Z. Fuat Toprak, *h.b.*, r. 123.

1.2. Berhemên Mela Yasîn Yusrî¹²

1.2.a. Berhemên Wî Yên Erebî

1.2.a. 1. Seyfu'l-Meslû'l-'Ela Mu'elefi'l-Me'lûl

Di sala 1974an de dest bi nivîsa vê berhemê kiriye û di şeş salan de qedandiyê. Di destpêkê de li ser xeletiya fetwayeke li ser nimêja îne dest bi rîsaleyeke biçûk dike lê di dawiyê de ew nivîs dibe kitêbeke 600 rûpelî ya usûla fiqhê. Dixwaze berhema xwe zû biqedîne da bigihîne wî melayê xwedî fetvaya xelet. Lê mixabin beriya ku pirtûka xwe xilas bike ew mirov diçe ser rehma Xwedê. Heta niha nehatiye çapkirin û wekî destnivîs li cem kurê wî Muhemmed Toprak e.

1.2.a.2. Fetwayên Mela Yasîn

Mela Yasîn li ser fiqhê di gelek mijaran de fetwa dane lê belê nusxeyên nivîskî gelekî hindik in. Fetwaya hatiye nivîsandin ji bo kê hatibe dayîn bi wî re maye û lewma wînda bûne.

1.2.a.3. Rîsaleya Faîzê

Li ser meseleya faîzê ye. Ev berhem niha wînda ye. Li gorî vegotina Muhemmed Toprak, Mela Selamedîn destxeta vê berhemê bi emanetî daye Mela Feyzullahê Zozincî û li cem wî wînda bûye¹³.

1.2.a.4. Rîsaleya Tefsîra Ayeta Pêncî û Nehemîn Ya Sûreya Nîsayê

Tefsîra ayeta “Îtaetê bi Xwedê û Resûlê wî bikin” e. Ji bo ehlê ‘ilmê hatiye nivîsandin. Nehatiye çapkirin û li cem Muhemmed Toprak e.

1.2.a.5. Rîsaleya Derheqê serjêkirina Ajalan

Naveroka vê rîsaleyê li gorî Mezhebê Şafi‘î şert û mercên serjêkirina ajalan e. Ev rîsale jî li ser fetwayeke çewt reddiye ye. Ev wek destxet li cem Muhemmed toprake.

¹² Me derbarê berhemên Yusrî de agahiya bi tevayî ji kurê wî Muhemmed Toprak wergirtiye.

¹³ Hevdîtina taybet: Mela Selamedîn Toprak Gulan 2015.

1.2.b. Berhemên Wî Yên Kurdî

1.2.b.1. Rewdu'l-Heyat

Bi pîvana erûzê hatiye nivîsandin. 249 rûpel e. Navê wê yê erebî “Keşfu'n-niqab ‘en esrarî ehwalî yewmi’l-hîsab” e. Behsa hemû pêvajoya ji sekerata mirinê heta mirov diçin heşrê dike. Zêdetir bangî gel dike û di çerçoveya we‘zê de ye. Ji 26 serenavan (beşan) pêk tê. Zimanê wê kurdî (kurmancî) ye. Bi tevahî çavkaniyên xwe ji Qur’an û sunneta pêxember distîne û ji bilî vê ji aliyê edebî ve berhekeme bihêz e. Destxeta vê berhemê li cem kurê Seydayê Mela Yasîn Muhemmed Toprak e.

Ji Rewdu'l-Heyatê du malikên ewil û dawî ev in:

Fe ‘ûlun fe ‘ûlun fe ‘ûlun fe ‘ûl

Bi namê te ya Reb me kir ibtida

Me ‘ewn û ‘inayet ji te ey Xuda

Ezel ta ebed cumle wesfê kemal

Bi zatê te xas in eya zu’n-newal

Ku taba temûza kerem ‘efwê ‘am

Li berfa gunah dit bihellet tamam

Ilahî bi heqqê benî Fatime

Li rûhê Muhemmed ‘eleyhi’s-selam¹⁴

¹⁴ Seydayê Mela Yasîn Yusrî, *h.b.*, r. 126.

1.2.b.2. Eqîda Îmanê

Ev berhem ji bo zarokên biçûk, ji bo xwendin û jiberkirina wan hêsan bibe bi zimanekî xwerû û kurt û bi pîvana eruzê hatiye nivîsandin. Ji 72 malikan pêk tê. Destxeta vê berhemê li cem Muhemed Toprak e.

Ji eqîdê du malikên ewil û dawî ev in:

Fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl

Dikim bo te şukr û sena ya kerîm

Bikî tu bi wan zêde ser me ne'îm

Ilahî selat û selamê mezin

Birêjî li ser efdelê ins û cin

Ilahî birêjî selat û selam

Li rûhê Muhemmed 'eleyi's-selam

We hem dê li ser al û sehbê kiram

We etba'ê wan ta bi roja qiyam¹⁵

1.2.b.3. Tuhfetu'l-Esdîqa

Ev berhem jî eqîdeya îmanê ye Mela Yasîn Yusrî ev bi hûrgulî û dirêj nivîsandiye. Li gorî hîcrî di sala 1366an de hatiye nivîsandin. Di wezina eruzê de ye. 29 rûpel e û ji 259 malikan pêk tê.

Du malikên ewil û dawî ev in:

Fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl

Bi namê te ya Reb beda û xitam

Me 'ewn û inayet ji te her mudam

Bi ismê te ya Rebbî fetha kelim

We ger ne çi hedd e me nezm û nizam

Sitir kî bi lutf xwe Yusrî Illah

Megêrî di heşrê wî rû reş siyah

Wela ten teqînhû bî hazel kelim

Iza ma tecella bi ismin tiqam¹⁶

¹⁵ Ev malik ji destxeta Zeynelabidîn Amedî (Çiçek) hatine girtin.

¹⁶ Bnr. Pêvek 10.

1.2.b.4. Tecwîd

Mela Yasîn zêde qîmet dida xwendina Qur'ana Pîroz. Ji bo di xwendinê de xeletî çênebin û ji bo jiberkirina wê hêsan bibe ev berhem bi wezin nivîsandiye. Ev rîsale heta niha nehatiye çapkirin û niha li cem kurê wî Muhammed Toprak e.

1.2.b.4. Dîwan

Dîwana Mela Yasîn Nusxeyeke Dîwana Mela Yasîn tenê li ber destê me ye . Agahiyên ku em ê bidin bi tevahî dê li gorî vê nusxeyê bin. Di dîwanê de 54 helbest hene, ji wan 43 helbest bi kurdî û 11 helbest jî bi erebî ne. Di dîwana xwe de, li ser hezkirina Xwedê û pêxember, bi şewaza munacatê, ne'tê û li ser gelek mijarên cuda helbest nivîsandine. Dîwan jî hêla teşeyên nezmê ve gelekî dewlemend e. Helbestên wî yên ku me bi dest xistine bi tevahî bi wezina erûzê hatine nivîsandin. Di dîwanê de donzdeh teşeyên nezmê yên cuda cih digirin. Wek qesîde, xezel, mesnewî, qit'a, texmîs, museddes, tesmîn, tetsî û hwd. Di dîwanê de helbestên kurdî hejmar û cûreyên wan wiha ne: Qesîdeyên Mela Yasîn ji munacatek, 8 ne't, medhiyeyek û du hîcwiye; Xezelên wî 5 musemmat, 1 mulemma, 10 jî xezelên din; mesnewiyek, qit'ayek, muxemmesek, 2 taştîr, 4 texmîs, 2 musedes, 1 tesmîn, 1 tetsî û 1 te'sîr.

Mela Yasîn ji bo xezelên Melayê Cizîrî 6 nazîre, taştîrek, 4 texmîs, tesmînek, tetsî û te'sîrek nivîsandine. Taştîrek jî ji bo xezela Şêx Eskerî nivîsandiye. Ji bo qesîdeya Seydayê Hecî Fetah jî nazîreyek nivîsandiye¹⁷.

Ji bilî helbestên ku me ji destxetên Seydayê Mela Yasîn Yusrî bi dest xistine du helbestên din jî hene. Yek ji wan di kitêba Necatê Zivîngî ya bi navê Stêrkên Edebiyata Kurdî de cih digre di vê helbestê de nasnava Yusrî der bas dibe¹⁸. Ya din jî di Keşkula Kurmancî ya ku Celîlê Celîl amade kiriye de cih digre. Ev helbesteke bênasnav e, rûpela ku helbest tê de derbas dibe bi tenê Mela Yasîn hatiye nivîsîn¹⁹. Lê belê li gorî şeweya helbestan û unsûrên hatine bikaranîn xwuyaye ku ev helbestên Yusrî ne. Me di pêvekê de cih dane van her du helbestan.

¹⁷ Bnr. Beşa duyem kesayetiya Mela Yasîn ya edebî.

¹⁸ Necat Zivîngî, *Stêrkên Edebiyata Kurdî*, Banga Heq, Stenbol 2014, r.381.

¹⁹ Celîlê Celîl, *Keşkula Kurmancî*, Wîen 2004, r.120.

Li gorî risteya yekemîn û li gorî teşeya nezmê navên helbestên Mela Yasîn Yusrî li jêrê hatine diyarkirin.

Qesîdeyên Wî:

1. Ilahî her tu yî Rehman : Ji 12 malikan pêk tê.
2. Şeker û şehd û şîfa: Ji 24 malikan Pêk tê.
3. Werin ey dost û ehbabê ku: Ji 50 malikî pêk tê.
4. Zerîya nazik û şêrîn: Ji 18 malikan pêk tê.
5. Mihemmed raqîyê ‘erşê îlahî: Ji 15 malikan pêk tê.
6. Hatîn em dergahê ‘alî: Ji 18 malikan pêk tê.
7. Ela ey nazika leb le‘l: Ji 14 malikan pêk tê.
8. Gula baxê ulul‘ezma: Ji 11 malikan pêk tê.
9. Selamê şu‘le nûranî: Ji 55 malikan pêk tê.
10. Du ta sêv û du ta mişmiş: Ji 12 malikan pêk tê.
11. Der dil te hesret ger nebit: Ji 20 malikan pêk tê.
12. Ey hebîbê rûh û qelban: Ji 15 malikan pêk tê.

Xezelên Wî:

1. Îro li min êşa ye dil: Ji 20 malikî pêk tê.
2. Ela ey zîneta dunya: ji 11 malikan pêk tê.
3. Mekin lewme di ‘işqa wan: Ji 15 malikan pêk tê.
4. Tên ji qewsê nûnê Leylê: Ji 20 malikî pêk tê.
5. Nîşan da husnê xariq bo: ji 19 malikan pêk tê.
6. Ev firqet û hicr û newa : Ji 12 malikan pêk tê.
7. Ah û fixan sed eleman: Ji 15 malikan pêk tê.
8. Îro li min dijwar e dil: Ji 13 malikan pêk tê.
9. Min dî ji hîcra xed gula: Ji 14 malikan pêk tê.
10. Selwî qeda xed gul î tu: Ji 11 malikan pêk tê.
11. Bi heyata te qesem min :Ji 5 malikan pêk tê.
12. Nedî neqdê dil û can: Ji 7 malikan pêk tê.
13. Du reşmaran li dor bedra: Ji 7 malikan pêk tê.
14. Te bi xewf û bi hezer: Ji 9 malikan pêk tê.

15. Her lehze kişandî me: Ji 10 malikan pêk tê.

16. Du ta sosin du ta gul: Ji 11 malikan pêk tê.

Musellesa Wî:

1. Eya şêrîn sifata min : Ji 11 bendan pêk tê. Di dawiya her bendê de risteya “ Derê carek ji perdê da bibînim bejn û balaê” hatiye dubarekirin.

Taşîrên Wî:

1. Dilber şekîna şekerek: Ji 6 bendan pêk tê.

2. Çi nûrîn tel’etek bû: Ji 14 bendan pêk tê.

Texmîsên Wî:

1. Sena berqa tecellaê: Ji 5 bendan pêk tê.

2. Çemena husn û beha: Ji 6 bendan pêk tê.

3. Gulê îqbal û se’adet: Ji 16 bendan pêk tê.

4. Me ne sebr û ne sukûn: Ji 15 bendan pêk tê

Muxemmesa Wî:

1. Ê serî danîn li ser ‘utba: Ji 9 bendan pêk tê. Di dawiya her bendê de malika “ Elmeded ya Xewsê E’zem Şahê Geylanî meded/ Ez li dergahê te miskîn im telebdarê meded” hatiye dubarekirin.

Museddesên Wî:

1. Selsebîl û kewser û aba: Ji 8 bendan pêk tê. Di dawiya her bendê de malika “ El eman Şahê Buxara ‘alî Şahê Neqşebend/ Sed meded pîrê terîqet ez li dergahê te bend ” hatiye dubarekirin.

2. Ey gula baxê rîsalet: Ji 9 bendan pêk tê. Di dawiya her bendê de malika “El eman ya Seyyide’l-kewneynî ya xeyre’l-wera/El meded şehê du kewna Ke’beya peyxembera” hatiye dubarekirin.

Tesmîna Wî:

1. Min can bi selem da: Ji 10 bendan pêk tê.

Tetsiya Wî:

1. Ger çi der în ‘alema: ji 5 bendan pêk tê.

Te‘şîra Wî:

1. Çi bi zahir ji gunahan dîkin: Ji 12 bendan pêk tê.

Mesnewiya Wî:

1. Dibê şêx mirîda re ma hûn ker in: Ji 20 malikan pêk tê.

Qit‘aya Wî:

1. Ahê eyyamê wîsalê: Ji 7 malikan pêk tê.



B – KESAYETIYA EDEBÎ YA MELA YASÎN YUSRÎ

2.1. Zimanê Wî

Zimanê di helbestan de hatiye bikaranîn ji zimanê helbestvanên klasîk ên din gelekî ne cuda ye. Di dîwanê de gelek peyv û ravekên erebî û farisî hene. Helbestên Mela Yasîn ên ku di cûreya hîcwiyyeyê de hatine nivîsandin ji aliye ziman ve ji helbestên din hêsan û xwerûtir in.

(Ms. 1/6-7 m.)

Xelas kim ji bona we îman û dîn

Di qebrê bidim we çira û livîn

Dibêjin ku em kelbê dergahê te

Em û bab û da seh li dergahê te

Ji hêla edebî ve zimanê helbestvan gelekî bihêz e. Mela Yasîn di dîwana xwe de tenê bi du zimanan helbest nivîsîye ew jî erebî û kurdî ne. Di hin helbestan de van herdu zimanan tevlihev dike û di hinan de jî wek mulemma bi kar tîne. Hunerên edebî di helbestan de gelekî cih digirin. Helbestvan ji dubarekirina dengên îstîfade kiriye.

2.1.a. Devoka Cizîrê

Devoka Cizîrê di serdema mîrektiyan de wek zimanê fermî û zimanê seraya mîran hatiye bikaranîn. Helbestvanên wê demê ev devok bi kar aniyê. Piştî mîrektiyan jî ev tiradîsyon hatiye domandin. Devoka Cizîrê ya di dîwana Mela Yasîn de, bi tesîra Melayê Cizîrî mirov dikare şîrove bike. Melayê Cizîrî bi tenê ji hêla tesewifê ve li Mela Yasîn bandor nekiriye ji hêla ziman ve jî tesîrek mezin lê kiriye.

Çend malikên ku devoka Cizîrê nîşan didin li jêr hatine diyarkirin:

(Qt. 1/5 m.)

Ro **dîbit** ew dem li min şeb lerz û ta **têtin** bi rûh
Zebtî **nakit** şerhê halê min hezînê sed kîtab

(X. 6/1 m.)

Ev firqet û hicr û newa derdê mezin **nabit** dewa
Dara sebir hişk û ziwa lê dara hesret kal û şîn

(Tx. 3/2 bn.)

Ku me **bînit** nezerê ‘alî li halê me binêr
Da **bizanit** ku di dil da me çîqa xençer û kêr

2.1.b. Unsûrên Xeyrê Kurdî

Mela Yasîn jî wek helbestvanên klasîk ên din ji zimanên Rojhelat (Erebî, Farisî û Tirkî) pir sûd wergirtiye. Di dîwana xwe de ji bilî kurdî peyv û têgehên zimanên din jî bi kar anîne. Serdestiya zimanê erebî di helbestan de bi awayekî zelal xuya ye. Unsûrên farisî jî bi kar anîne lê belê ne bi qasî yên erebî. Çend peyvên tirkî jî di helbestan de cih digirin.

2.1.b.1. Unsûrên Erebi

Mela Yasîn di helbestên xwe de gelek peyv û têgehên erebî bi kar anîne. Hinek ji wan peyvên di erebiya kevin de cih digirin. Hin ji wan peyv û têgehên ev in:

Tewqe, kewkeb, kenz, xeter, filfil, lebîb, lewn, qemer, nucûm, ‘endelîb, hecer, selabet, rewze, rewneq, ridab, qebes, kewn, şems, qîl û qal, semûm, meczûb, şulf, mushef, saqî, ‘urûc, fîraq, cewr û cefa, werd, eswed, remed, xewf, tecella, melahet, elem, semek, tel’et, qerqef, melhûf, zumre...

(Taş 2/12 bn.)

Muqabil hate mira'ta dilê min wechê mehbûbê

Me berda **qibleya husna muqeddes 'eynê metlûbê**

Ji **exyaran** nedî kes tê ji **xeyrê ferz û mendûbê**

Nema cî tê ji bo **şey'ek** ji **xeyrê zikrê merxûbê**

Xwe tê de dît û kes nîne ewê dîsa xwe wenda kir

2.1.b.2. Unsûrên Farisî

Di helbestên Mela Yasîn de unsûrên farisî bi qasî yên erebî nebin jî dîsa hejmara wan jî ne kêr e. Hin peyv û têgehên farisî yên di dîwanê de derbas dibin :

Şem, perwana, bade, seba, sohtî, mey, serwî, keman, ebrû, goften, mihr û xurşîd, şeb, lebaleb, gulzar, nûşîn, ferfûr, mehtab, mest, naz, zulf û ab in.

Me der **şeb** dî siba 'îdê li min kir ruhnî **xurşîdê**

Ke-enne şemse qed daret ila nisfî semewatî

Zankî rûh **soxteê** başit ji evhina te şehê

Goftem ez badê seba ra ji dilê sohtî **çehê**

Ya li min sohtî ciger **leb-şekera ebrû** hilal

Zerîya nazik û **dêm** gewheriya mihr û misal

Serwî qed xonçe li ba qewl û soxun şehrî seyal

2.1.b.3. Unsûrên Tirkî

Di helbestên Mela Yasîn de peyvên tirkî gelek kêr in. Peyvên tirkî an jî di forma tirkî de hatine bikaranîn ev in:

Satîş bike, ey ezîzler, sax, yanîş, turlu turlu, îş, ayrî xeyrî, yardim, skence, dax.

(Q. 3/10 m.)

Gelî eħzabê **tirlû tirlû** ehlê ‘ilm û ‘irfanê

Li cem min hûn gelek şêrîn bîlâ şek bê guman îro

(Q. 3/14 m.)

Di piştî’k em biraê hev binessa ayeta nûrîn

Ecebdar im çewa tefrîq û **ayrî xeyrî** man îro

2.2. Kesayetiya Wî Ya Edebî

Mela Yasîn ji hêla kesayetiya edebî ve ji gelek helbestvanên Kurd cuda ye. Ji hêla huner û hêza edebî ve di edebiyata kurdî de xwediyê cihekî girîng e. Bi gelek teşeyên nezmê helbest nivîsandine, heta niha nehatiye dîtin ku helbestvanekî din ev teşe bi kar anîbin. Mînak: Tesmîn, tetsî û te‘şîr nivîsandine. Hunerên edebî bi awayekî serkeftî bi kar anîne wek teşbîh, alîterasyon, telmîh, teşxîs, mubalexe, tezd, lef û neşir, îqtîbas û hwd.

Qalibên erûzê di helbestên xwe de baş bi kar anîne.

Di vê beşê de em behsa hunerên edebî nakin bi tenê ji bo nîşandana kesayetiya wî ya edebî em ê çend mînakan bidin.

Teşbîh

(Q. 7/10 m.)

Ji hicran û hewa Şîrîn **wekî Ferhad** dikim qêrîn

Bi wê **Zîna beden zêrîn** Memê nendim di zindanê

Alîterasyon

Bi dengê ‘f’ alîterasyon kiriye

(X. 7/15 m.)

Hel yeştefî qelbî we **fîhî** yextefî narun **tefî**

Herqen we **fî** lutfîn xefî ma yektefî Yusrî’l-mehan

Mubalexe

(Q. 4/18 m.)

Bes te go şê’rê li halê xwe bi sed ab û girî

Heliyan dar û devî deşt û çiya kanîy û ab

Telmîh

(Q. 1/ 4 m.)

Eger dunya tijî nar bî ji te rehmet ku izhar bî

Kesên merhum selîm sar bî ji mislê **narê Nemrûd î**

Lef û Neşir

(X. 11/21 m.)

Di baxê dilber û **waran** biçî **werda** ji gulzaran

Meger **xaran** ji **exyaran** di caê wê gula zer da

Tenasub

(X. 8/4 m.)

Şewq û **şemala** rû-mehê elf û evîna wê şehê

Da dil **lehîba** dûjehê lew pir **şewat û nar** e dil

2.3. Helbestvanên Ku Bandor Li Mela Yasîn Kirine

2.3.a. Mela Ehmedê Cizîrî

Navê wî yê rastî Ehmed e. Li gorî Mela Ehmedê Zivingî di navbera salên 1567- 1640î de li Cizîrê jiyaye²⁰. Li gorî Feqî Huseyn Melayê Cizîrî di sala 1589an de ji dayîk bûye²¹. Navê bavê wî Şêx Muhemmed e. Xwediyê dîwaneke mureteb e. Di helbestên xwe de nasnavên wek Mela, Melê, Nîşanî, Melayî, Mela bi kar anîne.

Mela Yasîn yek ji helbestvanên klasîk e û gelekî zêde di bin tesîra Melayê Cizîrî de maye . Ev tesîr di helbestên Mela Yasîn de bi awayekî zelal xuya dike. Wî ji xelezên Mela re taştîr, texmîs, tesmîn, tetsî û te‘şîr nivîsandine. Ev bi têra xwe bandora Mela li ser Mela Yasîn nîşan dide. Heta bandora Mela wisa zêde ye ku Mela Yasîn ji bo tradîsyona klasîk çêtir nîşan bide di gelek helbestên xwe de devoka Cizîrê bi kar aniye. Ji xezelên Melayê Cizîrî re nazîre nivîsandine.

Mela Yasîn ji bo xezelên Melayê Cizîrî yêna paşserwayên wan “*Şeb û Roz, Dil, Feryad Ji Destê Fîrquetê, Ebrû, Kirin û Dil Ji Min Bir Dil Ji Min*” nazîre nivîsandine.

Melayê Cizîrî

Tu dizanî bi Xudê min tu xiyal î **şeb û roz**

Bi xiyala xwe medam min tu li bal î **şeb û roz**

Fetwaya pîrê Mela yan tu bi ilhamê nebî

Vê meyê her we dinoşî bi helalî **şeb û roz**²²

Mela Yasîn

(X. 11/1 m.)

Bi heyata te qesem min tu **xiyal î şeb û roj**

Tu di dil wek lukuzê şewq û **şemal î şeb û roj**

²⁰Zülküf Ergün, Bajar Edebiyat û Cizîra Botan, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2015, r. 125.

²¹Feqî Huseyn Sağınç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002, r. 375.

²²Selman Dilovan, *Dîwana Melayê Cizîrî*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2012, r. 105.

(X. 11/4 m.)

Bese Ey Yusrî te go şê‘rê şewatê bişewat

Tu wî bispêre Ilahî Rebbê ‘alî **şeb û roj**

Melayê Cizîrî

Îro ji remza dêmdurê minnet ku min mesrûr e **dil**

Dilber bi fincana surê mey da me û mexmûr e **dil**

Dil Ke‘beya Mewla ye lê narê Kelîm Îsaye **dil**

Bangê enellah daye lê hem Ke‘be û hem Tûr e **dil**²³

Mela Yasîn

(X. 1/1 m.)

Îro li min êşa ye dil dilber ji no tîr daye **dil**

Lew da’îma wek naye dil da’im bi ah û waye **dil**

(X. 1/21 m.)

Wan lef û zulf û xumrîya wan xal û nîşanê siya

Girtin ji te dil Yusrîya îro li min wendaye **dil**

Melayê Cizîrî

Di dest da yengiyek nûbarî min dî ew keman **ebrû**

Li bala cedwelek Cebbarî lêda hemqiran **ebrû**

Mela dil têk te peykan in ji mehbûban me nişan in

Kemandarên di xeddar in di burca esmeran **ebrû**²⁴

²³H.b., r. 147.

²⁴H.b., r. 208.

Mela Yasîn

(X. 5/1 m.)

Nişan da husnê xariq bo cemî'ê xas û 'am **ebrû**
Ji bo wê cewherê husna muqeddes bû xîtam **ebrû**

(X. 5/19 m.)

Ji Yusrî 'unsurê xamis beyana cewherê bû lew
Di nezma lu'luê mensûrê da rutba tamam **ebrû**

Melayê Cizîrî

Vê firqetê ebter kirin **feryad ji destê firqetê**
Jar û zeîf û zer kirin **feryad ji destê firqetê**

Vê firqetê pur dil şewand cerhên qedîm dîsa kewand
Şîşên di sor tê da tewand **feryad ji destê firqetê**²⁵

Mela Yasîn

(X. 9/1 m.)

Min dî ji hicra xed gula pir derd û afat û bela
Wan dil helandin wek qela **feryad ji destê rûgula**

(X. 9/3 m.)

Van rûgula 'estî kewand maşik û şîş tê de tewand
Can û cesed herdu şewand **feryad ji destê rûgula**

Melayê Cizîrî

Şox û şengê zuhre rengê **dil ji min bir dil ji min**
Awirên heybetpelengê **dil ji min bir dil ji min**

Zulf û xalan nûn û dalan wan ji min dil bir bi talan

²⁵H.b., r. 246.

Goşê qewsê hilalan dil **ji min bir dil ji min**²⁶

Mela Yasîn

(X. 10/1 m.)

Selwî qeda xed gul î tu sipî zenda zer tilî tu
Zînetâ cerg û dil î tu **dil revandî dil ji min**

(X. 10/ 10 m.)

Awirê wan herdu çeşman kî ji ber wan ‘eql û hêş man
Ê ku jê dî her nexweş **man dil revandî dil ji min**

Melayê Cizîrî

Ez nizanim sebebê yarê çira dûrî **kirin**
Şahê şêrîn dehanan em ji xwe mehcûrî **kirin**

Me dizanî ku tu ‘aqibetilemrî çî kî
Lebê le‘lê şekerîn ahi ku mexrûrî **kirin**²⁷

Mela Yasîn

(X. 14/ 2 m.)

Ez nizanim bi çî sûc û çî xeta û çî gunah
Me di zindan û hebixana xwe mewqûfî **kirin**

(X. 14/4 m.)

Me nedî wesfê zemîran di tu qewlê mezeban
Lê bi ‘işqa xwe zemîra me te mewsûfê **kirin**

²⁶H.b., r. 170.

²⁷H.b., r. 161.

2.3.b. Ehmedê Xanî

Ehmedê Xanî (Jd. 1651- W. 1707) li Gundê Xanê yê û Colemêrgê hatiye dunyayê. Bavê wî Şêx Îlyasê Xanî, diya wî Gulnîgar Xanim e. Xanî teqrîben di temenê pêncî û şeş saliya xwe de li bajarê Bazîdê wefat kiriye²⁸.

Di edebiyata klasîk de tradîsyona nazîreyê gelekî belavbûyî ye. Helbestvanên klasîk ji xezel an jî ji qesîdeya helbestvanekî bihêz û ji xwe pêşketîtir re nazîre dinivîsandin. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de helbestvanên wek Mela Ehmedê Cizîrî û Ehmedê Xanî em dizanin ku ji xezela Hafîz a paşserwaya wê “**çê konem**” nazîre nivîsandine. Heta Hafîz li Melayê Cizîrî, Mela li Xanî û Xanî jî li Mela Yasîn bandor kiriye. Di helbestên wan de ev bi awayekî zelal diyar e. Di helbesta Mela Yasîn a paşserwaya wê “**çi kî**” bandora van helbestvanan heye. Mela Yasîn ev helbest bi çar “**mustefîlun**”an nivîsandiye; Hafîz, Melayê Cizîrî û Xanî ev bi sê fa‘ilatun û fa‘ilun’ekê nivîsandiye.

Hafîzê Şîrazî

Bî to ey servê revan ba gol û golşen **çê konem**
Zolfê sonbol çê kêşem arêzê sosên **çê konem**²⁹

Melayê Cizîrî

Kes bi dada me nepirsit gilleh û dadi **çi kit**
Tenebit dadiresek beyhude feryadi **çi kit**

Mumkinet dê hebitin da ku teleb hasil **bibit**
Seyd û nêçîr ku nebit tûleê seyyadî **çi kit**

Dê ji heq cazîbeyek dil bigirit werne Mela
Ji ezel ger tu hîdayet nebit îrşadî **çi kit**³⁰

²⁸Jan Dost, *Ehmedê Xanî Mem û Zîn*, Weşanên Avesta, Stenbol 2010, r. 17-18.

²⁹Pejman Bextiyarî, *Dîwanê Hafîz*, Çapxanê Parsa, Têhran 1389, r. 268.

³⁰Dilovan, *h.b.*, r. 52-53

Ehmedê Xanî

Mîrê meclîs nekenît, mûtrîbê goya **çi biket**
Xunçê xendan nebitin bulbulê şeyda **çi biket**

Talibê ilm û kemalê nebitin qabilê feyz
Hîmet û terbîyyeyê alimê dana **çi biket**

Qelbê Xanî sedefa gewherê irfan e welê
Metnîxwanek ku nebit, sahibê me‘na **çi biket**³¹

Mela Yasîn

(Q. 11/1 m.)

Der dil te hesret ger nebit ma tu bi axînê **çi kî**
Ger te nebîtin derd û xem ma tu bi nalînê **çi kî**

Ey ‘alimê xwey teb‘ û renc der ‘ilm û ‘irfan mislê genc
Ger te nebin ‘emalê qenc ma tu bi zanînê **çi kî**

Yusrî te şarîn kir dirêj herçî ne kor û kerr û gêj
Şê‘ra te can û dil dipêj ma tu bi şarinê **çi kî**

2.3.c. Mela Huseynê Bateyî

Mela Huseynê Bateyî di sedsalên XVII û XVIIIan de jiyaye. Dîroka ji dayîkbûna wî ne diyar e. Bi eslê xwe ji gundê Bateyê ye. Navê wî Huseyn e, û nasnavê wî Bateyî ye³². Ew ji gundê Bateyê girtiye. Yek ji helbestvanên klasîk e. Di tradîsyona edebiyata klasîk a kurdî de cihekî girîng digire. Yekemîn mewlûda Kurdî ya wî ye.

Bandora Melayê Bateyî ya li ser Mela Yasîn di helbestên jêrîn de diyar e. Ji hêla îrfan û tesewifê ve bandoreke zelal xuya ye. Heta Mela Yasîn ji bo munacata

³¹Abdurrahman Durre, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî: Felsefe û Jiyana Wî*, Weşanên Keskesor, Stembol 2002, r. 115.

³²Ziver İlhan, *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî*, Teza Mastera Bilind a natiye weşandin, Mêrdîn, 2013, r. 5.

Melayê Bateyî nazîre nivîsandiye. Ev yek di wezin û serwayê de xuya dibe. qalibê wezina wan ev e:

Mefa‘îlûn / mefa‘îlûn / mefa‘îlûn / mefa‘îlun

Munacata Mela Yasîn

Herdu malikên ewil:

(Q. 1)

Ilahî her tu yî Rehman îlahî her tu yî Mennan

Ilahî her ji te îhsan bi her şey ta nemil dûdî

Tu Berr û hem **Xeffar** î tu Tewwab û tu Settar î

Medîrê çerxê dewwar î tu Xellaq î hem cûd î

Munacata Melayê Bateyî

Ya **Ilahî tu** Kerîm î tu **Xefûr** î tu ‘Ezîm î

Ji ezel da tu Qedîm î Melîkê Seqfê sema yî

Tu bi navê xwe yê **Rehman** tu bi heq sih cuz’yê Qu’ran

Bateyê jar tu bi xufran tu Xeffarê xeta yî³³

Di van malikên jêrîn de ji hêla têgeh û naverokê ve bandora Melayê Bateyî li ser Mela Yasîn xuya dibe lê belê em dikarin bêjin ji hêla wezin û estetîka edebî ve Mela Yasîn serkeftîtir e. Di helbestên Mela Yasîn de qusûrên wezinê wek zîhaf û îmale ne pir zêde ne.

(Q. 9/7 m.)

Selamê bo **Bekir** xwey şan digel ‘**Umer** ‘**Elî** ‘**Usman**

Li te wek cewher û mercan te çû rutbe bi esman î

³³Xalit Sadinî , *Mela Huseynê Bateyî: Jiyan , Berhem û Halbestên wî*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2010, r. 51-53.

Melayê Bateyî

Baranê selatan ji Xweda subh û ‘eyîşa

Ber seyyîdê muxtarê resûlê ‘Erebiyya

Siddîq û çî Farûq û çî ‘Usman û ‘Eliyya

Ber al û eshabê hebîbê qureyşîyya

Mela Yasîn

(Q. 7/2 m.)

Hebeş berdane ser rojê giha ser ‘eqdê **bişkojê**

Dilê min sohtî wek **dojê** bi hevra atêşek danî

Melayê Bateyî

Bi giryan im şeb û rojê disojim agirê **dojê**

Ji ‘eşqa xunçê **bişkojê** me nalî çûbûn esmanan³⁴

2.3.d. Seydayê Hecî Fettah (Mela ‘Ebdulfettah Hezroyî)

Fettah di sala 1892an de li Hezroya ku wê demê nehyeya Farqînê, li Taxa Mizgeftê ji dayîk bûye û di 1975an de li heman cihê wefat kiriye. Eslê malbata wî ji navçeya Pasûra Diyarbekirê ye. Zaroktiya wî li Hezroyê derbas bûye. Teqriben wexta ku donzdeh salî bû dest bi xwendina medreseyê kiriye. Li cem xalê xwe Mela Ehmed (W. 1944) Quran xwendiyê. Piştî wî li cem Mela Faîq, Mela Ebdullah (W.1915), Mela Mihemmed Hadî (W.1912) xwendina xwe domandiye. Paşê jî li Qozluxa Batmanê li ber destê Mela Reşîd xwendina xwe xilas kiriye. Seydayê wî yê ku li cem ders xwendiyê û jê îcazetname girtiye, alimê wê demê Mela Huseynê Qiçîk e³⁵.

Di dîwana Mela Yasîn de helbestek bi paşserwaya “ Selîm” derbas dibe. Ev helbest ji bo Şêx Mihemmed Selîmê Hezanî di teşeya Methiyeyê de hatiye nivîsandin. Ev helbest ji wezin, paşserwa û naveroka wê xuya dibe ku ji qesîdeya Seydayê Hecî Fettah re nazîre ye.

³⁴H.b., r. 135.

³⁵Îbrahîm Tehsîn Doskî, *Dîwana Fethî: Mela ‘Ebdulfettahê Hezroyî*, Nûbihar 2012, r. 15.

Qalibê van herdu helbestan wiha ye:
Fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun

Hersê malikên qesîdeya Seydayê Hecî yên ewil û dawî wiha ne:

Herkesê carek diye ev qedd û balayê Selîm
Ma muheyyer ew di fikra bejin û balayê Selîm

Soht wî can û cîger sebr û sebata wî nema
Ê ku yek carek nezer da şekl û sîmaya Selîm

Zinde da ma heta ebed xweşhal û farix bal bû
Ê vexwar yek cur'ekî ez came sehbayê Selîm

Derdê min ya reb hezaran çare lê qet nabitin
Ger nebit bo min tebîb Loqman û 'Îsayê Selîm

Nefsê de'wayê ulûhîyet dikit fir'ewn sifet
Elmed ya himmeta Harûn û Mûsayê Selîm

Fethiyê bêçare maye pur zelîl û ustuxwar
Walih û serkeştiyê hîcran û sewdayê Selîm³⁶

Mela Yasîn

(Q. 12)

Ey hebîbê rûh û qelban canê canan î Selîm
Ey çiraxê cîsm û canan pak û nûranî Selîm

Meyyitê sed sal e dê hey bit dema lêkî nezer
Tu ji bo emrazê dil 'Îsa û Loqmanê Selîm

³⁶H.b., r. 136-138.

Der tebessum lû'luê û meknûn dema bêtin zuhûr
Gulşen û çiçek dibarin werd û reyhanê Selîm

Dîn û dunya ger divêtin hûn gelê yaran werin
Sa'etek rûnên li ber suhbet di dîwanê Selîm

2.3.e. Şêx 'Eskeriye Axtepî

Şêx 'Eskeriye Axtepî di sala 1898an de li Gundê Axtepê hatiye dunyayê. Kurê Şêx 'Ebdurrehmanê Axtepî ye. Perwerdaya xwe ya medreseyê ya ewil li cem bavê xwe û birayê xwe yê mezin Şêx Kerbela dîtiye. Piştî wefata bavê xwe koçê Erxenyê kiriye, demekê li vir jiyana xwe derbas kiriye. Li pey Erxenyê derbasê Egilê bûye. Di sala 1952an de li Gundê Çolê wefat kiriye³⁷.

Mela Yasîn ji bo xezela Şêx 'Eskerî ya bi risteya *Çi nûrîn tel'etek bû min di camê de temaşa kir* dest pê dike taştîrek nivîsandiye. Ev nîşan dide ku ji hêla edebî ve Şêx 'Eskerî li Mela Yasîn tesîr kiriye.

(Taş. 2/1 bn.)

Çi nûrîn tel'etek bû min di camê de temaşa kir
Bi wê husna munezzeh dil esîrê nûn û sada kir
Sifet perwane mam da dil şîhab û lem'eê agir
Bi sed tewrî 'ezabê can û dil talan û yexma kir
Ji hûş û 'aqilî xistim dema perde ji rû rakir

(Taş. 2/ 14 bn.)

Dizanim derd û ekdarê hebîbê cumle 'ihsan in
Li Yasîn Yusrî lew derd û elem tev jê re nîşan in
Hezar hemd û şukur bo Heq Te'ala derdê derman in
Îlacû melhema cerhê tivingê zenb û 'isyan in
Ji ber vê 'Eskerî jê hemd û şukr û hem temenna kir

³⁷Şêx 'Eskerî, *Iqdê Durfem*, (amd. Zeynelabidîn Zinar), Weşanên-tryck& Förlag, Stockholm 1989, r. 5.

2.4. Helbestvanên Ku Mela Yasîn Bandor Li Wan Kiriye

2.4.a. Mela Selameddîn

Kurê Seydayê Mela Yasîn e. Navê diya wî Zeyneba Xanim e. Di sala 1938an de li gundê Taxikê ji dayîk bûye. Xwendina xwe ya medresê bi piranî li cem Seydayê Mela Yasîn Yusrî xwendiyê, lê belê hindik be jî bi qasê sê meh ji Mela Seîdê Taxikî ders wergirtiye. Demek dirêj li navçe û gundên Amedê melatiye kiriye. Bi kurdî du berhem nivîsîne. Berhemên wî ev in: Dîwan û Mewlûd. Niha li navenda Amedê diji³⁸.

Di dîwana Mela Selameddîn de ji bo xezelên Seydayê Mela Yasîn du heb texmîs hene. Yek ji wan *texmîsa muterref* e.

Benda ewil û dawî ya texmîsa muterref li jêrê hatiye diyarkirin:

Hela rabin gelî yar û hebîb û esduqa îro
Werin bigrîn li halê vî birîndarê du sed tîro
Ku tèn cerg û hunava her demê lasîye ma sîro
Ji firta intizara dilbera sohbet şeker şîro
Li min can û cîger kul bû li benda dilberê îro

Ji miska sohbetê yarê Selameddîn tu mehcûr î
Eger çendan bi wan ah û enîne dil tu me 'zûr î
Welê qessem bi reş çavan li gel wê menzera nûr î
Bi mislê Yusriyê miskîn we dîsa dil ne mehcûr î
Be'îd bûyî ji mehbûbê di pencê xurbetê îro³⁹

³⁸ Hevdîtina taybet: Mela Selameddîn, 2015 Tebax.

³⁹ Mela Selameddîn, Dîwan, Nusxeya fotokopi, Pirtûkxaneya taybet a S. Gezer.

BEŞA DUYEM

A – JI ALIYÊ TEŞEYÊ VE VEKOLÎNA DÎWANÊ

Di beşa duyem de em li ser teşeyên nezmê yên di dîwana Mela Yasîn de derbas bûne û li ser wezin (Kêş) û serwayê (qafîye) sekinîn. Teşeyên nezmê hatine tesbîtkirin û pênasakirin. Me Tesnîfa teşeyên helbestan li gorî hejmara risteyên wan kiriye. Helbestên ji malikan pêk tên wek qesîde, xezel, mesnewî û qit‘a di rêza ewil û yên ji bendan pêk tên wek muselles, taştîr, muxemmes, texmîs, museddes, tasmîn, tetsî û te‘şîr jî di rêza duyem de bi rêz kirine.

1.1. Taybetiyên Teşeyê

1.1.a. Awayên Rêza Helbestên Dîwanê

Mela Yasîn wek helbestvanekî klasîk dîwaneke muretteb nenivîsiye. Helbestên Mela Yasîn bi awayekî perekende bûn. Bi alîkariya malbata wî me ew tomar kirin û li gorî tertîba dîwanê ew rêz kirin. Me hinek ji helbestên wî di nav berhemên wî yên din de peyda kirin. Weke texmîs helbestên wî yên ji bendan pêk tên di deftera eqîda îmanê de cih digirin. Hinek ji wan jî di pelek an jî rûpelekî de hatine nivîsandin. Weke methiyeya ku ji bo Ayetullah Xumeynî hatiye nivîsandin.

1.1.b. Rêz û Hejmara Helbestan

Helbestên Mela Yasîn ji bo di dîwaneke musteqîl de cih nagirin, mirov nikare behsa rêbaza rêzkirina wan bike. Deftera ku tê de medhiye ji bo Şêx Mihemmed Selîmê Hezanî hatiye nivîsandin texmîs, tasmîn û te‘şîr cih digirin lê belê hin helbestên wî di defterên cuda cuda de ne. Helbestvan tertîbek neşopandiye.

Li gorî malbata Mela Yasîn behs dike helbestên wî pir bin jî lê belê hew ên ku me bi dest xistine di xebata me de cih digirin.

1.2. Teşeyên Nezmê

1.2.a. Helbestên Ji Malikan Pêk Tê

1.2.a.1. Qesîde

Qesîde di edebiyata klasîk de yek ji teşeyên nezmê ye ku ji malikan pêk tê. Peyva qesîde tê wateya qesdkirina tiştekî, meyilkirina tiştekî û mayîna di riya rast de ye. Ji malika ewil **beytu'l-metle'**, ji ya dawî re jî **beytu'l-meqte'** tê gotin. Wek têgehek edebî malika ewil di nav xwe de, yê din jî bi malika ewil re hemserwa ne⁴⁰. Herî kêr ji panzdeh malikan pêk tê. Hejmara malikên qesîdeyê ne diyar e lê belê di edebiyata farisî, erebî û tirkî de hejmara malikan di navbera sih û yek -not û nehan de diçe û tê. Di edebiyata kurdî de ev hejmar diguhere, bi gelemperî qesîde ji pênc- heft beytan heta bi derdora bîst – sih beytî pêk tê. Di edebiyata faris û tirkan de hejmara xezelan ji ya qesîdeyan kêmtir e. Di edebiyata kurdî de ev rewş cuda ye, hejmara malikên qesîde û xezelan gelekî nêzî hev e⁴¹.

Ji hêla ruxsarê ve xalên qesîde û xezelan ên hevbeş gelek in. Nîzama serwaya wan yek e. Di herduyan de jî malikên metlayê di nav xwe de hemserwa ne. Lêbelê qesîde û xezel ji aliyê naverokê ve ji hev cihê dibin. Di qesîdeyê de bi piranî li ser pesnê desthilatdarekî siyasî yan jî kesayetekî giregir tê rawestan. Mebesta helbestvanî ji nivîsandina qesîdeyê bidestxistina hîmayeya desthilatdar û ji wî kesî girtina alîkariya malî ye. Lê gelek caran jî derheqê pesindayîna kesayetên dînî de jî tîr nivîsandin.

Nîzama serwaya qesîdeyê wiha ye: aa, xa, xa, xa, xa...

Qesîde bi piranî ji pênc beşan pêk tê: Nesîb, medhiye, texezzul, fexriye û di'a.

Di dîwana Mela Yasîn de donzdeh qesîdeyên kurdî hene. Ji van qesîdeyan libek munacat, heşt lib ne't, du lib methiye, du lib jî hîcwiye ne. Medhiyeyek ji bo Şêx Mihemmed Selîmê Hezanî, medhiyeya din jî ji bo Ayetullah Xumeynî nivîsandiye⁴². Hîcwiyeyek ji bo Mela Eliyê Zîla⁴³ ye. Ya din jî ji bo rexneya civakê

⁴⁰ Yekta Saraç , *Klâsik Edebiyat Bilgisi: Biçim- Ölçü- Kafîye*, Gökubbe Yayınları, İstanbul 2014, r. 21.

⁴¹ Abdurrahman Adak , *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasik*, Nûbihar, Stenbol 2014, r. 406.

⁴² Ev methiye sala ku li Îranê bi pêşengiya Ayetullah Xumeynî Şoreşa Îslamê pêk hatiye ji terefê Mela Yasîn ve ji bo Xumeynî bi Erebi hatiye nivîsandin.

û sofiyên nezan nivîsandiye. Ji metla û meqstayên qesîdeyên Mela Yasîn hinek li jêr hatine diyarkirin.

Ji munacatê mînak:

(Q. 1/1 m.)

Ilahî her tu yî Rehman îlahî her tu yî Mennan
Ilahî her ji te îhsan bi her şey ta nemil dûdî

(Q. 1/11 m.)

Ilahî Yusrî dil mehzûn bi eşcan û esa meşhûn
Bi alam û cefa meqrûn ji cûda pir şena zûd î

Ji ne'tê mînak:

(Q. 8/1 m.)

Gula baxê ulu'l-'ezma Muhemmed şahê reslan î
Li zat û hem sifate Heq Te'ala cellê Burhan î

(Q. 8/11 m.)

Bi wesfê wî bilind bû Yusrî ta gerdûnê seyyare
'Eceb nîne bilindaî bi hubba şahê 'erşanî

Ji medhiyeyê mînak:

(Q. 12/1 m.)

Ey hebîbê rûh û qelban canê cananê Selîm
Ey çiraxê cîsm û canan pak û nûranî Selîm

(Q. 12/15 m.)

Qesd û daxwaz û emel Yusrî ji can û dil ev e
Dîn û dunya tev bi min dê şahê dewranê Selîm

⁴³Bi leqeba Mela Eliyê Zîla an jî Çirikî tê naskirin. Yek ji feqiyên Mela Yasîn ê ewil bûye. Ji ber fikir û ramanên wî Seydayê wî ew rexne kiriye.

Ji hîcwiyyeyan mînak:

Hîcwiyyeya ji bo Mela Eliyê Zîla

(Q. 10/1 m.)

Du ta sêv û du ta mişmiş di baxê dil da min danî

Bi xûna dil seqî kir wan me sinca rûh li ber danî

(Q. 10/12 m.)

Bi zenna min di ceyba xwe me danî misk û kafûrê

Me ger ez yanîş im sewm û besel bû ew me tê danî⁴⁴

Hîcwiyyeya ji bo rexneya civakê⁴⁵

(Q. 11/1 m.)

Der dil te hesret ger nebit ma tu bi axînê çî kî

Ger te nebîtin derd û xem ma tu bi nalînê çî kî

(Q. 11/20 .)

Yusrî te şarîn kir dirêj herçî ne kor û kerr û gêj

Şê'ra te can û dil dipêj ma tu bi şarinê çî kî

1.2.a.2. Xezel

Xezel bi wateya xwe ya bingehîn behskirina evînê, bi jinan re bi awayekî aşiqane sohbetkirin û bi wan re bi vî awayî dostbûyîn e. Xezel li ser evînê, xwezayê, kêfxweşiyê, jinan, şerabê û hwd. têne nivîsîn. Wek têgehek edebî malika ewil di navbera xwe de hemserwa ye û bi malikên din re jî bi risteya duyem re hemserwa ne⁴⁶. Ji malika xezelê ya ewil re **metle'** (destpêk) ji ya dawî re jî **meqte'** (birîn, xelaskirin) tê gotin. Ji malika xezelê ya herî xweş re **şah beyît** an jî **beytu'l-xezel** tê gotin. Malika beriya meqtayê re **husnî meqte'** û malika piştî metle'ê re jî **husnî**

⁴⁴ Helbestvan di vê helbestê de mexlesa xwe bi kar neaniye

⁴⁵Ji vê helbestê jî hêla naverok û paşserwayê ve bi awayekî zelal xuya dibe ku bandora helbesta Mela Ehmedê Cizîrî ya ku paşserwaya wê "çî kit" heye.

⁴⁶ Saraç, *h.b.*, r. 47.

metle' tê gotin. Navê helbestvan bi gelemperî di malika meqtayê de derbas dibe. Carinan jî di malika beriya meqtayê yan jî di du sê malikên beriya meqtayê de derbas dibe. Di edebiyata klasîk de ji navê helbestvan ê ku di helbestê de derbas dibe yan jî ji yê ji aliyê helbestvan ve tê bikaranîn re mexles (nasnav) tê gotin⁴⁷.

Xezel mijara wê bi gelemperî evîn be jî lêbelê di mijarên cûrbicûr de xezel hatine nivîsandin. Ji xezelên kêfxweşiyê û diltengiyê re **xezela aşiqane** tê gotin. Ên ku zewq, şadî û kêfxweşiya dinê tînin ziman **xezela rindane**; xezelên mijarên wan xweşikî û bedewiya meşûqê bin ji wan re **xezela şûhane** tê gotin û ji yên behsa tesewifê dikin re **xezela sûfiyane** an jî **xezela arifane** tê gotin.

Nîzama serwaya xezelê wiha ye: aa, xa,xa,xa...

Xezel wek cûreyek nezmê ewil di edebiyata Ereban de derketiye holê û paşê jî derbasî ebebiyata Farisan bûye û dawiyê jî derbasê edebiyata Tirkan û Kurdan bûye.

Di edebiyata klasîk de hejmara malikên xezelê pênc û heta panzdehan tê qebûlkirin. Lêbelê di dîwanên kurdî de heta sih malikî jî xezel hene. Mela Yasîn Yusrî jî yek ji wan helbestvanan e ku xezelên wî bi piranî wek qesîdeyan dirêj in. Heke ne ji naverokên wan be xezelên wî ji qesîdeyan nayêne cihêkirin. Hinek xezelên Mela Yasîn ji panzdeh malikan zêdetir in. Mela Yasîn ji hêla naverok û cûreyan ve xezelên cûrbicûr nivîsandine. Di dîwanê de ji aliyê cûreyên nezmê ve xezelên musemmat û mulemma û ji hêla mijarê ve jî xezelên aşiqane û sofîyane cih digirin.

Di dîwana Mela Yasîn de şanzdeh xezelên bi kurdî hene.

Ji van xezelan yek mulemma, pênc musemmat û deh jî xezelên ji rêzê ne.

1.2.a.2.1. Xezela Musemmat

Xezelên musemmat ew xezel in ku bi qalibên erûzê yên salim hatine nivîsîn û di navê de dikarin bibin du beş. Di nav xezelan de serwaya navekî heye. Serwaya navekî ya xezela musemmat, malikên ku piştî metlayê tên bi dawiya risteyên wan ên

⁴⁷ Adak, *h.b.*, r. 406.

ewil re hemserwa ne. Lêbelê di hinek xezelan de çar perçeyên metlayê di nav xwe de ne hemserwa ne⁴⁸.

Mela Yasîn di dîwana xwe de pênc xezelên musemmat nivîsandine. Ji van xezelan çend mînak li jêr hatine diyarkirin.

(X. 9/1 m.)

Min dî ji hicra xed gula pir derd û afat û bela
Wan dil helandin wek qela feryad ji destê rûgula

(X. 9/14 m.)

Yusrî ji 'îşqê yek newat şîn bû di dil ji darî hat
Pir jê çinî agir şewat feryad ji destê rûgula

Xezelên Musemmat bi çar risteyan jî tîn nivîsandin. Malikên jorîn ku bi çar risteyan werin nivîsandin wiha dibin:

Min dî ji hîcra xed **gula**
Pir derd û afat û **bela**
Wan dil helandin wek **qela**
Feryad ji destê **rûgula**

Yusrî ji 'îşqê yek **newat**
Şîn bû di dil ji darî **hat**
Pir jê çinî agir **şewat**
Feryad ji destê **rûgula**

Ji xezeleke din mînak:

Ev xezel ji bo musemmatên metlayên wan di nav xwe de ne hemserwa ne, mînak e.

⁴⁸ Saraç, *h.b.*, r. 53.

(X. 1/1 m.)

Îro li min **dijwar e dil** bê rahet û bê **çar e dil**
Her dem bi pêt û **nar e dil** lew her bi ah û naz e dil

(X. 8/13 m.)

Ew Yusrîyê zana **xeûr** şê'ra te gotî bê **qusûr**
Naçe ji te huzn û **kudûr** dil merkeza êşa ye dil

1.2.a.2.2. Xezela Mulemma

Di edebiyata klasîk de yek ji cûreyên xezelê ye ku her risteyeke xezelê bi zimanekî cihê tê nivîsandin. Mela Yasîn mulemmaya xwe rista ewil bi kurdî ya duyem jî bi erebî nivîsandiye.

Ji mulemmaya Mela Yasîn sê malikên ewil û siyên dawî li jêr hatine destnîşankirin:

(X. 3/1 m.)

Mekin lewmê di 'îşqa wan sifet hûr û perî rûyan
Fema tedrûne ma qasel muhubbî mîn belîyatî

Nizanit kes bi dax û şewt û jana vî dilê miskîn
Fala yedrî bîha men lem yezuq hubbel xenîyatî

We dîsa dil ku her jê tê duxana hesret û ahan
Fehel yedrî bîhî men lem yezuq hubbel xenîyatî

(X. 3/113 m.)

Me qursa rojê der şeb dî di wê qursê me kewkeb dî
Ema testexrîbûnel qîsse ta mîn xerqî 'adatî

Me der şeb dî siba ‘îdê li min kir ruhnî xurşîdê
Keenne şemse qed daret îla nisfî semewatî

Fena bit Yusrîyê miskîn ji hubba wê gula rengîn
Fekeyfel înqîtamî wel hewa mîsbahe mîşkatî

1.2.a.3. Qit‘a

Qit‘a di edebiyata klasîk de yek ji teşeyên nezmê ye ku ji malikan pêk tê. Wateya wê ya bingehîn parçeyê tişteki, ji tişteki parek e. Di qit‘ayan de malikên metla û mexles tune ne. Wekî qesîde û xezelan malika ewil bi hemserwayê dest pê nake. Helbestvan mexlesa xwe di qit‘ayan de bi kar nayînin. Risteyên malikan ên duyem bi hev re hemserwa ne⁴⁹.

Nîzama serwaya qit‘ayê wiha ye: xa, xa, xa, xa...

Mela Yasîn di dîwana xwe de bi tenê qit‘ayek nivîsiye. Di qit‘ayan de mexles nayên diyarkirin lê belê Mela Yasîn wek helbestvanên din nekiriye û mexlesa xwe di qit‘ayê de bi kar aniye. Du malikên Qit‘aya ku di dîwana helbestvan de derbas dibe li jêr hatine diyarkirin.

(Qt. 1/1 m.)

Ahê eyyamê wisalê ew çi zû borîn û çûn
Zemzem û aba heyatê çûn li pêş min ma serab

(Qt. 1/7 m.)

Yusrîya te’j her du çeşman rihtiye pir ab û xûn
Bes te go şê’rê şewatê te bi wan dil kir kebab

1.2.a.4. Mesnewî

Mesnewî, di edebiyata klasîk de ji teşeyên nezmê yên ku ji malikan pêk tên formeke herî zêde berbelav û naskirî ye. Wekî têgeheke edebî, mesnewî ew teşeya nezmê ya ku hemû malikên wê bi heman qalibê erûzê tî nivîsandin û her malikeke

⁴⁹Saraç, *h.b.*, r. 73.

wê di nav xwe de hemserwa ye⁵⁰. Ji ber ku di mesnewiyan de du risteyên her malikê di nav xwe de hemserwa ne ji vê cûreyê re mesnewî tê gotin. Lewra peyva mesnewî di zimanê erebî de tê wateya dido dido⁵¹. Mesnewî bi gelemperî teşeyek nezmê ya herî dirêj e. Dema behsa mesnewiyê tê kirin çîrokên dirêj tîr famkirin lê belê di dîwanan de helbestên ku di forma mesnewiyan de jî hatine nivîsîn hene.

Di edebiyata klasîk de mesnewiyên hevpar Leyla û Mecnûn û Yusif û Zuleyxa ne. Di Edebiyata Kurdî de jî ev mesnewî hatine nivîsandin. Harisê Bedlîsî Yusif û Zuleyxa û Leyla û Mecnûn nivîsandine. Lêbelê di Edebiyata Kurdî de ji bilî van mesnewiyên hevpar Ehmedê Xanî mesnewiya xwe ya navdar a bi navê Mem û Zîn nivîsiye.

Li gorî mijarên xwe cûreyên mesnewiyan wiha tîr tesnîfkirin:

Mesnewiyên Dînî (olî)

Mesnewiyên Tesewîfî

Mesnewiyên Exlaqî

Mesnewiyên Dîdaktîk

Mesnewiyên Gernasî (Qeremanî)⁵²

Mela Yasîn Yusrî di dîwana xwe de mesnewiyek nivîsiye. Mijara wê hîciwkirina şêxên sexte ye ku şêxên sexte bi çî awayî mirîdan dixapînin û mal û milkên wan dixwin. Ev mesnewî ya ji xwe kurt e yan jî dewama wê wînda bûye. Ji ber ku pelê piştê wê wînda bûye em nikarin teqez tiştêkî bibêjin.

Ji mesnewiya Mela Yasîn çend malik li jêr hatine diyarkirin.

(Ms. 1/1 m.)

Dibê şêx mirîda re ma hûn ker in

Nizanin di heşrê de bê min herin

Dibêjin ruhê me ji bo te feda

Di gel mal û ewlad û hem bab û da

⁵⁰*H.b.*, r. 79.

⁵¹*Adak, h.b.*, r. 417.

⁵²*Saraç, h.b.*, r. 79.

Nehisya bi xwe ew kerê zirziro
Ku gur xûnê jê fir dike robo

(Ms. 1/20 m.)

Dibê ger bixazim bidin can û ruh
We illa bidim ser we tofanê Nûh

1.2.b. Helbestên Ku ji Bendan Pêk Tê

1.2.b.1. Muselles

Muselles di edebiyata klasîk de teşeyeke nezmê ye û ji bendan pêk tê. Peyva muselles tê wateya sê goşe, sêbare. Ev teşeya nezmê, benda ewil di nav xwe de hemserwa ye, bendên din jî herdu risteyên ewil di nav xwe de û risteya sêyem bi benda ewil re hemserwa ne. Heger risteya bendê ya dawî bê dubarekirin jê re *musellesa mutekerrîr* eger neyê dubarekirin *musellesa muzdewîc* tê gotin⁵³.

Nîzama serwaya musellesê wiha ye:

Musellesa mutekerrîr: aaA, bbA, ccA...

Musellesa muzdewîc:aaa, bba,cca...

Di dîwana Mela Yasîn de musellesek heye û ew jî ji yazdeh bendan pêk tê. Benda ewil a vê musellesê di nav xwe de ne hemserwa ye. Ev jî ne mîna keke ji rêzê ye. Di her benda vê musellesê de risteya dawî hatiye dubarekirin yanî musellesa mutekerrîr e.

Ji musellesa Mela Yasîn du bendên ewil û du bendên dawî wiha ne:

(Msl. 1/1 bn.)

Eya şêrîn sifata min eya qend û nebata min
Eya sebr û sebata min eya rûh û heyata min
Derê carek ji perdê da bibînim bejn û balaê

⁵³H.b., r. 107.

Çi pir husn û cemal î tu ne wek bedr û hilal î tu
Yeqîn nûra zelal î tu li kewnê tev şemal î tu
Derê carek ji perdê da bibînim bejn û balaê

(Msl. 1/10 bn.)

Welem tesxî îlez-zarî bî hubbîn fil heşa sarî
We şewqîn ‘uzrîyîn narî we seccîm ‘endemî carî
Derê carek ji perdê da bibînim bejn û balaê

Ela ya rewnequ’ d-dehrî ela ya kasîfu’ l-bedrî
Ela ya munteha fexrî ela ya mubtefî *Yusrî*
Derê carek ji perdê da bibînim bejn û balaê

1.2.b.2. Texmîs

Texmîs di edebiyata klasîk de teşeyeke nezmê ye û ji bendan pêk tê. Peyva texmîsê tê wateya pênc goşe û pêncbare. Texmîs wek têgehek edebî heke helbestvanekî li malikên xezel an jî qesîdeya helbestvanekî din li gorî wezin û serwaya wê sê riste zêde kiribin jê re texmîs tê gotin⁵⁴. Helbestvanek çawa dikare ji malikên helbestvanekî re texmîsê çêke wisa dikare ji bo malikên xwe jî texmîsê çêke.

Nîzama serwaya texmîsê wiha ye: aaa(aa), bbb(ba), ccc(ca)...

Di edebiyata kurdî de teşeya texmîse zêde hatiye bikaranîn. Texmîsa Kurdî bi piranî li ser helbestên Mela Ehmedê Cizîrî hatiye avakirin⁵⁵. Helbestvanên wek Pertew Begê Hekarî, Şêx Nûredînê Birifkanî, Melayê Bateyî, Miradxan Bazîdî, Şêx Ehmedê Feqîr, Salim, Laxer û Mihemed Teyar Paşayê Amediyê bi teşeya texmîsê helbest nivîsandine⁵⁶.

Di dîwana Mela Yasîn de pênc texmîs hene. Yek ji wan erebî ye çarên din jî bi kurdî ne. Ji van texmîsan çar heb ji xezelên Mela Ehmedê Cizîrî re hatine nivîsandin. Texmîsek jî ji malikên Hezretî Ebûbekir re hatiye nivîsîn.

⁵⁴ *H.b.*, r. 130.

⁵⁵ Zahir Ertekin, Di Edebiyata Kurdî de Texmîs û Texmîsên Mela ‘Eliyê Baqustanî, *Mukaddime Mardin Artuklu üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, j. 6, 2012, r. 71-85.

⁵⁶ Adak, *h.b.*, r. 432.

Çend bend ji Texmîsên Mela Yasîn ên ji xezelên Mela Ehmedê Cizîrî re hatine nivîsandin li jêr hatine diyarkirin:

(Tx. 1/1 bn.)

Sena berqa tecellaê li can û dil 'ekis daye
Li ser şem'ê sifet perwane min zû can û dil daye
Ji zewqa badeya camê hiş û 'eqlê me wunda ye
Ji neş'a badeya kasê dilê mecrûhê şeyda ye
Ji şewqa badeya saqî demîr û dil mucella ye

(Tx. 1/5 bn.)

Buhar e wextê seyranê ku nesrîn û gulê geştên
Were ey 'endelîbê dil sedayê bulbula xweş tîn
Mebe mehzûn çû Yusrî lew perî mestane û meş tîn
Seher hero li meyxañê xerab û mest û serxweş tîn
Mela 'uzrê me meqbûl e ku dîlber mahê sîma ye

Texmîsa Mela Yasîn a ji bo xezela Mela Ehmedê Cizîrî ya bi paşserwaya *şeb û roz* dewama wê nehatiye peydakirin. Benda ewil û du risteyên dawî li jêr hatine diyarkirin.

(Tx. 2/1 bn.)

Çemena husn û beha rewzê cemal î şeb û roz
Ji sera ta bi qedem nûra zelal î şeb û roz
Li sera perdeê can şewq û şemal î şeb û roz
Tu dizanî bi Xudê min tu xiyal î şeb û roz
Bi xiyala xwe mudam min tu li bal î şeb û roz

Cuz û cewher bexişandî te ji wê cewherê ra
Pur bi şahî û şahane bi leb kewserê ra

Mela Yasîn Texmîsek jî ji helbesta Mela Ehmedê Cizîrî ya risteya wê ya ewil
“Ey nesîmê sehere ma de mecala sibehê” ye re nivîsiye. Benda ewil û benda dawî li
jêr hatine diyarkirin.

(Tx. 4/1 bn.)

Me ne sebr û ne sukûn ey zerîya me şebehê
Zankî rûh soxteê başit ji evhina te şehê
Goftem ez badê seba ra ji dilê sohtî çehê
Ey nesîmê seherê ma di mecala sibehê
Sed selaman bigêhênî ji me wê padişehê

(Tx. 4/15 bn.)

Lefekeş-şewq û eya Yusrî biwarid fedehek
Ji kehil firqe kehil qet nîye hacet bi mehek
Rûh li cismê mela her tu mecer şebehê
Ji ezel heq bi Mela daye ji ‘îşqê qedehek
Ta ebed mest û xerab in ji meya wê qedehek

Texmîseke din jî ev e:

(Tx. 3/1 bn.)

Gulê îqbal û se‘adet me ji baxê Îremê
Ku bi cellabê du‘a hate ji kenza keremê
Di bi warê çûk û lê da berda keyf û kemê
Hêvî û tewqê dîkin em ji Xudana heşemê
Wê nîgar û senem û padişeh û muhteşemê

(Tx. 3/16 bn.)

Yusrîya çendîheba dil ji te da baê felaê
Misle ma ger çî nefî kir cezmê da şubhetê laê
Lê belê hemd û sena tu ku ji asarê belaê
Me didî wana se‘adet seyr kir şubhê Melaê
Tu bi navê me gedaê bikişînî qelemê

1.2.b.3. Muxemmes

Muxemmes, di edebiyata klasîk de teşeyeke nezmê ye û ji bendan pêk tê. Peyva muxemmes tê wateya pênc libî û pênc goşe. Wekî têgehek edebî jî teşeya nezmê ya ji pênc risteyan pêk tê ye. Cudatiya Muxemmesê ji texmîsê, her pênc risteyên bendan jî yên helbestvanekî ne. Benda ewil risteyên wê di nav xwe de hemserwa ne, bendên din her çar risteyên wan ên ewil di nav xwe de, ya dawî jî bi benda ewil re hemserwa ye⁵⁷. Eger risteya dawî ya her bendê bê dubarekirin jê re muxemmesa mutekerrîr an na muxemmesa muzdewîc tê gotin⁵⁸.

Nîzama serwaya muxemmesê wiha ye:

Muxemmesa muzdewîc: aaaaa, bbbba, cccca...

Muxemmesa mutekerrîr: aaaaA,bbbA, ccccA ; aaaAA, bbbAA,cccAA

Di dîwana Mela Yasîn de muxemmesek cih digire, ew jî muxemmesa mutekerrîr e. Benda ewil û benda dawî li jêr hatine diyarkirin.

(Mx. 1/1 bn.)

Ê serî danîn li ser ‘utba derê te bê ‘eded

Kes ji wî dergahê tey ‘alî nebû mehrûm û red

Her kesê hezza xwe jê girtî ku bê hisab û hed

Elmeded ya Xewsê E‘zem Şahê Geylanî meded

Ez li dergahê te miskîn im telebdarê meded

(Mx. 1/9 bn.)

Yetlubû Yusrî mînellahî Te‘ala en yezîd

Hubbîhî fî qelbîhîs-sadî we hubbîn mîn berîd

Zatîhî subhanehû mîn ewlîya‘în we şehîd

Elmeded ya Xewsê E‘zem Şahê Geylanî meded

Ez li dergahê te miskîn im telebdarê meded

⁵⁷ Saraç, *h.b.*, r. 123.

⁵⁸ *H.b.*, r. 121.

1.2.b.4. Museddes

Museddes, di edebiyata klasîk de yek ji teşeyên nezmê ye ku ji bendan pêk tê. Peyva museddes tê wateya şeş libî û şeş goşe⁵⁹. Cudatiya museddesê ji tesdîsê, her şeş risteyên bendan jî yên helbestvanekî ne lê belê ji hêla ruxsarê ve wek hev in. Benda ewil risteyên wê di nav xwe de hemserwa ne, bendên din her pênc risteyên wan ên ewil di nav xwe de, ya dawî jî bi benda ewil re hemserwa ye. Eger risteya dawiya her bendan bê dubarekirin jê re museddesa mutekerrîr an na museddesa muzdewîc tê gotin.

Nîzama serwaya museddesan wiha ye:

Museddesa muzdewîc: aaaaaa, bbbbbb, ccccca...

Museddesa mutekerrîr: aaaaaA, bbbbbA, ccccaA ; aaaaAA, bbbbAA, ccccAA

Di dîwana Mela Yasîn de du museddes cih digirin, herdu jî museddesên mutekerrîr in.

Ji bendên wan ên ewil û dawî wek mînak li jêr hatine diyarkirin.

(Msd. 1/1 bn.)

Selsebîl û kewser û aba heyatê şehd û qend
Nîsbeta şahê Buxara ‘alî Şahê Neqşebend
Ê vexwut rake ji dil sed perdeê gemmar û gend
Dê bibit saf û neqî sahib kemal û dewlemend
El eman Şahê Buxara ‘alî Şahê Neqşebend
Sed meded pîrê terîqet ez li dergahê te bend

(Msd. 1/8 bn.)

Ger dixwazî mesleka heqq û heqîqet Yusrîya
Da nebî roja heşir ruswa û şermî rû siya
Bigre zeyla Şahê Neqşî şu‘ledarê ewliya
Key tera yewme’t- tunadî nûrê sahe’l-enbiya
El eman Şahê Buxara ‘alî Şahê Neqşebend
Sed meded pîrê terîqet ez li dergahê te bend

⁵⁹H.b., r. 135.

Ji museddesa din mînak:

(Msd. 2/1 bn.)

Ey gula baxê rîsalet ey Muhemmed Mustefa
Ey çiraxê her du 'alem me'dena sidq û sefa
Menzera quddûsiyan î mexzena 'îzz û wefa
Rehber û ustadê 'alem muqteda û muqtefa
El eman ya Seyyîde'l- kewneynî ya xeyre'l-wera
El meded şahê du kewna Ke'baya peyxembera

(Msd. 2/9 bn.)

Raciyê 'uzma şefa'et Yusrî der roja heşir
Yewme yed'ûnnasû da'îhîm îlaşeyînnukir
Izterel ehwalî tebdu wel 'ezabê mustemir
Min xutûbi't-tametil kubra fehel mîn mudekîr
El eman ya Seyyîde'l-kewneynî ya xeyre'l-wera
El meded şahê du kewna Ke'baya peyxembera

1.2.b.5. Tesmîn

Tesmîn di edebiyata klasîk de yek ji teşeyên nezmê ye ku ji bendan pêk tê. Peyva tesmînê tê wateya tiştê ku bibe heşt libî an jî bibe heşt goşe. Wekî têgeha edebî li her malikeke xezelekê bi heman wezin û serwayê bi zêdekirina şeş risteyan pêk tê⁶⁰.

Nîzama serwaya tesmînê wiha ye: aaaaaa(aa), bbbbbb(ba), ccccc(c)

Cûreyeke tesmînê ya din jî bi tenê li metleya xezelekê bi zêdekirina şeş risteyan pêk tê.

Nîzama serwaya vê tesmînê wiha ye: aaaaa(AA), bbbbbb(AA), ccccc(AA)

Di dîwana Mela Yasîn de tesmînek heye. Ev tesmîn ji xezela Mela Ehmedê Cizîrî re hatiye nivîsandin. Benda ewil û benda dawî li jêr hatine diyarkirin.

⁶⁰H.b., r. 158.

(Tes. 1/1 bn.)

Min can bi selem da ku bi yarê beres im ez
Waşî xebitî lê ku di bazarê nesim ez
Me ji ‘unsûrê ‘alî ku ne xar û ne xesim ez
Go rewzê cemala te re cana necesim ez
Perwane sifet soxte mam bê nefes im ez
Berqê de li Turê ku ji perdê feres im ez
Cana ji cemala te muqeddes qebes im ez
Ger xûb û perîzade nezer kî tebes im ez

(Tes. 1/10 bn.)

Der nezmê lu‘alê Yusrî her çendî tu ‘elaê
Lakîn tu ji xûban hedefa derd û belaê
Her dem dihelînin ji te can şubhê qelaê
Ten nîne hedîd û ne hecer ne tu qelaê
Ev husnê li ‘alem bû neşir tê te xelaê
Ger ew bi cemala xwe nekin dîde celaê
Ser ta bi qedem ez bi sojim şubhê Melaê
Perwane sifet sohtim wekî sewt û hisim ez

1.2.b.6. Tetsî

Tetsî, di edebiyata klasîk de yek ji teşeya nezmê ye ku ji bendan pêk tê. Peyva tetsî tê wateya neh libî û neh goşe. Helbestvanekî ku li malikên xezela helbestvanekî din heft liban zêde bike jê re tetsî tê gotin. Benda ewil risteyên wê di nav xwe de hemserwa ne, bendên din her heft risteyên wan ên ewil di nav xwe de, ya dawî jî bi benda ewil re hemserwa ye. Eger risteya dawiya her bendê bê dubarekirin jê re tetsiya mutekerrîr an na tetsiya muzdewîc tê gotin. Di edebiyata tirkî de heta niha ev teşeya nezmê nehatiye dîtin⁶¹.

⁶¹H.b., r. 164

Nîzama serwaya tetsiyê wiha ye:

Tetsiya muzdewîc: aaaaaaaaa, bbbbbbbba, ccccccca...

Tetsiya mutekerrîr: aaaaaaaaaA, bbbbbbbbaA, cccccccaA ;

aaaaaaaaAA, bbbbbbbbaAA, cccccccaAA

Di dîwana Mela Yasîn de helbesteke neh libî heye. Ev helbesta neh libî çar risteyên ewil ên Mela Yasîn, pênc risteyên dawî jî yên Mela Ehmedê Cizîrî ne. Tê famkirin ku ji bo muxemmesa Mela tetsî hatiye kirin.

Benda ewil û ya dawî wek mînak li jêr hatine diyarkirin:

(Tt. 1/1 bn.)

Ger çî der î n ‘alema teklîfê ber xakê zemîn

Nazir im ber neqşê ayîna hudûsê gav û hîn

Lêkî niqaşê xuyabû min di ayînê yeqîn

Ger çî wan zewqa xîtaba ‘alema rûhê ku dîn

Min di ber qalûbela batin vebû rabû evîn

Hêj li ser ‘ehda elest im ta bi roja axerîn

Min divê lê eşkera kim carekî daxa nehîn

Goftem ûra ma do ‘agûyê to ey horî ‘în

E‘redet ‘ennî we qalet ma du‘a el-kafirîn

(Tt. 1/5 bn.)

Berq û lami‘ da ji bala dil fetana husnê to

Bû hedef bû qesd û amalan nişana husnê to

Lu‘luê menzûm bi Yusrî daye kana husnê to

Mezherê sirra ilahî bû sîwana husnê to

Na ‘êtin gotin bi qal û şerh beyana husnê to

Wê bi hal û sur binasîn dil fesana husnê to

Xweş Mela amancê tîran kir kemana husnê to

Qisseê ‘îşqa celalî dasitana husnê to

Tîlke enbaun yeqûlu‘n-nasû mînna be‘de hîn

1.2.b.6. Te‘şîr

Te‘şîr di edebiyata klasîk de yek ji teşeya nezmê ye û ji deh risteyan pêk tê. Wateya wê kirina tişteki deh libî an jî deh goşeyî ye. Te‘şîr li her malikeke xezelê bi zêdekirina heşt risteyan pêk tê⁶². Ev teşeya nezmê di edebiyata klasîk de pir ne berbelav e. Di edebiyata Osmanî de Yehya Efendî ji bo xezela Muhîbbî te‘şîrek nivîsiye⁶³. Di edebiyata kurdî de jî Mela Yasînî ji bo xezela Mela Ehmedê Cizîrî te‘şîr nivîsiye.

Nîzama serwaya te‘şîrê wiha ye: aaaaaaaaa(aa),bbbbbbbb(ba), ccccccc(ca)

Di dîwana Mela Yasîn de te‘şîrek heye. Benda ewil û ya dawî li jêrê hatiye destnîşankirin.

(Teş. 1/1 bn.)

Çi bi zahir ji gunahan dîkin em xewf û xeter
Me li dil bestiyê zennarê sîwaê çû kemer
Ji semûmê hedesê qet me nema zerre hezer
Bi wê lew girtiye cama me gelek teb‘ê hecer
Ji selabet teb‘ê elmasê li wê nade eser
Ne ji ‘eynê keremê lêde hebîba me nezer
Remedê girtiye çavê me dinalin ji ceger
Hêvî û tewqe dîkin em ji te badê seher
Tozekî bîn bi xwe ra da bigirin kehlê beser
Li terîqa qedema dîlberê wê rehgezerê

(Teş. 1/12 bn.)

Cennetu’l-ridwanîyek xonçe ji firdewsê cemal
Gerne şermende biya ez şeref û şewq û şemal
Bi zewalê çi xerez bû şemseya bedrê kemal
Hêviy û tewqe dîkin em ji te carek ku vemaal
Leyleya da çiyê zulma tu ji ser nûrê zelal

⁶²H.b., r. 170.

⁶³Haluk İpekten , Eski Türk Edebiyatı nazım Şekilleri ve Aruz, Dergay Yayınları, İstanbul 2005, r. 112.

Da xuya bit şeb û ro her du di nîv bircê hilal
Da ji miska Xetenê *Yusrî* tu bîn ke xet û xal
Ne ji şa'nê te ye ey padîşehê reddê su'al
Lew ku pir şefqe di dêrin kerem û lutf û kemal
Ah ji dest remz û şêrîn wê durr û le'l û guherê

1.2.b.7. Taştîr

Taştîr di edebiyata klasîk de teşeyeke nezmê ye û ji bendan pêk tê. Ev teşeya nezmê wek teşeyên din pir ne berbelav e. Peyva taştîr tê wateya tiştê di nîvî de bibe du par an jî duparkirina tiştê di nîvî de⁶⁴. Wekî têgehê edebî mirov dikare taştîrê wiha bide nasîn: Di navbera malikên xezelê de zêdekirina du, sê, çar û zêdetir risteyan e⁶⁵. Heger li malikên xezelê du riste werine zêdekirin jê re *terbî'a muterref*, sê riste were zêdekirin jê re *texmîsa muterref* tê gotin. Cudatiya vê teşeyê ji yên din (ên ku ji bendan pêk tên) ew e ku risteyên li xezelê tene zêdekirin dikevin navbera malikan.

Nîzama serwaya taştîrê wiha ye:

Terbî'a muterref: (a)aa(a), (b)bb(a), (c)cc(a)

Texmîsa muterref: (a)aaa(a), (b)bbb(a), (c)ccc(a)

Di edebiyata Kurdî de helbestvanên wekî Naciyê Cizîrî, Şex Emînê Heyderî, Mela Yasîn Yusrî û Mela Selamedîn taştîr nivîsîne. Di Dîwana Mela Yasîn de du taştîr hene. Mela Yasîn yek ji van taştîran ji xezela Mela Ehmedê Cizîrî re nivîsandiye. Ev taştîr ji şeş bendan pêk tê. Ya din jî ji xezela Şêx Eskeriyê Axtepî re nivîsandiye. Bendên ewil û yê dawî li jêr hatine diyarkirin.

Taştîra ji bo xezela Mela Ehmedê Cizîrî

(Taş.1/1 bn.)

Dilber şekîna şekerek fequltû ya rûhî meta

Ye'tîlena lenet-te'cîr û wel we'dû'ş-şerîfû qed eta

Ya leyte şê'rî hel era mînkum qerîben wecneta

⁶⁴H.b., r. 101.

⁶⁵Seraç, h.b., r. 173.

Go mim heta xatir hebit min go çikim ez ba heta
(Taş. 1/6 bn.)
Me j' bexçeya yar zeyyînî bê pîrs Mela sêvek çinî
Şa bûm bi sêvê dil kenî yarê kişandî xîreta
Yusrî' tebîr mîn hefvetî qed edebbenî munyetî
We bî ma ceneytû hibbetî el qed 'eleye cînayeta

Taşîra ji bo xezela Şêx 'Eskerî

(Taş. 2/1 bn.)
Çi nûrîn tel'etek bû min di camê de temaşa kir
Bi wê husna munezzeh dil esîrê nûn û sada kir
Sifet perwane mam da dil şehab û lem'eê agir
Bi sed tewrî 'ezabê can û dil talan û yexma kir
Ji hûş û 'aqilî xistim dema perde ji ro rakir

(Taş. 2/14 bn.)
Dizanim derd û ekdarê hebîbê cumle 'ihsan in
Li sîn Yusrî lew derd û elem tev jê re nîşan in
Hezar hemd û şukur bo Heq Te'ala derdê derman in
Îlac û merhema cerhê tivingê zenb û 'isyan in
Ji ber vê 'Eskerî jê hend û şukur ê hem temenna kir

1.2.c. Wezin (Kêş)

Wezin ew pîvan e ku helbestek an jî nezmek ji serî heta dawiyê li gorî wê tê nivîsandin. Di edebiyata kurdî de sê cure wezin hatine bikaranîn. Ev wezin ji wezina erûzê, wezina hêceyî û ji wezina serbest pêk tên. Wezina erûzê di edebiyata klasîk, a hêceyê di edebiyata gelêrî û ya serbest jî di edebiyata modern de tê bikaranîn. Di zimanê erebî de peyva erûzê tê wateyên wekî alî, rê, rêbaz, sitûna kon û hêştira serkeş⁶⁶.

⁶⁶ Adak, *h.b.*, r. 365.

Mela Yasîn di helbestên xwe de bi tenê wezina erûzê bi kar aniye. Helbestvan qalibên hêsan û pir belavbûyî hilbijartine. Di hemû helbestên xwe de bi tenê çar behir bi kar anîne. Qalibên erûzê û behrên wan helbestan li jêr hatine diyarkirin.

Mela Yasîn qalibên erûzê yê herî tekûz wekî çar mustefîlun, çar mefaîlun û çar faîlatun bi kar anîne.

Mustefîlun / mustefîlun / mustefîlun / mustefîlun

Behra Recezê (salim) - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

Faîlatun / faîlatun / faîlatun / faîlatun

Behra Remelê (salim) - + - - / - + - - / - + - - / - + - -

Faîlatun / faîlatun / faîlatun / faîlun

Behra Remelê (nesalim) - + - - / - + - - / - + - - / - + - -

Feîlatun (faîlatun) / feîlatun / feîlatun / feîlun (faîlun)

Behra Remel (nesalim) + + - - / + + - - / + + - - / + + - -

Mefaîlun / mefaîlun / mefaîlun / mefaîlun

Behra Hezecê (salim) + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

Feûlun / feûlun / feûlun / feûl

Behra Muteqarib (nesalim) + - - / + - - / + - - / + - -

Mefûlu / mefaîlu / mefaîlu / feûlun

Behra Hezecê (nesalim) - - + / + - - + / + - - + / + - -

1.2.d. Serwa (qafiye) û cûreyên wê

Serwa ji du peyvên ku divê herî kêr di dawiya du risteyan de ji aliyê deng ve wek hev, ji aliyê wateyê ve cuda bin re tê gotin. Ji bo ku wekheviya dengên nav du

peyvvan serwa were hesibandin divê ev peyv ji hêla deng û wateyê ve ne yek bin⁶⁷. Mela Yasîn di helbestên xwe de piranî serwa bi kar aniyê, di hinek helbestan de paşserwa heye.

(Ms. 1/10 m.)

Didoşe ji wan ka giya û **tutûn**

Pera û genim ceh hirî mû û **rûn**

(Q. 6/1 m.)

Hatin em dergahê ‘alî ya îmamel **murselîn**

Racîyê lutfâ mezin em ya medarel **‘alemîn**

1.2.d.1. Li gorî cihê wê yê di risteyê de

Li gorî cihê serwayê di risteyê de sê cûre serwa hene: Serwaya kutayî, serwaya navekî û serwaya sereta⁶⁸.

1.2.d.1.1. Serwaya Kutayî

Serwaya kutayî ji serwaya di dawîya risteyan de cih digire re tê gotin. Mînakên vê serwayê li ser malikên Mela Yasîn ên li jêrê hatine nîşandan.

(Q. 2/1 m.)

Şeker û şehd û şîfa dil te bi çavên xwe **belek**

Ebedî hiştî di qeyda hubb û ‘îşqa xwe **gelek**

(Q. 2/20 m.)

Sekinî ma ji weqara te sera ta **semek**

We ji ‘îşqa te ne sergeşt e seyarat û **felek**

⁶⁷ Cem Dilçin , *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, TDK Yayınları, Ankara 2013, r. 59.

⁶⁸ Bamed Serdar , *Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî*, Nûbihar, Stenbol 2015, r. 83.

1.2.d.1.2. Serwaya Navekî

Serwaya di nav risteyan de cih digire ye. Mela Yasîn ev cûreya serwayê di xezelên xwe yê n musemmat de gelekî bi kar aniyê. Wek mînak di malikên jêrê de hatiye diyarkirin.

(Q. 7/3 m.)

Hebeş berdane ser rojê giha ser ‘eqdê bişkojê
Dilê min sohtî wek dojê bi hevra atêşek danî

(X. 6/4 m.)

Sed hesret û ab û girî min rêhtî ser wî agirî
Pê geş dibî natemirî qetrek ji rehmet lê reşîn

(Q. 7/5 m.)

Zulam berda bi ser nûrê giha ser camê ferfûrê
Ji Wadê Eymena Tûrê veda pir zew’ û lem’anê

(X. 9/6 m.)

Rûgul ku fincana şerab da min li ser tilîyê zirab
Dunya li pêş min bû serab feryad ji destê rûgula

1.2.d.1.3. Serwaya Sereta

Ev cûreya serwayê di serê risteyan de cih digire. Mela Yasîn ev di dîwana xwe de pir bi kar neaniye.

(X. 1/10 m.)

Ne ji abê çeşmê bilbilan pêta ciger da sorgulan
Ne ji atêşê jerg û dila sorgul xerîqê maye dil

(Q. 4/11 m.)

Buhurîn rojê mubarek esefen sed esefa

Buhurîn ku serv û zemzem me nema xeyrê serab

(Q. 3/15 m.)

Hinek nûrî ne hin de‘wacî hin qurbacî hin Îran

Hinek ewha hinek ewha nelazim ‘eddê wan îro

1.2.d.2. Li gorî Dengan

1.2.d.2.1. Serwaya Lawaz

Serwaya lawaz di risteyan de wekheviya dengê bi tenê ye. Di edebiyata klasîk de ev serwa zêde nehatiye hilbijartin⁶⁹ û di dîwana Mela Yasîn de jî cûreya vê serwayê peyda nabe.

1.2.d.2.2. Serwaya Asayî

Di serwayê de ji wekheviya du dengan re tê gotin. Di dîwana Mela Yasîn de hatiye bikaranîn:

(Q. 4/1 m.)

Zerîya nazik û şêrîn bedew û hulwê rid**ab**

Bi cemala xwe ne hiştî di dinê bo kesî **nab**

(X. 9/1 m.)

Min dî ji hîcra xed gula pir derd û afat û **bela**

Wan dil helandin wek qela feryad ji destê rû**gula**

(X. 4/1 m.)

Tên ji qewsê nûnê Leylê bê ‘eded tîr û **nesil**

Lehm û dem musqeb kirin ta ew gihiştê cerg û **dil**

⁶⁹ H.b., r. 85.

(Q. 5/1 m.)

Muhemmed raqîyê ‘erşê îlahî kenzê ‘irfan î

Cemal û rewnaqa ‘alem medarê cumle ekwan î

1.2.d.2.3. Serwaya Zêdebar

Di serwayê de ji wekheviya du dengan zêdetir re tê gotin.

Çend mînak ji dîwana Mela Yasîn:

(Q. 11/1 m.)

Der dil te hesret ger nebit ma tu bi axînê çi kî

Ger te nebîtin derd û xem ma tu bi nalînê çi kî

(Msd. 1/1 bn.)

Selsebîl û kewser û aba heyatê şehd û qend

Nîsbeta şahê Buxara ‘alî Şahê Neqşebend

(Msd. 2/1 bn.)

Ey gula baxê rîsalet ey Mihemmed Mustefa

Ey çiraxê her du ‘alem me‘dena sidq û sefa

(X. 13/1 m.)

Du reşmaran li dor bedra munewwer dager û helqe

Di meydana qitalê wan li min dil kir du sed felq e

1.2.d.2.4. Serwaya Regezdozî (Cînas)

Serwaya regezdozî peyv û dengên ku bilêvkirina wan wekî hev e, lê belê wateya wan ji hev cuda ye. Regezdozî di wateya cînasê de ye. Ev wek hunerek edebî jî tê bikaranîn. Di diwana Mela Yasîn de tenê di cihekî de hatiye bikaranîn.

(Ms. 1/8 m.)

Bi wan re heye çunkê teb'ê **kerî**

Wekî pez dibin jê re qewte **kerî**

Peyva kerê ya ewil navê ajalekî ye, ya duyem jî di wateya birekê de ye.

1.2.d.3. Paşserwa (Redîf)

Deng û peyvên ku di dawiya risteyan de hem ji hêla şikil hem ji hêla wateyê ve yek bin re paşserwa tê gotin. Mela Yasîn ev cûreya serwayê bi kar aniyê.

(X. 5/1 m.)

Nişan da husnê xariq bo cemî'ê xas û 'am **ebrû**

Ji bo wê cewherê husna muqeddes bû xîtam **ebrû**

(Q. 3/1 m.)

Werin ey dost û ehbabê ku xwey dîn û îman **îro**

Temaşa kin li vê şî'rê bi qelb û rûh û can **îro**

(X. 11/1 m.)

Bi heyata te qesem min tu xiyal **î şeb û roj**

Tu di dil wek lukuzê şewq û şemal **î şeb û roj**

(Q.12/1 m.)

Ey hebîbê rûh û qelban canê cananê **Selîm**

Ey çiraxê cîsm û canan pak û nûranî **Selîm**

B – ANALÎZA UNSÛRÊN KULTURÎ

2.1. Dîn

Edebiyata kurdî ya klasîk mijarên xwe ji gelek çavkaniyan distîne. Destan, menqîbe, buyerên tarîxî, dîn û hwd. bingehên mijarên edebiyata klasîk in. Gelek mijarên dînî di helbestên klasîk de hatine bikaranîn wek Qur'ana Pîroz, hedîs, qisseyên pêxemberan, mucîzat, kozmografya, alema xeybê û mijarên din.

Mela Yasîn jî wek helbestvanên klasîk ên din ji van mijarên dînî îstîfade kiriye û bi awayekî sembolîk di helbestên xwe de bi kar anîne.

2.1.a. Xwedê

Di edebiyata klasîk a Rojhilatê de Xwedê di nav gelemperiya mijaran de wekî navend cih digire. Helbestvanên ekola klasîk di helbestên xwe de bi piranî li ser vê unsûrê rawestiyane.

Mela Yasîn di helbestên xwe de navên Xwedê gelekî zêde bi kar anîne. Yên me di helbestên wî de dîtine ev in:

Xuda, Rehîm, Xaliq, Reb, Xeffar, Tewwab, Settar, Rehman, Mennan, Îlahî, Berr, Barî Te'ala, Qadir, Semed, Kerîm, Burhan.

(Q.1/2 m.)

Tu **Berr** û hem **Xeffar** î tu **Tewwab** û tu **Settar** î
Medîrê çerxê dewwar î tu Xellaq î hem cûd î

(Q.1/1 m.)

Ilahî her tu yî **Rehman** ilahî her tu yî **Mennan**
Ilahî her ji te ihsan bi her şey ta nemil dûdî

2.1.b. Pêxember

Di edebiyata klasîk de pêxemberên Xwedê bi qiseyên xwe yên di Quranê de derbas dibin bi hûnera telmîhê têne diyarkirin. Pêxemberên ku navên wan di helbestên Mela Yasîn de derbas dibin ev in: Adem, Îsa, Eyyub, Yusif, Nûh, Musa, Suleyman û Mihemmed in. Di vê dîwanê de herî zêde navê Hezretî Mihemmed.

2.1.b.1. Mihemmed

Mela Yasîn di dîwana xwe de heşt helbest bi cûreya ne‘tê nivîsandine. Ji ber vê yekê navên Hezretî Mihemmed gelekî derbas dibin. Ji bo Hezretî Mihemmed ev nav bi kar anîne: Resûlê Heq, Mustefa, Mehmûd, Muhemmed Mustefa, Hezretî Muhemmed, Îmame‘l-murselîn, Seyyîde‘l-kewneyn, Xateme‘l-enbîya, Medare‘l-‘alemîn.

(Q.9 /3 m.)

Selam û himmeta **Hezret Muhemmed Mustefa** derket

Li ser qama te bû cennet wekî cennatê Ridwan î

(Msd.2/1 m.)

El eman ya **Seyyîde‘l-kewneynî** ya xeyre‘l-wera

El meded şahê du kewna Ke‘baya peyxembera

(Q.6/1 m.)

Hatin em dergahê ‘alî ya **Imame‘l-murselîn**

Racîyê lutfâ mezin em ya **Medare‘l-‘alemîn**

2.1.b.2. Adem

Adem li gorî kitebên pîroz mirovê herî ewil hatiye afirandin e. Di Qur‘ana Piroz de derbareyê Adem de gelek ayet hene. Di gelek hedîsan de jî wek ‘‘ebu‘l-beşer’’ derbas dibe. Yanî bavê mirovatîyê⁷⁰. Di edebiyata klasîk de dema navê Adem

⁷⁰ İskender Pala , *Ansiklopedik Divân Şiiri Sözlüğü*, Kapı Yayınları 2007, r. 5.

derbas dibe, bi piranî telmîh ji bo qisseya wî ya “avêtina wî ya ji bihuştê” ye. Ji niha pê de wergera temamê ayetan ji meala Qurana Pîroz ya ku me kunya wê diyar kiriye hatine girtin⁷¹.

Ev qisseya Adem di Qur’anê de wiha derbas dibe:

Me (ji wan re got): “De hûn tev ji bihuştê dakevin! Heke ji cem min hîdayetek ji we re bê, îcar kî ji we bide pey hîdayeta min, ji wan re tu tirs tune ye û ew dê xemgîn jî nebin⁷².”

Di dîwana Mela Yasîn de bi tenê carekê navê Adem derbas dibe û bi navê wî re navê Hewwa jî hatiye. Di vir de jî wek bavê mirovatiyê hatiye diyarkirin.

(Ms. 2/6 m.)

Silsila new‘ê beşer hetta bi **Hewwa Ademê**

‘Unsurê kewnê cemî‘ê xett û herfê ‘alemê

Heq Te‘ala bo te anî ba cihaz û melzemê

Da bi wan zeyy û lîbasê hey‘eta keyf û kema

El eman ya Seyyîde‘l-kewneynî ya xeyre‘l-wera

El meded şahê du kewna Ke‘baya peyxembera

2.1.b.3. Îsa

Di edebiyata Rojhilat a klasîk de Îsa pêxember bi mucîzeyê xwe ya ku kor, seqet, nexweş baş kirine û bi saxkirina miriyan tê naskirin. Di helbestan de bi motîfa Loqman re tê bikaranîn. Navên Mesîh, Rûhullah, îbnî Meryem ji bo Hezretî Îsa tên bikaranîn. Di helbestên klasîk de nefesa meşûqê wekî nefesa Îsa ye. Ew çawa miriyan sax dike, yar jî evîndarê xwe wisa sax dike⁷³.

(Tes.1/7 m.)

Selwê qedê lakin ji wê dide semerê te

⁷¹ M.Huseyn Êsî û yên din. *Wergera Meneya Qur‘ana Pîroz Ser Zimanê Kurdî*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2014.

⁷² Beqere 2/38

⁷³ Ahmet Talat Onay , *Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar*, MEB Yayınları, Anakra 1996, r. 283.

Hem behrê muhit lê ji wê bêhter cuwrê te
Meytê ku du sed salî dike hey yek nezerê te
Îsa ye di ‘eyna me de mûm û fenerê te
Sotin me evan pêt û pereng û cemerê te
Lê ez xoş û razî me bi cerh û eserê te

(Q.12/7 m.)

Meyyitê sed sal e dê hey bit dema lêkî nezer
Tu ji bo emrazê dil ‘**Îsa** û Loqmanê Selîm

Di Qurana Pîroz de mucîzeyaya Hezretî Îsa ya ku koran baş dike û miriyan sax dike wiha hatiye diyarkirin:

“Min ji cem Xwedayê we ji bo mucîzeyek aniye; ez ji bo ji heriyê şeklê teyran çêdikim û paşê ez pif dikimê, vê ja bi destûra Xwedê ew dibe teyr. Dîsa bi destûra Xwedê ez kor û kotiyên şîfa dikim û miriyan jî sax dikim⁷⁴.”

2.1.b.4. Eyyub

Di edebiyata klasîk de wek sembola sebir û tehemmulê tê bikaranîn. Hezretî Eyyub pêxemberekî dewlemend bûye, mal û mulkê wî gelek zêde bûye. Xwedê ew îmtihan kir. Her tiştê wî jê stand û nexweşiyêke giran dayê, kurm ketin laşê wî⁷⁵. Li hemberê vê belaya giran wî sebireke mezin nîşan da û di dawiyê de Xwedê dîsa mal û şîfa dayê.

Di dîwana Mela Yasîn de navê Eyyub carekê derbas dibe:

(Q.1/7 m.)

Tu meqsûd û tu mehbûb î rizake ‘ennî metlûb î
Bidem wek da te **Eyyub** î şîfa ez zurcefa dûdî

⁷⁴ Alî Îmran 3/49.

⁷⁵ Onay, *h.b.*, r. 224.

2.1.b.5. Yusif

Di Quranê de qîsse Yusif bi awayekî berfireh hatiye vegotin. Di edebiyata klasîk de Yusif sembola xweşikî û exlaqê baş e. Xwedê xweşikiya sûret û sûret daye wî. Xweşikiya Yusif di helbesta Mela Yasîn de wiha derbas dibe:

(Taş.1/4 bn.)

Rewzeyê husn û cemala **Yûsufê** dewr û zeman

Dibe yek lale ji gulzarê kemala te cuwan

Şerhê ewsafê cemala te kecatê reqeman

Ji mehala ne ku bêtin reqemê şerh û beyan

Kirî za'îl me bi medhê te necaset ji lîsan

Gelê iqbal û se'adet tu bi cellabê deman

2.1.b.6. Nûh

Di edebiya Kurdî de Nûh bi qîsseya tofanê tê zikirkirin. Temen, keştî û tofana wî wek mazmûn têne bikaranîn⁷⁶. Di helbesteke Cefêr Qulî Zengelî de tofana Nûh bi hunera telmîhê hatiye diyarkirin:

Adem we renc û mihnet mayûs bû je cenanê

Nûh kir kişand meşaqet le ezmanê **tofanê**

Îbrahîm avîtnê nêr saxera wê bû texanê

Le vî dunya kes nema zebîhê qurbanî çû⁷⁷

⁷⁶ *Hb.*, r.386.

⁷⁷ Kelimollah Tewahodi, *Dîwana Cefêr Qulî Zengelî*. Êntêşaratê Vasi', Meşhed 1381, r. 128.

Di dîwana Mela Yasîn de qisseyaya tofanê wiha derbas dibe:

(Ms.1/20 m.)

Dibê ger bixazim bidin can û ruh

We illa bidim ser we **tofanê Nûh**

2.1.b.7. Mûsa

Qisseyaya Mûsa pêxember di Quranê de bi awayekî berfireh hatiye vegotin. Di edebiyata klasîk de Mûsa pêxember, Çiyayê Tûrî Sîna, Wadiya Eymen bi hev re derbas dibin û wekî sembolên wehdetul wucûde tên bikaranîn. Mûsa pêxember dema diçe Tûrî Sînayê, Xwedê li çiyê tecellî dike. Mûsa li wir bi Xwedê re diaxive û ji ber vê yekê navê wî yê Kelîmullah jî di helbestan de derbas dibe.

Di helbestên Mela Yasîn de Mûsa Pêxember wiha derbas dibe:

(X.10/9 m.)

Şeb ji ser rojê ku rabû ateşê **Mûsa** xuya bû

Dil ji ‘uşşaqan cuda bû dil revandî dil ji min

(Tx.1/3 bn.)

Bike teqwîm dilê yek ta beder sîrr û ‘elanê da

Sebir kin ber cefa ey dil di vê seyra me’anî da

Ji ne‘leyna qedem derxe di ‘işqa cewheranê da

Dilo îrnî meke gazî cewaba lenteranê da

*Ji ber fikrê di **Mûsaê** dilê min **Tûrê Seyna** ye*

2.1.b.8. Suleyman

Suleyman pêxember kurê Dawûd pêxember e. Wekî bavê xwe hem siltan hem jî pêxember bûye. Suleyman Pêxember di Tewratê de wekî siltan tê nîşandan. Li aliyê Şamê jiyaye. Li gorî agahiyên dînî nêzî heşsed salî umir kiriye⁷⁸. Di edebiyata klasîk de sembola seltenet, hêz, mal û milk e. Li bayî, cinan û perendeyan hukum

⁷⁸ Sîrûs Şemîsa, *Ferhengê Telmîhat*. Çapxanê Mîtra, Têhran 1385hş. , r. 319.

kiriye. Di helbestan de Suleyman bi piranî bi peyva Belqis, Sebe, hudhud û Asaf re derbas dibe⁷⁹.

Di dîwana Mela Yasîn de wiha derbas dibe:

(Q.12/8 m.)

Asefê himmet Seba mesken bi textê anî wucûd

Sed şukur îro li textê dil **Suleymanê Selîm**

2.1.c. Kitêbên Pîroz

Xweda bi wesîteya Cebraîl ji hin pêxemberan re kitêb şandine. Yên ku ji wan re kitêb nazil bûne Mûsa, Dawûd, Îsa û Hezretî Mihemmed in. Di helbestên Mela Yasîn de bi tenê navê Quranê bi van peyvên wek Furqan, Qur'an, Qu'rana Kerîm, Hezretî Qur'an, Mushef derbas dibe.

(Q./12 m.)

Dikim pir 'erzê hurmet bo zewatê we mubarek ez

Li **Qu'rana Kerîm** carek binerin hûn dizan îro

(Q.9/1 m.)

Selamê şu'le nûranî ji **hezret ayê Qu'ranî**

Li ser te xeml û nîşan î bigir xemlê ji **Qur'anî**

(Taş. 2/4 bn.)

'Eca'îb heyretê girtim nema 'alem li meydanê

Bi mîr'ata museffa min nezer da xal û nîşanê

Ji îdrakê muccered bûm ji ber wê dew' û lem'anê

Çi sûret mezherê sirra nebû ayatê **Furqanê**

Nezer min daye rû weqta ewê zulfa xwe ber ba kir

(Q. 3/20 m.)

⁷⁹ Pala, *h.b.*, r. 411.

Muhemmedî ne em giştik me rehber Hezretî Qu'ran
Kelamê Heq Te'ala menbe'a dîn û îman îro

2.1.d. Çar Xelife

Hezretî Ebû Bekir, 'Umer, 'Usman û 'Elî
Mela Yasîn di helbesteke xwe de cih daye navên her çar xelifeyan. Di dîwanê de bi tenê carekê navên wan derbas dibe.

(Q. 9/ 7 m.)

Selamê bo **Bekir** xwey şan digel '**Umer** '**Elî** '**Usman**
Li te wek cewher û mercan te çû rutbe bi esman î

2.1.e. Keça Hezretî Mihemmed û Pîrekên wî

Di helbestekê de navên Hezretî Fatima, 'Aîşe û Xetîce derbas dibin. Leqeba Hezretî Xetîce "Kubra" ye û ya Hezretî Fatima jî "Zehra" ye.

(Q. 9/4 m.)

Selamê **Fatimê'z- Zehra** di gel wê '**Aîşa Kubra**
Li te wek perdeya xidra mûbarek perde nûranî

2.1.f. Hezretî Mehdî

Di baweriya Şîiyan de îmamê donzdemîn e, windabûyî ye û li benda roja qiyametê ye. Ew dê were û ji erdê kufir û zulmê rake⁸⁰. Di helbestan de wek Sahibê Zeman , Îmamê Zeman jî derbas dibe. Di edebiyata klasîk de yar an jî kesê ku pesnê wî/wê tê dayîn wek Mehdî tê teswîrkirin⁸¹.

(Taş. 2/3 bn)

Di gulzar û gulîstanê nema qedrê gulan êdî

Li cem bilbil dema kir mêze baxê dîlberan hêdî

Gula dehhak ku bişkefte di wê rewza cemalê dî

⁸⁰ Ferit Develioğlu , *Osmanlıca- Türkçe Ansiklopedik Lûgat*, Aydın Yayınları, Ankara 2006, r. 602.

⁸¹ Pala, *h.b.*, r. 301.

Ji bo bilbil zeman bû wek zemanê **Hezretî Mêdî**

Dema werda rûyê dilber dilê 'aşiq bi xwe şa kir

2.1.g. Çar Îmamên Mezheban û Îmamê Rebbanî

Helbestvan di dîwanê de navên çar îmaman û Îmamê Rebbanî wiha bi kar anîne.

(Q.9/8 m.)

Imamê Malik û Nû'man we **Ehmed Şafi'î** erkan

Wekîl û warisê Qu'ran **Imamê Mezn û Rebbanî**

2.1.h. Cin, Horî û Melek

Di helbestan de ji bo xweşikî û rindiya yarê were teswîrkirin, cin, horî, perî, perîzade û melek hatine bikaranîn. Yar hertim dişibe horî, melek û periyar heta ji wan jî xweşiktir tê teswîrkirin. Helbestên ev têgeh tê de derbas dibin li jêr hatine diyarkirin.

(Tes. 6 /1 bn.)

Minnet li me kir Barî Te'ala we bi min da

Bûm peyroyê erbabê hewa xadê bilinda

Der koşê meyxane meya sade ji rinda

Min noşî rema 'işqê **perîzade** li min da

Ku ji ihsan û kerem badeê safî we qemenda

Kir ro li me qendîlê di mişkate bi fenda

(Tx. 4/5 bn.)

Belkî xurbet ke Merîxa ne hes û meşemetê

Keşfê bit tali'ê di nîva şerefa meymenetê

Riqqet û şefqe ku bêtin dilê **horî sifetê**

Belkî dilber ji rûyê 'adilîy û merhemetê

Rehmkî kit bi feqîran we bipirsit gelehê

(Teş. 1/9.bn)

Ji semawatê **melek** têne temaşa **perîyan**
Bibitin mehr û meh şermende ji şewqa zerîyan
Bitezerru' bitezellûl ke fixan û girîyan
Asitannîy û şîbak û kulek û pencerîyan

2.1.i. Cinnet (Bihuşt)

Di helbestan de hin navên cenetan ên wekî 'Edn, Fîrdews, Me'wa, Ridwan derbas dibin.

(X. 10/3 m.)

Cennetu'l-Me'wa cemalê rewzeya 'izz û kemalê
Rûgula kewkeb misal î dil revandî dil ji min

(Teş. 1/12 bn.)

Cenetu'l-Ridwaniyek xonçe ji **Firdewsê** cemal
Gerne şermende biya ez şeref û şewq û şemal
Bi zewalê çi xerez bû şemseya bedrê kemal
Hêviy û tewqe dikin em ji te carek ku vemal
Leyleya da çiyê zulma tu ji ser nûrê zelal
Da xuya bit şeb û ro her du di nîv bircê hîlal
Da ji miska Xetenê *Yusrî* tu bîn ke xet û xal
Ne ji şa'nê te ye ey padîşehê reddê su'al
Lew ku pir şefqe di dêrin kerem û lutf û kemal
Ah ji dest remz û şêrîn wê durr û le'l û guherê

2.1.j. Îqtîbas

Di edebiyata klasîk de ayetên Quranê û hedîs wek îbare an jî wek bêje tên îqtîbaskirin. Bêjeyên serê hedîs û ayetan an navê sûreyan tene bikaranîn. Di helbestên Mela Yasîn de îqtîbas ji ayet û hedîsan hene.

2.1.j.1. Îqtîbasên Ji Ayetan

(Q. 8/4 m.)

Xuya bû sire subhanellezî esra ku dil zanî

سُبْحَانَ الَّذِي أَسْرَى بِعَبْدِهِ لَيْلًا مِنَ الْمَسْجِدِ الْحَرَامِ إِلَى الْمَسْجِدِ الْأَقْصَى الَّذِي بَارَكْنَا حَوْلَهُ لِنُرِيَهُ مِنْ آيَاتِنَا إِنَّهُ هُوَ السَّمِيعُ الْبَصِيرُ⁸².

“ Xwedê ji herkêmasî û pûçiyê pak û berî ye, ew ê ku bendeye xwe (Muhemmed) di şevê de ji Mescid’ul-Heramê (Kebe) bi rêya Mescîdu’ul- Eqsayê ya ku me hawirdora wê pîroz kiriye da ku em nîşanên xwe şanî wî bidin . Bêguman Xwedê her ew e bihîzer û yê binêr.”

(Q. 8/7 m.)

Ji nezma wedduha welleylî rû zulfan bi dil anî

وَالضُّحَى وَاللَّيْلِ إِذَا سَجَى⁸³

“Sond bi danê sibehê, bi şevê gava aram û tarî dibe.”

(Q. 8/ 8m.)

Ku sirra ehse nê teqwîm tecellî kir di wê ew bû

لَقَدْ خَلَقْنَا الْإِنْسَانَ فِي أَحْسَنِ تَقْوِيمٍ⁸⁴

“Bi rastî me însan di şiklê herî rind de afirandiye.”

⁸² Îsra 17/1.

⁸³ Duha 93/1-2.

⁸⁴ Tîn 95/4

(Q. 8/9 m.)

Ela ey ‘endelîbê dil here baxê elem neşreh

أَلَمْ نَشْرَحْ لَكَ صَدْرَكَ⁸⁵

“Erê ma Me singa te (ji bo ehkamên dîn) fireh nekir?”

(Q. 8/10 m.)

Feqed kane ‘ela xulqîn wehwe nûranî

وَإِنَّكَ لَعَلَىٰ خُلُقٍ عَظِيمٍ⁸⁶

“Bi rastî tu li ser exlaqekî mezin î.”

(Msd. 2/2 m.)

Ente ma ursîlte îlla rehmeten lîl ‘alemîn

وَمَا أَرْسَلْنَاكَ إِلَّا رَحْمَةً لِّلْعَالَمِينَ⁸⁷.

“(Hey Muhammed!) me tu şandî bes da ku tu ji heyînan bibî rehmet.”

(Msd. 2/9 m.)

Mî xutûbît tametil kubra fehel mîn mudekîr

فَإِذَا جَاءَتِ الطَّامَّةُ الْكُبْرَىٰ⁸⁸

وَلَقَدْ يَسَّرْنَا الْقُرْآنَ لِلذِّكْرِ فَهَلْ مِن مُّذَكِّرٍ⁸⁹

“Kaseyên tijî mey hene.”

⁸⁵ İnşîrah 94/1.

⁸⁶ Qelem 68/4.

⁸⁷ Enbiya 21/107.

⁸⁸ Zariyat 51/34.

⁸⁹ Qemer 54/22.

“Sond be, Me quran ji bo şîretgirtinê hêsan kiriye. Vêja ma ka ew ê ku bifikire û jê şîret bigire?”

(Q. 6/12 m.)

Ey dilê jar û şikestî bilbilê roja elest î

أَلَسْتُ بِرَبِّكُمْ⁹⁰

“(Resûlê min) Dema Xwedayê te ji pişta ademiyan zuriyata wan girt û ew xwe bi xwe li ser hev kirine şahid (û ji wan re got) ma ez ne Xwedayê we me? Hemûyan got: Belê em şahidiyê didin (ku tu Xwedayê me yî). Ev şahdeyî ji bo vê ye, da ku roja qiyametê hûn nebêjin em ji vê bê hay bûn.”

(Q. 6/15 m.)

Qabê qewseyna meqam î rehmeta ‘alem tamam î

ثُمَّ دَنَا فَتَدَلَّى * فَكَانَ قَابَ قَوْسَيْنِ أَوْ أَدْنَى⁹¹

“Paşî ew nêzî (Pêxember) bû, vêca hin bi hin berjêr bû. Bi qasî di kevanan an jî hê jê kêmtir nezîkê wî bû.”

(Tx. 1/3 m.)

Dilo irnî meke gazî cewaba lenteranê da

(Q.12/4 m.)

Turê Sina dil dibarin lê ku enwarê Ilah

Ateşê Wade’l-Muqeddes dî bi dil fanî Selîm

⁹⁰ ‘Eraf 7/172.

⁹¹ Necm 53/9.

وَلَمَّا جَاءَ مُوسَى لِمِيقَاتِنَا وَكَلَّمَهُ رَبُّهُ قَالَ رَبِّ أَرِنِي أَنظُرْ إِلَيْكَ قَالَ لَن نَرَايَ وَلَكِنِ انظُرْ إِلَى الْجَبَلِ فَإِنِ اسْتَقَرَّ
مَكَانَهُ فَسَوْفَ نَرَايَ فَلَمَّا تَجَلَّى رَبُّهُ لِلْجَبَلِ جَعَلَهُ دَكًّا وَخَرَّ مُوسَى صَعِقًا فَلَمَّا أَفَاقَ قَالَ سُبْحَانَكَ تُبْتُ إِلَيْكَ وَأَنَا أَوَّلُ
الْمُؤْمِنِينَ⁹²

إِنِّي أَنَا رَبُّكَ فَاخْلَعْ نَعْلَيْكَ إِنَّكَ بِالْوَادِ الْمُقَدَّسِ طُوًى⁹³

Çi dema Mûsa ji bo civanê me hat û Xwedayê wî pê re peyivî. (Mûsa) got:
“Xwedayê min! Xwe nîşanî min bide da ez te bibînim.” (Xwedê) got: “ Bêguman
tu yê min nebînî, belê berê xwe bide çiyê, êdî eger li cihê xwe rawestiya hingî tu yê
min bibînî!” Vêca dema Xwedayê wî şewqa xwe da çiyê, çiya bû parçe parçe û bi
erdê re mîsewa bû. Mûsa jî bêhiş ket ser erdê hay ji xwe nema. Çidema ku bi hişê
xwe ve hat, got: Ez te ji hemû kêmasiyan pak didêrim, ez li ber te tobe dikim û ez
pêşikê bawermendan im.”

(Q.12/6 m.)

Sirrê sarî feyzê carî sirrê mala te‘lemûn

قَالَ إِنِّي أَنَا رَبُّكَ فَاخْلَعْ نَعْلَيْكَ إِنَّكَ بِالْوَادِ الْمُقَدَّسِ طُوًى⁹⁴

“Bibîne gava Xwedayê te ji melayîketan re got: “ Bi rastî ez ê li ser erdê
xelîfeyekî (ku yek bikeve şûna yê din) biafirînim. “(Melayîketan) got: “ Ma tu yê
mexlûqên ku li ser rûyê erdê fesadiyê bikin û xwînê birêjin, biafirînî?” Hal ev e ku
hemdê te dikin û Te pak didêrin. (Xwedê) got: “Tiştê ku hûn pê nizanin, ez
dixanim.”

(Ms. 1/5 bn.)

Hazîhî Cennatû ‘Ednîn fedxulûha xalîdîn

جَنَّاتٍ عَدْنٍ الَّتِي وَعَدَ الرَّحْمَنُ عِبَادَهُ بِالْغَيْبِ إِنَّهُ كَانَ وَعْدُهُ مَأْتِيًا⁹⁵

⁹² E’raf 7/143.

⁹³ Taha 20/12.

⁹⁴ Beqere 1/30.

⁹⁵ Meryem 19/61.

“Ew ên ku xwe ji (ezabê) Rebbê xwe parastine, bir bi bir ber bihuştê Ve têne ajotin, dema ku têne berderê wê, dergêhên wê ji wan re tên vekirin, notirvanên wê ji wan re wiha dibêjin: Silav li ser we be! Hû xweş bijîn vêja bikevin bihuştê û ebedî tê de bimînin. (Ew) Bihuştên ‘Ednê (lêmayînê) ne ku Xwedayê rehman di xeybê de peymanan wan ji bendeyên xwe re daye û wan bêyî ku bibînin bawerî pê aniye.”

2.1.j.2. Îqtîbasên ji Hedîsan

(Q. 8/3 m.)

Ji kenza kuntû kenzen ger xeberdar î tu ey sadî

كنت كنزاً لا أعرف، فأحببت أن أعرف فخلقت خلقاً فعرفتهم بي فعرفوني " موضوع لا أصل له⁹⁶

Ez gencîneyek veşartî bûm, min xwest ez bêm naskirin; ji ber vê yekê min însan afirand û ez bi vê hatim naskirinê.

(Q. 8/3 m.)

Dizanî me‘neya lewlake lema tu bi îm‘an î

لولاك لما خلقت الأفلاك⁹⁷

Ey hebîbê min tu nebûnayî min kaînatê nediafirand!

(Msd. 1/4 bn.)

Mezherê îza merertum bî rîyazîl cenneh

قَالَ رَسُولُ اللَّهِ صَلَّى اللَّهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمَ: " إِذَا مَرَرْتُمْ بِرِيَاضِ الْجَنَّةِ فَارْتَعُوا " ، قَالُوا : يَا رَسُولَ اللَّهِ وَمَا رِيَاضُ الْجَنَّةِ ؟ قَالَ : " مَجَالِسُ الذِّكْرِ " ⁹⁸

⁹⁶ El-‘Eclûnî, Îsma‘îl bîn Muhammed, *Keşfu’l-Xefâi we Muzilû’l-Îlbas, Daru’l- ‘Îhayaît-turasîl ‘Erebî*, Beyrût 1351, c. 2, 132.

⁹⁷ Ebû ‘Ebdullah bîn Hembel eş-Şeybanî, *El-Mesned*, Teb’ ‘Alemu’l Kutûb, Beyrût, c.3, r. 150.

Hezretî Enes rîwayet kiriye ku Hezretî Muhammed wiha gotiye: “ Dema ku hûn çûn nav bexçên bihuştê jê bixwin, Yekî ji pêxember pirsî bexçên bihuştê çi ne, Resûlullah wiha got:” Ew helqeyên zikrê ne.”

2.2. Têgehên Tesewifî

Di edebiyata klasîk de têgeh û îstîlahên tesewifî cihekî girîng digirin û helbestvanên klasîk bi piranî wan bi kar tînin. Mela Yasîn di helbestên xwe de ji têgehên tesewifî gelekî îstîfade kiriye. Di helbestên Mela Yasîn de ev têgeh wekî mey, meyxane, rind, sulûk, sûfî, salik, dêra xerab, dinya, zahidê kamil, ‘alema lahût û nasût, dunya û ‘uqba derbas dibin.

Sofî û rind di helbestên tesewifî de wekî mezmûn tînin bikaranîn. Sofî di edebiyata klasîk de weke tîpekî dertê holê ku tamamê emelên wî zahirî ne. Nimêj û îbadetên wî li ber çavan in. Cihê diçiyê mizgeft û mescîd in. Di hin helbestan de jî sofî wek zahid derbas dibe. Rind jî dijberî sofî, cihê wî meyxane ye û karê wî şerab e⁹⁹. Sofî ji ber ku rewş û halê rindan fam nake her tim wan şermezar dike. Tinaz û henekên xwe bi wan dike. Dilê sofî ne paqij e, ew bi tenê li şikil û zahir dinêre.

Di tesewifê de saqî tê wateya murşîdê kamil, mey an jî şerab evîna îlahî ye û saqî wê pêşkêşî murîdan dike. Meyxane an jî xerabat tekiye ye¹⁰⁰.

(X. 16/7 m.)

Dixwazî tu eya **sofî** dilê reş ger te rewşen bî

Here **meyxaneya saqî** ji bo te camê qerqef de

⁹⁸ Et-Tirmizî, Muhammed bîn Îsa, *Camî’u’l- Tirmizî*, (amd. Ehmed Muhammed Şakir), Darû İhyaî’-t-turasîl ‘Erebî, Beyrût, c. 5, r. 553.

⁹⁹ Ahmet Talat Onayı, (haz. Cemal Kurnaz) *Açıklamalı divan Şiiri Sözlüğü :Eski Türk Edebiyatında Mazmûnlar ve İzahı*, H Yayınları, İstanbul 2009, s. 498.

¹⁰⁰ Ethem Cebecioğlu, *Tasavvuf Terimleri ve deyimleri Sözlüğü*, Ağaç kitabevi Yayınları, İstanbul 2009, s. 435.

(X. 14/1 m.)

Te bi xewf û bi hezer dil ji me melhûfê kirin
Lew bi qeydê esefa dil te me wek **sofî** kirin

(Tes. 1/6 bn)

Minnet li me kir Barî Te‘ala we bi min da
Bûm peyroyê erbabê hewa xadê bilinda
Der koşê **meyxane meya** sade ji **rinda**
Min noşî rema ‘işqê perîzade li min da
Ku ji ihsan û kerem badeê safî we qemenda
Kir ro li me qendîlê di mişkatê bi fenda

(Q. 7/9 m.)

Ku bû helq e şeva halek li bedrê **sûfî û salik**
Nema hêş wan nebûn malik ji bo husna xwe wê anê

Dinya di helbestên tesewîfî de her tiştên ku mirov ji Xwedê dût dixin e. Hin wateyên wê yên din jî ev in: Cihê imtîhanê, zeviya axiretê (dunyaya din) û dunyaya derewîn¹⁰¹.

(Teş. 1/6 bn.)

Meç ser cîfeê kelban li te din pence û lext
Bi divê **dêra xerab** der qefesê razî bi lext
Da bibînî senema min ne bikî xwe bidî bext
Bikî telxîsê cewaba me ji vê muxteserê

(Q. 7/13 m.)

Rehîq û kewsera lêva gula ya ser gul û siva
Hewa ‘uzrî ku da çêva nema **dunya** li meydanê

¹⁰¹ H.b., r. 174.

(Q. 8/55 m.)

Bi cahê **zahidê kamil** bi yumna ‘alimê ‘amil

Bi wan zatê ku bûn wasil bi peyxember bi Qur’anî

Lahût ji alema îlahî re tê gotin¹⁰². Ev peyv di erebî de tê wateya ilm û zanistiya ku behsa Xwedê dike¹⁰³. **Nasût**, peyvek erebî ye û tê wateya tebîeta însan, însaniyet û (mirovatî) û hwd. Nasût, di wateya lahût e yanî alema şehadetê an jî dinya ye¹⁰⁴. Di helbestên Mela Yasîn de alema lahût û nasût wiha derbas dibe:

(Msd. 2/5 bn.)

Ey çiraxê ‘**alema lahût û nasût û sera**

Rewşena dunya û ‘uqba rewneqa her du sera

Me‘neya îsmê tu lakîn herfî kullîn macera

Hem tu yî rehmet û merhumen bi te cumle wera

El eman ya Seyyîde’l-kewneynî ya xeyre’l-wera

El meded şahê du kewna Ke‘baya peyxembera

Terîqet di erebî de tê wateya rê. Terîqet wek têgehêk tesewîfî, bi terbiyeya şêx an jî murşîdekî û bi rê û rêbazên diyar ku mirov pê bigihêje Xwedê ye¹⁰⁵.

Di helbestên Mela Yasîn de peyv û têgehên derbareyê terîqetê de derbas dibin hene. Di helbestan de bi taybetî navê terîqeta Neqşebendî û murşîd û xelîfeyên wê derbas dibin. Wek navên taybet Şahê Neqşî, Şahê Buxara, Xocê Sanî Selîm, Xewsê E‘zem, Şahê Geylanî, Xewsê Geylanî di helbestan de peyda dibin.

(Q. 12/5 m.)

Mezherê sirra hedîsa kuntû kenzen mexfîya

Bû yeqîn şahê **Hezanê Xocê Sanî Selîm**

¹⁰² H.b., r. 392.

¹⁰³ Mehmet Kanar , *Osmanlı Türkçesi Sözlüğü*, Say Yayınları, İstanbul 2011, s.

¹⁰⁴ Cebecioğlu, h.b., r. 465.

¹⁰⁵ H.b., r. 627.

(Msd. 1/8 bn .)

Ger dixwazî mesleka heqq û heqîqet Yusriya
Da nebî roja heşir ruswa û şermî rû siya
Bigre zeyla Şahê Neqşî şu'ledarê ewliya
Key tera yewme't- tunadî nûrê şahe'l-enbiya
El eman **Şahê Buxara** 'alî **Şahê Neqşebend**
Sed meded pîrê terîqet ez li dergahê te bend

2.3. Navên Cihên Taybet

2.3.a. Welat, Bajar û Gund

Di dîwanê de Îran, Diyarbekir, Farqîn, Vîze, Mêrdîn, Gundik, Hezan wek navên cihan ên taybet derbas dibin. Farqîn navçeya Diyarbekir , Vîze ya Kirklareliyê ye. Hezan jî gundekî Licê ye ku Şêx Muhemmed Selîm (W. 1905) ji wir e.

(Qt. 1/3 m.)

Qasidê min balî **Vîze** her tu yî baê Seba
Pirsike halê 'ezîzê min tu zû bîne cewab

(Qt. 1/4 m.)

Ez bi **Gundik** hem bi **Farqîn û Diyarbekir** diçim
Bejn û bala tey zerî nabit xûba ey nûrê çab
Gundik, di nava gel de wek Gundikê Hecî Îbrahîm tê zanîn. Mela Yasîn li vir muderîstî kiriye.

(Q. 12/5 m.)

Mezherê sirra hedîsa kuntû kenzen mexfîya
Bû yeqîn şahê **Hezanê** Xoceê Sanî Selîm

2.3.b. Çem, Çiya, Newal (Wadî)

Di edebiyata klasîk de derya û çem simbolên jiyanê ne. Di hin cihan de hêstirên çavên aşiq bi Nîl û Ceyhûnê tîn şibandin.

(X. 3/7 m.)

Ji tîrê nuqteya nûnê ku pir rêhtî ji dil xûnê
Ke **Nîl** in ew ke **Ceyhûn** in ela heyhate neccatî

Wek cihekî pîroz Tûrî Sîna di helbestan de derbas dibe. Bi piranî bi navê Mûsa pêxember re têkildar e. Newala Eymen jî newaleke li çiyayê Tûr e.

(Q. 7/5 m.)

Zulâm berda bi ser nûrê giha ser camê ferfûrê
Ji **Wadê Eymena Tûrê** veda pir zew' û lem'anê

2.3.c. Cihên Pîroz

Di dîwana Mela Yasîn de cihên pîroz wek Ke'be, 'Erefat, Sefa û Merwe, Çiyayê Tûr, Bihuşta Me'wa, Fîrdews û 'Edin derbas dibin. Mela Yasîn di hin helbestan de rûyê yarê şibandiye Ke'beyê. Rûyê yarê wek hundirê Ke'beyê spî û bedew e, por û guliyên wê jî wek perdeya Ke'beyê reş in û bi ser rûyê wê re berdayî ne. Yar, dil û canê aşiq bi çav, por, birû û xalên xwe talan dike. Xal li rûye yarê bi reşiya xwe wekî leşkerê Hebeş e. Xal ji bo ku rûyê yarê talan dike aşiq wê ji xwe re wekî reqîb dihesibîne¹⁰⁶.

(Tx. 4/14 bn.)

Tu li dor **Ke'beê** rû misk û zabadê bireşîn
Hebeşan perde tewafê sef bi sef lê di meşîn
Di wuqûfa 'Erefatê dil û can tev herişîn
Xûbî û dîlberîy û naz û telettuf bineşîn

¹⁰⁶Hüseyin Ayhan, *Nesîmi Divanı*, Akçağ Yayınları, Ankara 1990 , r. 219.

Xesre û padişehanî û Xudana cebehê

(Tx. 4/8 bn.)

Bereda cewr û cefa narê hewa navemirit

Bi Sefa û Merwe tewafê hubbê canan bigirit

Hubbê safî biwuqûfa ‘Erefê nacebirit

Hecer ‘eswed biwerit destê ziyadet bigirit

Nezrê min bit bikerem xwasî terîqa Mekehê

2.4. Yar û Evîndar

Di helbestên Mela Yasîn de aşîq û meşûq an jî bi gotineke din yar û evîndar wekî du cure însan derdikevine pêşberê me.

2.4.a. Yar (Me‘şûq)

Di helbestên klasîk de şexsê herî girîng yar e. Yar bi unsûren xweşîkiyê bala mirov dikişîne. Di helbestên Mela Yasîn de bedewî û rindiya yarê bi peyvên cûrbicûr hatine diyarkirin. Por û zulfên wê wek zûbad, misk, ‘enber, kafûr, ‘ûd û mawerê bihnê didin û evîndarî serxweş dikin. Lêvên wê jî bi van peyvên hatine teswîrkirin: kewser, aba heyatê, zemzem, fêkiyê Tûba, şeraba taze, rumman, şehd, qend, şeker, ‘esel, mey, şerab, hewzê kewserê, lebê le‘l, lêvê helwa.

(Tt. 1 / 4 bn.)

Xettê kafûrî li ser bedrê ku neqqaşê nîhad

Herf bi herfan lê raşandî **‘enber û misk û zûbad**

Ger bixwenda wer bidîta sîrrê herfan qewmê ‘Ad

Dê biderkefta bîlaşek ez ducî **kufir û ‘înad**

Min li ser bedra munîr mektûb dîye neqşê sîwad

Yek bi yek anî du nûnan xettê reyhanî du sad

Hadîrê min secde bir lew xerqê xûnê bû fuad

Ber derê baxê wisalêş hatêfî avazê dad

Hazihî cennatû 'ednîn fedxulûha xalidîn

Di vê bendê de rûyê yarê wekî bedrê ye û xal û nuqtayên li ser jî wek kafûrê ne, kafûr giyayekî ku bihna wî xweş û bihêz e,¹⁰⁷ kafûr li ser rûyê wê herfan bi misk û enberê dirêje.

Helbestvan di helbestekê de lêvên yarê ji bo cîger û dilê tî dişibîne şeraba taze.

(Q. 8/ 6 m.)

Xezaya rûh û can û dil şemal û ruhniya çavan

Ji bo cerg û dilê tî ew **şeraba taze rumman î**

Di malikeke din de jî yarê bi bejn û bala xwe ya wek serwiyê, bi lêvên xwe yên wek şeker û helawê sed bela dane aşiq û sed hesret xistine dilê wî.

(Q. 9/22 m.)

Bi qedd û qameta selwa bi **lêvê şekkerî û helwa**

Bi 'aşik daye sed belwa ku sed hesret bi dil anî

Ji vê malikê jî xuya ye ku dilê aşiq hertim xwestekiyê ji yarê dike. Aşiq bi hesreta zulfên bi misk û mawer û lêvên wek ava kewserê ye.

(X. 1/16 m.)

Bûya ji **misk û mawerê** cama zabad û 'enberê

Ava ji **hewza kewserê** her dem ji te xwestaye dil

(Q .12/13 m.)

Da binûşin mey ji fincana **şeraba nazîdar**

Kewser û aba heyatê nehrê heywanê Selîm

¹⁰⁷Develioğlu, *h.b.*, r. 481.

Peyvên wek ûd, enber, miska Xeten dema bi hev re tèn bikaranîn meqsed ji wan zulfên yarê ne. Êd, giyayek e li Çîn û Hindistanê şîn dibe. Bi bihna xwe ya xweş tê zanîn. Dema tê şewitandin bihneke xweş jê tê.¹⁰⁸ Di helbestan de zulfên yarê bi reng û bihna xwe dişibin ûdê. Xeten an jî Xoten, li bakurê Çînê navê herêmekê ye. Ev herêm bi xezalên miskê navdar e. Zemanê berê taciran ji bo tîcaretê ji wir misk kiriye û biriye welatên din firotiye. Ji ber vê yekê miska Xetenê navdar e. Di helbestên klasîk de têtên zulfên yarê bi reşbûn û bihna xwe bi miska Xetenê tèn şibandin¹⁰⁹. Birûyên yarê jî di helbestan de wek mîhrabê ne û aşiq jê re diçe secdeyê.

(Tx. 3/12 bn.)

Ji gulaba serê **zulfa** te şemek bête wucûdê
Bi deh sed te'ne li miska **Xetenê** 'enber û 'ûdê
Tu yî meqsed û murada me ji **mîhrab û sicûdê**
Ger bibim ber te sucûdê di dema keşf û şihûdê
Me li dil dî bidirit pertûy û nûra qedemê

(Q. 7/1 m.)

Ela ey nazika leb le'1 e **qed selwaê yaban î**
Weyaxud nêrgiza yek ta li ser **miska Teter anî**

2.4.b. Evîndar ('Aşiq)

Di helbestên klasîk de evîndar wekî leheng derdikeve pêş. Hertim li pey yarê ye. Ji bo ku ew û yarê bigihêjin hev li hemberê her cûre derd û belayê tebat dike. Hertim di rewşeke melankolîk û xemgîn de ye. Lê belê dîsa ew bi vê rewşê kêfxweş e. Aşiq di helbestan de bi peyvên wek bilbil, endelîb, qumrî û seh derbas dibe.

(X. 1/9 m)

Ne ji abê çeşmê **bilbilan** pêta ciger da **sorgulan**
Ne ji atêşê jerg û dila **sorgul** xerîqê maye dil

¹⁰⁸ Huseyn Enverî ,*Ferhengê Fêşordeê Soxen*, Çapxaneê Meharet 1385, r. 1582.

¹⁰⁹ Pala, *h.b.*, r.197.

(X. 1/8 m.)

Çûm **rewzeya** husna hebîb min dî li wê sed ‘**endelîb**
Ser **sorgulan** dem‘ û sebîb pir rêhtibûn pêt daye dil

Di vê benda jêrîn de bi awayekî zelal diyar e. Evîndar tevî cerg û birînên xwe jî kêfxweş e. Ev jî ji ber ku sedema nexweşiyên wî yar bi xwe ye.

(Tx. 3/11 bn.)

Mûyekî ez ji te nadim bi du sed ‘izzet û Zîna
Ku bi hukmê **te xweş im ez tevê van cerh û birîna**
Ji te ra ferz e îta‘et me di her lehze û hîna
Secde bin ber te rîwaye di hemî mezhûb û dîna
Kî dibit mişrik û kafîr ji wê şêrîn û femê

2.4.c. Teswîrên Xweşikiyê

Li gorî tesewifê xweşikiya rasteqîn a Xwedê ye. Di helbestên Mela Yasîn de unsûren xweşikiya rûyê yarê bi husn û cemal, mushaf, Ke‘be, bedir bi peyvên hwd. hatine îfadekirin.

Rûyê yarê wekî bedrê ye û zulfên wê jî wek du marên reş xwe pê de berdane xwar.

(X. 13/1 m.)

Du reşmaran li dor **bedra munewwer** dager û helqe
Di meydana qitalê wan li min dil kir du sed felq e

(Q. 12/10 m.)

Mushefa husna muqeddes **xal û nişanê di hûr**
Min nexwendî sed esef ser xal û nişanê Selîm

2.5. Rewşên Evînê

Di dîwana Mela Yasîn de rewşên evînê gelek in. Têgehên bi vê sedemê hatine bikaranîn ev in: Hiş û 'eqil winda ye, kul, hesret, derd, feryad, fixan, wax, eywax, kerb, şîn, ah û nal, elem, miskîn, xemgîn, ax, ah û keser, girî, zarî, mehzûn, jar, xem, êş û elem.

Di helbestên klasîk de aşîq feryad dike û dinale. Hertim xemgîn e, carinan jî ji evînê serxweş e.

Mînak ji helbestên ku ev rewş di wan de derbas dibin :

(Tx. 1/1 bn.)

Sena berqa tecellaê li can û dil 'ekis daye
Li ser şem'ê sifet perwane min zû can û dil daye
Ji zewqa badeya camê **hiş û 'eqlê** me wundaye
Ji neş'a badeya kasê dilê mecrûhê şeyda ye
Ji şewqa badeya saqî demîr û dil mucella ye

(Tx. 2/2 bn)

Şerh û halê me eda kiriye sukûtê ne ku deng
Kull û derd û xemê 'işqa zeriya keş e ji reng
Me cêger şubhetê barûd e li ser pêt û pereng
Her bi mîzan direşînin cegerê tîr û xedeng
Ji neseq sa 'îq e me'j qewsê hilalê şeb û roz

(Tes. 1/8 bn.)

Gulzarê cemala te ji bilbil ra herem bê
Hez min **xemê hubba** te ne dînar û derem bê
Bilbil sifet im ez tu gula baxê Irem bê
Misbahê cemala te di qendîlê herem bê
Dil min bi hewaye te be yafî' ku herem bê
Der heq me esîran tu bi ihsan û kerem bê

*Cana tu yî min can gulê bê xarê kerem bê
Minnet ku ne wek bilbilê mihnet 'ebes im ez*

2.6. Tiştên Siruştî

Di edebiyata klasîk de tiştên siruştî bi piranî enasirê erbe'e (çar unsûr) yanî ax, av, agir û hewa derbas dibin. Ev herçar unsûr di çêbûna însan de cihekî girîng digirin û xisletên însên jî ji wan pêk tên. Ev unsûr, heryek ji wan xwediyê taybetmendiyeke xas e.

Di helbestên Mela Yasîn de çar unsûr hatine bikaranîn. Çend malikên ku ev peyv di wan de derbas dibin ev in :

(Q. 6/17 m.)

Pir kemal û pir cemal î tu di dil şewq û şemal î
Menbe'a **ava** zelal î ya imamel murselîn

(Q. 9/24 m.)

Te bes ey hor û mumtazê ku sed **agir** te da xazê
Ne bes ey xob û şehbazê ji dil rakir te **dûxanê**

(X. 3/5 m.)

Bi wan nûnên li ser sadan di dil da **agirek** dadan
Fesaret zumretu'l-'uşaqqî helka beyne emwatî

2.7. Dem

Di helbestên Mela Yasîn de dem bi peyvan hatine bikaranîn: Meh, sal, sa'et, gav, her an û lehze, zeman, havîn, payîz, zivistan, bihar, roja heşrê, şev û roj, sibe, her gav, gav û hîn, her dem, roja elest, îsal. Di helbestan de ev peyv û têgeh bi piranî ji bo rewşa hesreta 'aşiq li hemberê me'sûqê (yarê) were diyarkirin hatine bikaranîn. Aşiq her lehzeya ku ji yara xwe dût e, xemê dixwe, feryad dike, dinale û hêstirên bi xwîn dirêje.

Çend mînak ji malikên ku ev têgeh di wan de derbas dibin ev in:

(X. 1/13 m.)

Ey rewzeya husn û cemal ser çeşmeya nûra zelal
Borîn li dil pir **mah û sal** hêj bê hez û bê paye dil

(X. 2/3 m.)

Ji husn û rewneqê şeq bûye ismê te hebîba min
Ku lew her **sa'et û weqtan** biye werdê zubanê min

(15/1)

Her lehze kişandî me divê dêrê xerab e
Pir cewr û cefa û elem û derd û 'ezab e

(Tes. 1/4 bn.)

Tîr dan ji hilalê duşebî lew ku dikalim
Her gav û si'et xûnê ji çeşman vedimalim

Di vê malika jêrîn de evîna aşîqê jar û perîşan ji roja Xwedê hemû rih
çêkirine ve dest pê dike.

(Q. 6/12 m.)

Ey dilê jar û şikest î bilbilê **roja elestî**
Lew te baxê gul dixwestî ya Medare'l-'alemîn

2.8. Ajal û Perende (Heywan)

Di edebiyata klasîk de helbestvan hest û ramanên xwe bi riyên cûrbicûr nîşan didin. Hunerên edebî ji rêbazên bingehîn in ku helbestvan hest û ramanên xwe bi wan tînin ziman. Helbestvanên klasîk bi gelemperî dema hunera teşbîhê (Şibandin) bi kar tînin ji ajal û perendeyan sûdê werdigirin.

Di helbestên Mela Yasîn de gelek navên ajal û perendeyan derbas dibin. Navên ajalên ku em di helbestên wî de dibînin ev in: Bilbil, 'enqa, semek (masî), şehmar (şahmaran), mar, kewa gozel, dûpişk, kurmê qozê, ker, gur, seh (kelb), pez,

çêlek, mî, gene, zîlo, mêş û mekes, mirîşk, şamî, xezal, kûsî, bizin, hesp, perwane û xumrî (qumrî).

Di helbestan de hin ajal bi taybetmendiye xwe yê xirab û neyînî hatine bikaranîn, hin ji wan jî bi xweşikî û bi taybetmendiye xwe yê erênî derketine pêş. Ajalên wek gur, ker, kûsî, dûpişk, gene, zîlo û kurm di hîcwiyeyan de ji bo şibandineke neyînî hatine bikaranîn.

Mela Yasîn di mesnewiya xwe de ku wekî hîcwiye nivîsiye şêxên sexte rexne dike û wan dişibîne gur, gene û zîloyan. Mirîdên gêj, kerr û xê jî şibandine ker, seh û miyan. Malikên ku navên van ajalan di wan de derbas dibin ev in:

(Ms.1/13 m.)

Bi wê kêf û zewqê tinaz û kenê
Ji wan kê m û xûn mêtî şubhê **genê**

(Ms.11/14 m.)

Heçî kor û gêjan heçî ker û xê
Çû **zîlo** damarê wan xûn dimêt

(Ms.1/18 m.)

Çû weqta **kerê gur** dî jê re zirî
Gurê dev bi xûn hat ji hev pincirî

(Taş.2/8 bn.)

Di vê dêrê xerab ew **mar û dûpişkan** dikin ber hev
Çû **kurmê qoze** pêcan e li xwe qoze nema jê rev

Di helbestan de perendeyên bi aşiq û yarê hatine şibandin ev in: kewa gozel, qumrî (xumrî) û şamaran ji bo yarê, bilbil û perwane jî ji bo ‘aşiq in. Malikên ku navên van perendeyan di wan de derbas dibin li jê in:

(X. 1/21 m.)

Wan lef û zulf û **xumriya** wan xal û nişanê siya
Girtin ji te dil Yusrîya îro li min wendaye dil

(X.1/8 m.)

Wan rû-perîyy û xed-gula pir derd û afat û bela
Da **'endefîb û bilbila** lew wan bi şewk û xar e dil

(X.15/7 m.)

Xweş hat **kewê gozel** me bi şahîn û fereh bû
Şahîn qezaê ji xwe ra bir bi hewa be

(X.16/10 m.)

Nebit mecrûhê 'işqa wê perî reng e sifet horî
Sifet **perwane** perwazê nedit şem'ê di nîv şev de

Lêvên yarê wek şekir û helawê têne teswîrkirin, xala li ber lêva wê jî wekî
mêşê ye¹¹⁰.

(Q. 2/3 m.)

Şeker û şehd û gulabê tu me can **mêş û mekes**
Ji şeraba 'eselê nake sebir naçe helek

2.9. Riwet (Nebat)

2.9.a. Gul û Kulîlk

Di edebiyata klasîk de mezmûn û motîfên ji bo bedewî û xweşikiya yarê tên bikaranîn gelek in. Hin ji wan jî gul û kulîlk in. Devê yarê wek xonçe, rûyê wê wekî gulê, bejna wê wekî reyhanê, porê wê wekî sumbulê hatiye teswîrkirin. Di helbestên Mela Yasîn de nebatên ku navên wan derbas dibin ev in: Reyhan, gul, xonçe, werd, simbil (sunbul, sumbul), filfil, çiçek, xar, sosin, nesrîn, binefş, nêrgiz, lale.

¹¹⁰ Filiz Kılıç, *Şahî Hayatı ve Divanı*, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara 2000, r. 197.

Pênaseya hin kulîlkan û çend mînak ji malikên ku gul û kulîlk di wan de derbas dibin ev in:

Xonçe ji gula hêja nebuşkuviye an jî venebûye re tê gotin. Di edebiyata klasîk de dev û lêvên yarê biçûk û bi rengê xwe jî sor wekî xonçeyê ne. Kenîna xonçeyê tê wateya vebûna wê. Dîsa di helbestên klasîk de xonçeya nevebûyî wek mirovekî ku razên xwe diyar nake û vedişêre¹¹¹.

(Q.12/9 m.)

Der tebessum xweş dirêjît **xonçe leb qend û nebat**

Pir dibarin **lu'lu û yaqût** û mercanê Selîm

Reyhan, di edebiyata klasîk de bi rengê xwe yê tarî, bi bihn û şikilê xwe dişibe xala li ser rûyê yarê. Yek ji unsûrên biharê ya herî berbiçav reyhan e¹¹².

(Q.2/7 m.)

Wekî yek takî ji **reyhanê** 'uzarê te zirav

Bû şecî dil bi wucûdê we bedel bûye pelek

Simbil, di edebiyata klasîk de bi por û guliyên yarê ve têkildar e. Navê vê kulîlkê di helbestan de gelek caran tê bikaranîn. Simbil bi şikil û bihna xwe dişibe porê evîndarê.

(X.7/4 m.)

Wê xed gulê **çîn sunbulê** xal filfilê rû meş'elê

Qelb û dilê min wek qelê heland belê rakir duxan

Lale, di helbesta klasîk de bi rengê xwe yê sor wekî dêmên yarê ye û hêstira aşiq e. Xala reş a di nava laleyê de jî birîna dilê aşiq e. Ji vê birînê her gav xwîn tê û ev jî sedema xemgîniya aşiq e¹¹³.

¹¹¹ Pala, *h.b.*, r. 168.

¹¹² *H.b.*, r. 376.

¹¹³ *H.b.*, r. 284.

(Teş.1/4 bn.)

Rewzeya husn û cemala Yûsufê dewr û zeman

Dibe yek **lale** ji gulzarê kemala te cuwan

Şerhê ewsafê cemala te kecatê reqeman

Ji mehala ne ku bêtin reqemê şerh û beyan

2.9.b. Dar û Ber

Di helbestên Mela Yasîn de dar û berên ku navên wan derbas dibin ev in:

Serwî, gulnar, dara sêvê, dara Tûbayê, mişmiş, dara zeqûmê, dar, şax û gulî.

Bejna yarê bi piranî bi serwî û dara Tûbayê tê şibandin.

Di helbesta klasîk de dara herî zêde navê wê derbas dibe serwî ye. Bejn û bala yarê wekî serwiyê ye.¹¹⁴ Taybetmendiya wê ku hertim şîn e û li teniştê av û çeman e. Di helbestên Mela Yasîn de wek selwa hatiye bikaranîn.

(Msl.1/3 bn.)

Dixum sondê bi xala te bi **selwa bejn û bala** te

Bi wê husn û cemala te nedî kes min bi nala te

Derê carek ji perdê da bibînim bejn û balaê

Dara Tûbayê, di helbestên klasîk de bi bilindbûn û siya xwe dişibe bejna yarê. Ev dareke pîroz e û li Sîdretul Muntehayê ye. Guliyên wê bi xwar ve şindilîne. Fêkiyên wê cûrbicûr e. Siya wê jî daye ser temamê buhiştê¹¹⁵.

(Q.9/39 m.)

Ela ey serwerê xûba ela ey **fêkiyê Tûba**

Neda min dil tu mehbûba ji xeyrê te gulê can î

¹¹⁴ *H.b.*, r. 400.

¹¹⁵ *H.b.*, r. 458.

2.10. Unsûrên Stêrnasî (Astirolojî)

Di edebiyata klasîk de unsûrên stêrnasiyê ji bo evîna îlahî û tesewifê têne bikaranîn. Di helbestên Mela Yasîn de peyvên ku têkildarê stêrnasiyê ne ev in: Meh, Xurşîd, Felek, Kewkeb, Seyare, Şems, Birca Esed, Misbah, Bedir, Merîx, Mihr, Sema, Asiman, Gerdûn, Kewn, ‘Eqreb, Hîv û ro û Nucûm.

(X. 3/14 m.)

Me der **şeb** dî **siba** ‘îdê li min kir ruhnî **xurşîdê**
Keenne **şemse** qed daret îla nisfî semawatî

(X.2/7 m.)

Nucûmê kewkebê çerxê felek da’im ji zatê tey
Mukerrem kesbê enwara bikin ey muste’anê min

(Q. 2/16 m.)

‘Eksê husna te ye nûra **meh û mehrê feleka**
Ku didin rohnî li ‘alem werne zulma tu helek

(Q. 8/11 m.)

Bi wesfê wî bilind bû Yusrî ta **gerdûnê seyyare**
‘Eceb nîne bilindaî bi hubba şahê ‘erşanî

(Tx. 4/14 bn)

Me dil û can û çiger rûh û cesed tev bi we dan
Çi nişab û çî xedeng tên me ji **cuhtê esedan**
Bes ku **‘eqreb** sifeta sedxê bi qelbê me vedan
Heq ne guhdarê te bit padişeha serwê qedan
Bi kenarê me feqîran bike carek negehê

(Tx. 3/8 bn.)

Ku sena berqê cemala te ji nîv zulmet û nûrê
Leme’anek de li **kewnê hîv û ro** tixe qusûrê

Ku ji ser rewzê husna xwe vekî perde sutûrê
Ji gulîstanê cemala te gulek bête zuhêrê
Ji dinê dê biçitin navê buhuşta Îremê

(Q. 7/2 m.)

Xweya wê qedd û balahê lefand eswed li selwahê
We **'eqreb anî ser mahê** dilê min wan du tîr danî

2.11. Gewher û Medenên Giranbiha

Di helbestên klasîk de unsûrên xweşikiya yarê bi gewherên giranbiha tên şibandin. Peywendiya diranan bi mercan re, ya por bi zêr re, ya bedenê bi zîv re, ya lêvan bi yaqût re tê danîn. Di dîwana Mela Yasîn de peyvên elmas, mercan, sedef, lu'lu (durr), cewher, zêr, zîv, 'eqîq, yaqût, paxer (paxir), mermer hatine bikaranîn.

Di vê bendê de axaftina yarê mîna zêr e. Ji ber ku zêr biqîmet e û bihayê wê zedê ye.

(Teş. 1/10 bn.)

Dilrebayan ji me dil girtine em bê meferîn
Ku bi sed rengê di dil da me vebû cerh û birîn
Şeb û ro kab û si'et kuştiyyê daxa cigerîn
Heye carek ji kerem ey **zêr kelîmê** we zerîn

(Q. 9/14 m.)

Selamê **durr û yaqûtî** ku Yasîn Yusrî pir gotî
Li ser perya ku dil sotî bi şu'la wechê nûranî

(Q. 3/2 m.)

Ne wek **zîv** î ne wek **zêr** û **sedef** bel **durr û elmas** in
Ku cellab in ji bo înzarê sultan û şehan îro

ENCAM

Mela Yasîn Yusrî yek ji helbestvanên edebiyata Kurdî ya klasîk e ku di sedsala 20î de jiyaye. Di vê sedsalê de bi helbestên xwe yê klasîk hatiye nasîn. Navê xebata teza me wiha ye: Dîwana Mela Yasîn Yusrî; Metin û Lêkolîn. Me di vê xebata xwe ya tezê de wekî beşa bingehîn metnê dîwana Yusrî transkrîbe kir. Ev xebata me ji sê beşan pêk tê. Me di beşa yekem de cih da jiyân û berhemên Mela Yasîn Yusrî û kesayetîya wî ya edebî; di beşa duyem de em li ser teşeyên nezmê û analîza unsûrên kulturî rawestiyân; di beşa dawî de jî me cih da metinê dîwanê.

Di pêvajoya xebata xwe de em gihîştin hin encaman ku ew jî ev in:

- a) Navê Yusrî yê nasnameyê Yasîn Toprak e. Bi eslê xwe ji Pasûrê ye. Di sala 1906an de li gundê Xerzika ji dayîk bûye û di sala 1994an de li bajarê Amedê çûye rehma Xwedê.
- b) Dersa Qur'anê cara ewil li cem melayê gund Mela salih xwendiyê. Piştî wê diçe gundê Ferhendê li cem Mela Yehyayê Ferhendî dest bi xwendina medreseyê dike. Dema ku kitêbên xwe yê rêzê dixwîne pê re jî dersa feqiyên din dide. Îcazeta xwe ji Mela Yehya girtiye û dest bi melatîyê kiriye. Seydayê Mela Yasîn Yusrî li gelek gundê Farqînê wek mela xebitiye û li ber destê wî gelek feqî rabûne û îcazet standine.
- c) Mela Yasîn di helbestên xwe de wek nasnav Yusrî bi kar aniye. Bi tenê di helbesteke wî de Yasîn Yusrî derbas dibe.
- d) Berhemên Yusrî yê ku me derbareyê wan de agahî bi dest xistine bi tevahî deh lib in. Ji van berhemên pênc bi kurdî û pênc jî bi erebî ne. Di vê serdemê de bi pênc berhemên xwe yê kurdî di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de cihê xwe girtiye.
- e) Dîwana Yusrî ji helbestên kurdî û erebî pêk tê. Ji van helbestan 11 bi erebî û 43 heb jî bi Kurdî ne. Me di vê xebatê de cih neda helbestên erebî.
- f) Zimanê ku Yusrî di helbestan de bi kar aniye ji hêla edebî ve bihêz e. Di nav helbestên kurdî de gelek hevok û ravekên erebî hene. Li gel formên farisî kêr be jî çend peyvên tirkî jî di helbestan de xuya ne.

g) Yusrî tradîsyona Edebiyata Kurdî gelekî baş şopandiye. Ji helbestên wî diyar e ku Mela Ehmedê Cizîrî baş nas kiriye û ew di bin bandora wî de maye. Nazîreyên ku ji bo xezelên Cizîrî nivîsîne hêza wî ya edebî derxistiye holê. Me di helbestan de bandora Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî, Şêx Eskerî û Seydayê Hecî Fettahê Hezroyî ya li ser Yusrî dîtiye û bi mînakên jî nîşan daye.

h) Yusrî yek ji helbestvanê klasîk e ku heta niha herî zêde teşeyên nezmê di dîwana xwe de bi kar anîne. Me di vê xebatê de donzdeh teşeyên nezmê yên cuda dîtin. Ji bo ku ji dîwanê gelek helbest wenda bûne, dibe ku hin teşeyên din jî hebin û negihîştibin destê me. Yusrî helbestên xwe bi tevahî bi wezîna erûzê nivîsandine. Ji helbestên wî diyar e ku di hêla wezîne de jî serkeftî ye û helbestên xwe bi qalibên cûrbicûr nivîsandine.

i) Helbestên Yusrî ji hêla naverokê ve wiha ne: Hezkirina Xwedê û Pêxember, terîqet û tesewîf, rewşa misilmanan, rexneya şêx û sofîyên sexte û fanîbûna dinyayê.

BEŞA SÊYEM

METNÊ DÎWANÊ

QESÎDE

Munacat

1

Mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun

Behra Hecezê + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Ilahî her tu yî Reḥman ilahî her tu yî Mennan
 Ilahî her ji te îḥsan bi her şey ta nemil dûdî

- 2 Tu Berr û hem tu Xeffar î tu Tewwab û tu Settar î
 Medîrê çerxê dewwar î tu Xellaq î tu hem cûd î

- 3 Meziyyet min di dunya ḥub di eyyamê refaḥ û keb
 Ku ez 'ebdê te me ya Reb we bo min her tu me'bûd î

- 4 Eger dunya tijî nar bî ji te reḥmet ku izḥar bî
 Kesên merḥûm selîm sar bî ji mişlê narê Nemrûd î

- 5 Dema reḥmet te kir zahir nema te'sîr ji bo agir

- Ku zatê t̄eyyîb û t̄ahir ne wê agir ne wê dûdî
- 6 Ilahî heyr û bêçar im hezîn û jar û mil xwar im
Welê ej te umîdar im ku rehmet tu bi min zûdî
- 7 Tu meqşûd û tu mehbûb î rizake ‘ennî meţlûb î
Bidem wek da te Eyyub î şifa ez zurcefa dûdî
- 8 Rica me’j Xaliqê icram rica me’j Qadirê ‘ellam
Ku rake’j me cefa temmam ji îhsan û kerem cûd î
- 9 Te pir ni‘met bi min daye ku can û ruħ bi wan maye
Welê beşta me wunda ye surûrek dê bi min nû dî
- 10 Bi ser min rehmetê dakî ji dil kerb û cefa rakî
Bi luţfa xwe me dil şakî bi her hemdî tu Mehmûd î
- 11 Ilahî Yusrî dil mehzûn bi eşcan û esa meşhûn
Bi alam û cefa meqrûn ji cûda pir şena zûd î
- 12 Bilaħed ni‘met û îhsan te da ser cinn û ser insan
Ji bo ĥacatê ins û can tu med‘uww û tu meqşûd î

Ne't

2

Fe'ilatun/ fe'ilatun/fe'ilatun/fe'ilun

Behra Remelê ++ -- / ++ -- / ++ -- / ++ -

1 Şeker û şehd û şifa dil te bi çavên xwe belek

Ebedî hiştî di qeyda hubb û 'îşqa xwe gelek

2 Şeb û ro mane di wê qeydê gelek bilbilê jar

Ûkeyrê gulzara cemala te nehin wan emelek

3 Şeker û şehd û gulabê tu me can mêş û mekes¹¹⁶

Ji şeraba 'eselî nake sebir ta çe helek

4 Keyfe yeşlû 'en cemaîn min bi furî hûsnihî

Ruhe men fewqe seray mimmen lehu'l-hicrî melek¹¹⁷

5 Ji heyatê ku li selwa te neqey maye heyat

Wekî reşmarê li bedra te munewwer bû xelek

6 Ku ji qewsê te hilalê vekirin tîr û nesil¹¹⁸

Di dilê kul de mesaqib biye xerbal û elek

¹¹⁶ Derkenar: Şeker û şehdê ku 'aşiq li mîzacê mekesê.

¹¹⁷ Derkenar: Exeze'l-qelbû me'e'l-kebdî weli'r-rûhî melek.

¹¹⁸ Derkenar: Vekirin tîrê ku barîne ji burca esedî .

- 7 Wekî yek takî ji reyhanê ‘uzarê te zirav
Bû şecî dil bi wucûdê we bedel bûye pelek
- 8 Eyyû sehmin hecemi’l- hubbî ‘eleyhî we neca
La we qebri’l-istibarî we heyatî hubbî lek
- 9 Keyfe yencû’ş-şehîmû min beynî ezfari’l- hewa
Kullû men ye’xuzû hülleysû fe-bi’l-fewri’-helek
- 10 Kî di ‘işqê de selîm maye ji afat û bela
Qe di agir de selîm ma hecer û hesnê çelek
- 11 Cewherê ferdî di husnê te ne hemta û meşîl
Ne li ser rûyê zemînî ne li eqtar û felek
- 12 Bi mekarîm û mezaya tune hin wek te kesek
Ne di peryan û beşer da ne di hîr û ne melek
- 13 Xweşîya cennet hemî xeyrê cemala Şemedî
Bi wê nadim ku nezerdim li du çavên te belek
- 14 Ji te yek mû yekî nadim bi du şed Zîn û Şêrîn
Ku hesêb kî me bi Ferhad û Memê xweş emelek

- 15 Me şifa dil di riqab lebê tey le‘lî de dî
Ne wekî şehd û şeker qend e ji wan zêde gelek
- 16 ‘Eksê husna te ye nûra meh û mehrê feleka
Ku didin rohnî li ‘alem werne zulmat û helek
- 17 Ku ji bin Leyletê Qedra te şiba ‘îdê xuya
Ji şevê halik û dacî re nema qet temekek
- 18 Nebûyîne ne dibin wek te şepalê di cihan
Kullû husnîn we cemalîn we kemalîn huwe lek
- 19 Ku ji baxê gul û sêvê ne çinî min qederek
Ne çû bilbil ‘ebeş im min hene xweş gul di selek
- 20 Sekinî ma ji weqara te sera ta bi semek
We ji ‘işqa te ne sergeşt e seyarat û felek
- 21 Tu gula baxê cemal î tune hin qed ebada
Ne di Me’wa ne di Firdews û ‘Edin wek te gelek
- 22 Rebbena za‘ef lî Yusrî min bî hari’l-keremî
Tu di gulzarê cemalê de ku ferda ne gelek

23 Wehwe mişbahun bi-mişkati we rûhin we heyat

Tune hin qet ne di erd û ne sema wek te gelek

24 Bi du nûnê xwe yê Leylî ku li wan nuqte di şad

Hişt di qeydê hubb û 'işqa xwe te 'uşşaqê gelek



Mefa‘îlun/mefa‘îlun/mefa‘îlun/mefa‘îlun

Behra Hezecê + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

1 Werin ey dost û eḫbabê ku xwey dîn û îman îro

Temaşa kin li vê şî‘rê bi qelb û rûḫ û can îro

2 Ne wek zîv î ne wek zêr û şedef bel durr û elmas in

Ku cellab in ji bo inzarê sulṭan û şehan îro

3 Munezzem bû di selka cewherê ḫusn û belaxet da

Bi mişlê abê carî ew diherkin ser lisan îro

4 Ji wê kenza belaxet min gelek eşdafê xur anî

Ji bo we da ji wan xurran derînin cewheran îro

5 Di nûşin jê şerab û şerbeta şehd û şeker pir ku

Te girtî ger di wan bo xwe semem cî û mekan îro

6 Xiṭaba min niha çêbit bi ehlê ‘ilm û xwenda ra

Çi ku ew pêşivan û rehber in bo ‘amiyan îro

- 7 Di piştî ihtiram û ‘erzê hürmet xwestina iznê
Ji zatê wey mubarek ez dibêim çend cumleyan îro
- 8 Dikim tewqe rica hêvî ji Rebbê xwey kerem da ku
Mubarek gohê wey tahir nekin nefret ji wan îro
- 9 Evê ûla ji wan cumla bi her eẖraẖ û tebcîlê
Dikim gazî hewarê ez li zumra ‘aliman îro
- 10 Gelî eẖzabê tirlû tirlû ehlê ‘ilm û ‘irfanê
Li cem min hûn gelek şêrîn bila şek bê guman îro
- 11 Li we hîzbê mubarek tev teẖîyyat û selamê min
Dibarin pir ji ‘ewrê rûh û can û dil lisan îro
- 12 Dikim pir ‘erzê hürmet bo zewatê we mubarek ez
Li Qu’rana Kerîm carek binêrin hûn dizan îro
- 13 Bi nesa ayeta nûrîn ku nazîl bo ji meẖfûzê
Ku mu’min tev biraê hev me reyb û şek neman îro
- 14 Di piştî’k em biraê hev bi nesa ayeta nûrîn
Ecebdar im çewa tefrîq û ayrî xeyrî man îro

- 15 Hinek nûrî ne hin de‘wacî hin qurbacî hin Îran
Hinek ewha hinek ewha nelazim ‘eddê wan îro
- 16 Bi wan weşfan cidal û hem te‘eşşub tête mabeynê
Bi wê zehrê xefî bit heq sebeb dil korî man îro
- 17 Bi zeqûma cidal û hem te‘eşşub dil dibêtin kor
Tecellî nake tê da rast û heqqî bê guman îro
- 18 Netîca ferq û temyîza me zîll û zu‘f û poşmanî
Dibên em xax û riswa tev di destî dijminan îro
- 19 Werin carek li ser çab û serê vî şa‘irê miskîn
Binê dara tifaqê da bixun jê fêkiyan îro
- 20 Muhammedî ne em giştik me rehber Hezretî Qu‘ran
Kelamê Heq Te‘ala menbe‘a dîn û îman îro
- 21 Bi heblillahî em bin mu‘teşim tev ey ‘ezîzler¹¹⁹ da
Xelaş bin em ji van zulmatê zulma zaliman îro

¹¹⁹ Peyva ezîz bi qertafa “-ler” di forma Tirkî de pirjimar hatiye kirin.

22 Ji ewwel ez dikim îqaz û tenbîha we eħzabê
Mubarek hem dikim tewşî li we ey rûh û can îro

23 Emanet hûn nekin tecrîh û țe‘na ‘alimanê dîn
Hilaka pir mezin zû tê bi qismê ța‘inan îro

24 Di fiqha ehle mezheb tê ku teħqîr û ihana wan
Ji heyset ‘ilmê ew kufr û ɗelalet eleman îro

25 Evê dudya ji wan cumla dibêjim ax û şed heywax
Di gel şîn û girî heşret ku dîn çû maye nan îro

26 Dirêjim ‘eddê mî’ata li ewraqê buharê ez
We Yusrî hêstirê xûnê li rûyê zer mehan îro

26 Ela ey dil şewatê dîn werin îro ku em bigrîn
Birêjin hêstirê xûnê bi feryad û fixan îro

27 Li xatir xwestina dînê semawî dînê Islamê
Bi şed ab û girî gazî Xuda kin bê sekan îro

28 Ku belkî Rebbê ‘alem Xaliqê erd û sema dîsa
Bike nazil li me reħmet bi dînê ‘alîşan îro

- 29 Evê sisya ji wan cumla derînim dur ji eşdafa
Ku la'îq bit ji bo celba guhê her sami'an îro
- 30 Gelê 'ulma û xwenda tev ji ehezab û ji xeyrê wan
Dikim 'erza 'erež ez ser cenabê giştikan îro
- 31 Werin em tev bikin xizmet bi cism û rûh û can û dil
Ji bo dînê xerîb bo ê li cem ehlê cihan îro
- 32 Cihadê bo dewama dîn bikin em şadiq û muxliş
Mucerred bin ji exražan ku bin kamil îman îro
- 33 Cihada ku me kir me'rûzê zatê we hene bo wî
Du me'na yek ji wan herba bi qismê herbiyan îro
- 34 Esef ku'j 'alema Islamê zû rabûye ev me'na
Bi şett û ferq û temyîza ku der qewma de man îro
- 35 Ji 'ewda wê niha dûr in 'eqil ma me'neya şanî
Ji wê şanî xeberdin em bikin beşê beyan îro
- 36 Eva şanî ji herduyan ku se'ya der umûrê dîn
Li wufqa taqetê kin her mukellef der cihan îro

37 Gelek eqsamê wê se'ya mubarek eşref û 'alî
Ku pir zor û eza zebt û jimara kullê wan îro

38 Welakin ez niha bêjim uşûl û kulliyatê wan
Ku istînbatê kin 'aqil ji kullê cuz' iyan îro

39 Ji wan te'lîmê xwenda 'ilmîyat û hem 'emelyata
Uşûl û hem furû'ê dîn bi qismê cahilan îro

40 Medarê e'zê û eşlî menatê raciî û 'alî
Ji bo şept û dewama dînê Heq te'lîmê van îro

41 Ne hin meqbûl û merzatir tu xizmet qeç divê dînê
Bi mislê te'lîmatê dîn ji bo kullê nezan îro

42 Ji wan emrê bi me'rûfê we nehyâ munkerê mutleq
We infaza hüdûda hem ji nuşhê naşîhan îro

43 We teşhîhê 'uqûdan hem 'edalet hem silê rehîmê
We hem sedda derê bid'a we zulma zaliman îro

44 We ifta a şehîh û hem qeza a şer'î û dîn î
Ne hin la'iq we zana kes ji bo van her du wan îro

- 45 Bizanin hûn ku teṭbîqa hinik ‘iş û ‘umûrê dîn
Dibin xaşê u’lû’l-emra ne ‘işê ‘amiyan îro
- 46 Qewam û hem melaka Dînê Islamê di her dûr î
Uşûlê ku divê weznê de go Yusrî nezan îro
- 47 Ne teşhîr û tezahur hem ne temyiz û nişan da’în
Ne gurr û xwarina goştê mirîşk û şamiyan îro
- 48 Ne ṭe’nê ‘alimanê dîn ne ṭe’n û sebbê eşhaban
Me‘azallah dibin esbabê sûê xatiman îro
- 49 Gelê ummet dikim tewşê li we rê şaş nekin îro
Riya Heq ew riya ehlê cema‘et sunnetan îro
- 50 Ku ew rê menheca Hezret Muḥemmed al û eşhaban
Riya ruhniy yû heq ew rê bila şek hûn bizan îro

Ne‘t

4

Fe‘ilatun(fa ‘ilatun)/fe‘ilatun/fe‘ilatun/fe‘ilun(fa ‘ilun)

Behra Remelê ++ -- / ++ -- / ++ -- / ++ -

- 1 Zeriya nazik û şêrîn bedew û hülwê riçab
Bi cemala xwe ne hiştî di dinê bo kesî nab
- 2 Ku ji ser rewzeê husnê şeb berata xwe hilîn
Ji sera ta bi sema bit qebes û lem‘e şihab
- 3 Ku ji perda şebê qedrê bedriy û ew enî roj
Qebesa rojê ji rojê re dibî perde hicab
- 4 Naê dîn ew ne divê perdeê nûrîn ne diwê
Ku çewa perde ye ew şeb wekî wê şu‘le niqab
- 5 Hêviya min ji te ey badê şebaê çi zeman
Ku ziyaret kî sera muhteşemê ser ser û çab¹²⁰
- 6 Ku ji bin ne‘lê mubarek bide ger izn û rîza
Bi xwe ra bîn tu ji çeşmê me re hin toz û turab

¹²⁰ Çav ji bo serwa xira nebe wek çab hatiye nivîsandin.

- 7 Ku ji çeşmê me ê 'ewra biderîn 'ewr û 'emê
Ku bixûn ayetê wê ھusnê di keşşafê kitab
- 8 Ahê eyyamê wişalê ku me tê nûşî riqab
Ji lebê le'lê mubarek ku dixwe waşî kezab
- 9 Ku bi wê abê ھeyatê me ھeyata rûh û can
Me şifaya dil û can ew şeker û qend û gulab
- 10 Ji lebê le'lê me pir girtî şeraba 'eseli
Me ھeyata dil û can û cigerê tev bi şerab
- 11 Buhurîn rojê mubarek esefen şed esefa
Buhurîn kuwser û zezem me nema xeyrê serab
- 12 Ne tenê'j keyf û kemakewnê te dê germîy û sar
Gelekan dîne di eţwarê ھudûşê siy û tab
- 13 Lew di çerx û gerrê aşê 'alema kewn û fesad
Hate hêran pir serî çûn ew bi dewlê bê ھisab

14 Hel eta hînu'm-mîne'd -dehrî 'ela fezzîn ferîd

Lem yecîd fihi bi-ḥulwi'l-'îšetî murre'l-'ezab

15 La we qebri'l-iştîbarî we ḥeyatîl iştîyaq

Keyfe we'l-kewnî medare'l-ibtîla we'l-iztîrab

16 Me hezar ah û esef têne ji nîva cigerê

Ku bi koranî 'umur çû me divê xirbê xerab

17 Şeb û ro bigrî li ḥalê xwe tu ey Yusrîyê jar

Ku yetîm mayî bi çûna bedewa 'alî cenab

18 Bes te go şê'rê li ḥalê xwe bi sed ab û girî

Ḥelîyan dar û devî deşt û çiya kanîy û ab

Ne't

5

Mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun

Behra Hezecê + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Muħemmed raqiyê 'erşê ilahî kenzê 'irfan î
Cemal û rewnaqa 'alem medarê cumle ekwan î
- 2 Medarê iftixar î tu menaþê izdîhar î tu
Xelaş kî me ji narê tu şefî' ê cinn û insan î
- 3 Çi ins û cinn û emlak î çi 'erş û kursî eflak î
Çi cennat û sema xak in hemî bo te Xuda anî
- 4 Xuda bo te hemî çêkir nuqûşê zînetê lêkir
Hezar ħemd û şena şêkir di her 'alem tu sulþan î
- 5 Tu sulþan î di her kewnê şefa'et qel'eya şewn î
Melazê yardim û 'ewn î ji bo ummet kerem kanî
- 6 Gula baþê u'lu'l-'ezma şefa'et 'alîy û 'ezmê
Etem cah û qedir esma mezin xulq û şeref şan î

- 7 Tu pir ھusn û cemal î tu çî xweş nûrek zelal î tu
Di her kewnê şemal î tu ne wek roja li esman î
- 8 Di gulzara cemala te di selwa bejn û bala te
Di miska zulf û xala te gelek ruھ bilbilan danî
- 9 Ne wek bab û ne wek da î ne wek ewlad û ebnan î
Ne wek ekbad û qelba î gelek zêde bi şîran î
- 10 Şua' û berq û enwaran te rihtî her wekî baran
Li rewz û werd û ezharan bi mişlê 'ewrê nîsan î
- 11 Bi qîmet qedr û cah î tu ne wek sulţan û şah î tu
Çu meھbûbê ilahî tu ne te hemta û nasan î
- 12 Eya rûھ û ھeyata min eya şebr û şebata min
Ne hin se'y û xebata min ھezîn im ez di her anî
- 13 Di her an dil şikestî me bi qeyda ھuznê bestî me
Že'îf im çerm û hestî me ji bo derdan tu derman î
- 14 Şelat û hem selamê min wekî ھerf û kelamê min
Li zatê te bi namê min tu meھbûbê dil û can î

15 Ilahî Yusrîyê mîskîn zelîl û jar û dil xemgîn

Gula bestê bike temkîn tu xwey in'am û ihsan î



Ne't

6

Fa'ilatun/fa'ilatun/fa'ilatun/fa'ilatun

Behra Remelê - + - - / - + - - / - + - - / - + - -

1 Hatin em dergahê 'alî ya Imame'l-murselîn

Raciyê luţfa mezin em ya Medare'l-'alemîn

2 Muflis û  azî dehatim lew ku bê se'y û xebat im

Kêmtirînê her civat im ya Imame'l-murselîn

3 Dil hezîn û dil birîn im lew bi ef an û girîn im

Bo te ez  avan derînim ya Medare'l-'alemîn

4 Cerg û dil kengê dewa bin hêstirê  evan zuwa bin

Bo te can û dil fida b n ya Imame'l-murselîn

5 Ey heyata r h û cana q t  qelban her zemana

Efdikum r h  mecana ya Medare'l-'alemîn

6 Dil bi hu n  mubtela b  derd û kul l  tev bela b 

Ah û he ret min  ela b  ya Imame'l-murselîn

- 7 Ez li dergahê te jar im ‘aşî û şermê stuxwar im
Raciyê ‘efwa Xefar im ya Medare’l-‘alemîn
- 8 Qiblegahê eşfiya î Ke‘beya peyxemberan î
Hem heyata rûh û can î ya Imame’l-murselîn
- 9 Zülmeta erdê te rakir nûr û rehmet lê bela kir
Cumleê ‘alem te şa kir ya Medare’l-‘alemîn
- 10 Pir bi qedr û pir bi cah î raqiyê ‘erşê Ilah î
Dafi‘ê cumle menah î ya Medare’l-‘alemîn
- 11 Xîmeê kufra zemanê te ji ser erdê hilanî
Nûrê îman tê de danî ya Imame’l-murselîn
- 12 Ey dilê jar û şikest î bilbilê roja elestî
Lew te baxê gul dixwestî ya Medare’l-‘alemîn
- 13 Bilbilê baxê gula me lê çikim ez muftela me
Me‘dena derd û bela me ya Imame’l-murselîn

- 14 Şafi'ê ummet xebîr î şahê 'alem destegîr î
Yek nezer de min feqîrî ya Medare'l-'alemîn
- 15 Qabê qewseyna meqam î reḥmeta 'alem tamam î
Lew ji bo her kes imam î ya Imame'l-murselîn
- 16 Her çî mayê min digotî bilbilan dil pê disotî
Wan di ḥubbê ruḥ firoṭî ya Medare'l-'alemîn
- 17 Pir kemal û pir cemal î tu di dil şewq û şemal î
Menbe'a ava zelal î ya Imame'l-murselîn
- 18 Yusrîyê tî bê mecal e ew ji tîhna pir dinale
Ṭalibê aba zelal e ya Medare'l-'alemîn

Mefa‘îlun/mefa‘îlun/mefa‘îlun/mefa‘îlun

Behra Hezecê + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Ela ey nazika leb-xonçe qed selwaê yaban î
Weyaxud nêrgiza yek ta li ser miska Teter anî
- 2 Xweya wê qedd û balahê lefand eswed li selwahê
We ‘eqreb anî ser mahê dilê min wan du tîr danî
- 3 Hebeş berdane ser rojê giha ser ‘eqdê bişkojê
Dilê min sohtî wek dojê bi hevra atêşek danî
- 4 Bi wan nûnê li ser şadan ku katib koşe lê badan
Di dil da agirek dadan ku lew bû şubhê perwanê
- 5 Zulam berda bi ser nûrê giha ser camê ferfûrê
Ji Wadê Eymena Tûrê veda pir zew‘ û lem‘anê
- 6 Ciyûşê came reş zahir ji wê Ke‘bê re bûn kafir
Şeba lê da ji hev rakir kufur rabû ji îmanê

- 7 Fe-sare'l-kewnû beḥre'n-nûr kewakib cumle bûn mestûr
Gelek merfû'î bûn mecrûr bi ḥusna wê rûḥ û canê
- 8 Ji ma beyna sîy û tavê peyapey nebl û nişanê
Li dil da xûb û mehtabê pijandî mislê buryanê
- 9 Ku bû ḥelq e şeva ḥalek li bedrê sûfî û salik
Nema hêş wan nebûn malik ji bo ḥusna xwe wê anê
- 10 Ji hicran û hewa Şîrîn wekî Ferhad dikim qêrîn
Bi wê Zîna beden zêrîn Memê bend im di zindanê
- 11 Ji baxê dilbera xade leṭîf û xûb û şehzade
Me kir ceybê gulê sade ne wek bilbil di ḥirmanê
- 12 Ji baxê behceta ḥibbê çinî dil meyweê ḥubbê
Şukur lillah bi wê ṭubbê xelaş bû ew ji tofanê
- 13 Reḥîq û kewsera lêva gula ya ser gul û siva
Hewa 'uzrî ku da çêva nema dunya li meydanê

14 Me pîr şê'r û xezel gotî dil û can Yusrî pê sotî
Wekî Nişanîyê Botî ¹²¹di weşfê wê şeref şanê



¹²¹ Meqsed Melayê Cizîrî ye.

Ne‘t

8

Mefa‘îlun/mefa‘îlun/mefa‘îlun/mefa‘îlun

Behra Hezecê + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

1 Gula baxê ulu‘l-‘ezma Muħemmed şahê ruslan î

Li zat û hem şîfatê Heq Te‘ala cellê Burhan î

2 Melek reng û şîfet werd î di ħusnê cewherê ferd î

Ji ‘ewran zêdetir merd î qedem da ‘erşê Rehman î

3 Ji “ kenza kuntû kenzen” ger xeberdar î tu ey sadî

Dizanî me‘neya “lewlake lemma” tu bi îm‘an î

4 Ji baxê estefaê ew ku tê bû eħsenê werdan

Xuya bû sîrrê “şubħane‘l-lezî esra” kû dil zanî

5 Di qendîla ħudûşê cumle ew ‘eşlê me zahir bû

Ku ecla enwerê cumle meraya şemsê ‘irfan î

6 Xezaya rûħ û can û dil şemal û ruhniya çavan

Ji bo cerg û dilê tî ew şeraba taze rumman î

- 7 Kesê dî şeb Berat û Leyletu'l-Qedr û şiba 'îdê
Ji neşma "we'dduha we'l-leylî" rû zulfan bi dil anî
- 8 Ku sirra "eşsenê teqwîm" tecellî kir di wê ew bû
Ecellê mezherê husnê ji ferdê new'ê insan î
- 9 Ela ey 'endelîbê dil here baxê "elem neşreh"
Dizanî tu çi teşrîfa mezin jê ra Xuda danî
- 10 Çi heddê Yusrîyê Xî¹²² 'ed ke weşfê şahê kewneya
Feqed kane 'ela xulqîn 'ezîmin wehwe nûranî
- 11 Bi weşfê wî bilind bû Yusrî ta gerdûnê seyyare
'Eceb nîne bilindaî bi hubba şahê 'erşanî

¹²² Diya Seydayê Mele Yasîn ji eşîra Xiya ye. Ji ber vê yekê xwe wek Xî hesabandiye.

Ne't

9

Mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun

Behra Hezecê + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Selamê şu'le nûranî ji hezret ayê Qu'ranî
 Li ser te xeml û nişan î bigir xemlê ji Qur'anî

- 2 Selama xaliqê 'erşa ji esmana hetta ferşa
 Li ser xûba mubarek şa Xuda hifza xwe lê danî

- 3 Selam û himmeta Hezret Muhemmed Mustefa derket
 Li ser qama te bû cennet wekî cennatê Riđwan î

- 4 Selamê Fa'time'z- Zehra di gel wê 'Aîşa Kubra
 Li te wek perdeya xedra mûbarek perde nûranî

- 5 Selamê al û eşhabê Resûlê Heq wekî abê
 Li ser qama te mehtabê xelat in bo te wan danî

- 6 Xelat û xemlê nûranî li te van ewliya danî
 Te vê şanê ji ku anî hela bêj ey rûh û can î

7 Selamê bo Bekir xwey şan digel ‘Umer ‘Elî ‘Uşman

Li te wek cewher û mercan te çû rutbe bi esman î

8 Imamê Malik û Ni‘man we Eħmed Şafi‘î erkan

Wekîl û warişê Qu‘ran Imamê Mezn û Rebbanî

9 Imamê ummetê her çar selamê wan li te her car

Şeref hesyet te bû sed par heqîqet kir şeref şanî

10 Selamê wan xelata te dîkin zêde kemala te

Mubarek bin li bala te xelat û xeml û nişan î

11 Selamê Xewşê Geylanî we şahê Neqşî Nûranî

Xelat in ser te wan danî te pê rutba mezin anî

12 Selamê durr û elmasê di zerfa misk û qirtasê

Li wê xûba ku dil qasê li ser vî ‘aşiqê fanî

13 Selamê durrîyy û cewher di rengê zezem û kewşer

Li ser qedda te ya enwer me bê hîsab û hed danî

14 Selamê durr û yaqûtî ku Yasîn Yusrî pir gotî

Li ser perya ku dil sotî bi şu‘la wechê nûranî

- 15 Eya xêşf û xezala min eya şewq û şemala min
Nezer ke li 'erzêhala min li vê şî'ra girî anî
- 16 Dizanî tu mecalê min bi kerb û ah û nalê min
Kul û hesret hevalê min ji ber şewqa te qed fanî
- 17 Di dil hubba te sed qat e elemdar im bi şewqa te
Şehîd im ez bi hubba te dikim weşyet li te canî
- 18 Emanet piştî mirna min were carek bi qebra min
Bibê miryo selama min li te her weqt û her anî
- 19 Ruhê miskîn ji nûrabî dile xemgîn bi te şabî
Bibêjit bo te mehtabê li çabê min te pê danî
- 20 Selamê te bibin lê nûr dikin lê ronî qebrê kûr
Dibit dil şah û dil mesrûr bi nûra wê xeber danî
- 21 Eya şebr û şebata dil eya rûh û heyata dil
Eya pêt û şewata dil te bes agir li dil danî
- 22 Bi qedd û qameta selwa bi lêvê şekkerî helwa
Bi 'aşîq daye şed belwa ku şed hesret bi dil anî

- 23 Te bes dil jê te kir talan şehîd û kuştîyê xalan
Bikin rehîmê li ‘ebdalan ku xaşa dîn û îmanê
- 24 Te bes ey hor û mumtazê ku şed agir te da xazê
Ne bes ey xob û şehbazê ji dil rakir te duxanê
- 25 Dil û can tev dipêjî tu ji çeşman xûn direjî tu
Helandî ‘estî mêmî tu nema skence ku te nanî
- 26 Di çavan gerçi gulzar î di dil da pêtiya nar î
Ji çeşman xûn dikî carî bi sedd û redd û beşdan î
- 27 Li textê dil ku rûniştî ‘eceb hubba xwe lê hiştî
Bi şûrê ‘işqê min kuştî perî rengê şeref şan î
- 28 Bi şehd û şekkerê lêvê bi miska ser gul û sêvê
Ji min dil girtî kir cêvê cesed تنها li wir danî
- 29 Bi misk û ‘enbera zulfê bi dil da lew ‘ena elfê
Dil û can tev birin telfê bi şewt û pêt û nîran î
- 30 Bi şê‘rê sadê bin nûnê gelek rêhtî ji dil xûnê
Ditirsim ez ji rûh çûnê tevê derd û kulê can î

- 31 Eger çenda ku hê sax in bi hicrana te dil dax in
Di dil şed hesret û axîn çêşim min 'ewrê nîsanê
- 32 Gelek ah û keser çêbûn gelek ab û girî lê bûn
Eman qelb û ciger jê bûn ji pêt û bu'd û hicranê
- 33 Bi ab û hêstirê carî bi feryad û girî zarî
Nebû dil nermê dil 'arî ji rehm û şefqe wijdanî
- 34 Bi ab û hêstirê çaba nebû dil têr ji mehtaba
Ku dil kevrê li ber taba çikî şed ab bi şexranî
- 35 Ji derdê nazika gulgûn ji şewqa lu'lûa meknûn
Dixapînim dilê mehzûn bi nezm û şê'r û beytanî
- 36 Bi şê'ra dil dixapînim welê heq wê diarînim
Ji çêşman xûn dibarînim di gel feryad û fixanî
- 37 Ne perya cinn û can î tu Zuleyxaê zeman î tu
Hêbîba rûh û can î tu tîbîba rûh û cisman î
- 38 Ne wek ferfûrê fincan î ne wek elmas û mercan î
Welê bo min rûh û can î ku nabim bê te ey can î

- 39 Ela ey serwerê xûba ela ey fêkîyê Tûba
 Neda min dil tu mehbûba ji xeyrê te gulê can î
- 40 Perî rengê şifet ھor î ser û pa cumle tev nûr î
 Welê ھesret ji min dûr î felek çerxa me hê nanî
- 41 Wekî zezem zelal î tu wekî kewşer lu'al î tu
 Gula cennet mişal î tu şeraba taze rûmman î
- 42 Enî roja ku helhatê we menzer rewzê cennatê
 Ku her meywe di cenbatê qiyafet bax û bostan î
- 43 Di dil xurşîd û mah î tu bi qîmet qedr û cah î tu
 Wekî sultan û şah î tu li textê dil bi şahan î
- 44 Eya taca serê zerya eya nûra rûyê perya
 Eya şêrîntira erya bike pirsê ji wicdanî
- 45 Bi selwa bejn û bala te bi miska zulf û xala te
 Qesem nadim cemala te bi textê Şahê Îranî

- 46 Di weşla xwe ku tu'bxwazî¹²³ welew rûh ez dibim razî
Li cem 'aşiq semen az î ku pê bêtî bi erzanî
- 47 Eya gul xedd û qed selwa ku menzer Cennetu'l-me'wa
Bi vê seddê te şed belwa bi dil da tu ji ihsan î
- 48 Meramê 'aşiqê miskîn ku dilê mehzûn û dil xemgîn
Bi cî bîn ey gula rengîn gula qelb û dil û can î
- 49 Umîda min ji gulzarê ji wê 'aqil şerefdarê
Ku neşkîne me vê carî bi heqqê ayê Qur'anî
- 50 Bes e ey Yusrîyê miskîn bi şê'rê sergula rengîn
Te pir kul kir dilê xemgîn ji çeşman ab û xûn anî
- 51 Çi ku te'b şê'rê kibrîtî ku danîn dil xurî pêtî
Ji çeşman ab û xûn rêtî heqê 'îşqê bi cî anî
- 52 Bi şî'ra te hesin hêlya bi neşma te kevir kelya
Bi sebka te xeden hêlya ku şed ah û keser anî

¹²³ Ku tu bixwazî ji bo wezinê wiha hatiye nivîsandin.

53 Bi wan şî'rê te yê şekrîn ku 'aşiq wan bi rûh dîkrîn

Esef deşt û çiya digirîn ku dil daḫ¹²⁴ û çeşim kanî

54 Ilahî ez ricakar im ba asam û gunehkar im

Hezîn û jar û mil xwar im bidî min 'efw û xufran î

55 Bi cahê zahidê kamil bi yumna 'alimê 'amil

Bi wan zatê ku bûn wasil bi peyḫember bi Qur'anî

¹²⁴ Çiya

Hîcwiye

10

Mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun

Behra Hezecê + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

1 Du ta sêv û du ta mişmiş di baxê dil da min danî

Bi xûna dil seqî kir wan me sinca rûh li ber danî

2 Li ser şaxa xwe ya terhîn û nazik pir esefdar im

Ku bû kurmî ji baxê dil me avêt zawîya xanî

3 Meke derman dilê miskîn li ser şaxa xwe ya terhîn

Ku bû dara zuqûm lew min di koka wê tevîr danî

4 Mekin lewmê gelfî yaran ku dara kurmî min îro

Ji baxê dil birî lew hişkî bû êdî şemer nanî

5 Umîda min nema êdî ji kokê ew bide çêle

Çi ku lêxistî vî dîdê hewa dunya û nefsanî

6 Cuzama cehl û terkîbê di gel rîşa xurûra wî

Nebû qabil tedawî kim nedaê min tu derman î

- 7 Bi tiryâqa neşîhet nabe za'il ev merez îro
Şurûb û hebb û hem derzî tamam bê fayde min zanî
- 8 Esefdar im esefdar im li te billah esefdar im
Welê der dil ne min bo te ciy û mesken divê anî
- 9 Bi tedbîra me ya 'alî ku qûma çem simil anî
Welê kûsî qumul lêda tu haşil jê me hil nanî
- 10 Ne ku teng e seraya dil tu pir mezn î bi cî nabî
Bi 'aqil ger biçûk î tu bi nefsê hûtê behran î
- 11 Esefdar im ku min rêht abê kewşer şasê zengarî
Ku bû menfûr û musteqzîr di zerfê abê heywanî
- 12 Bi zenna min di ceyba xwe me danî misk û kafûrê
Meger ez yanîş im şewm û beşel bû ew me tê danî

Hîcwiye

11

Mustef`ilun/mustef`ilun/mustef`ilun/mustef`ilun

Behra Recezê - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

- 1 Der dil te Һesret ger nebit ma tu bi axînê çi kî
Ger te nebîtin derd û Һem ma tu bi nalînê çi kî
- 2 Her dem dinalî pir dikalî tên ji çeşman ab û xûn
Der dil nebit ahû keser ma tu bi kalînê çi kî
- 3 Һacet bi afat û belaya da bişon sûc û xeṭa
Ger te nebîtin dexme lek ma tu bi şabînê çi kî
- 4 Teһsillîyê lisandirêj nezan û kor û kerr û gêj
Ger tu nekî rojî nimêj ma tu bi latînê çi kî
- 5 Ger çi ken û keyfa li vir lakin tu pir bigrî li wir
Xa`în e dunya pê mexir ma tu bi xa`înê çi kî
- 6 Ger çi tu nan xwarî meaş lakin ji rê kirne te şaş
Tewbe ke da ku bibî tu baş ma tu bi xwarinê çi kî

- 7 Axa ku camêrî bikî ‘izz û şeref hasil dikî
Lê ger li miskîna nekî ma tu bi da’înê çi kî
- 8 Ey murşîdê bizn û miya bes wan bidoş ey rûsiya
Ger te nebit ka û giya ma tu bi kadînê çi kî
- 9 Ey ê ku humqê kirye test tora meşîxet daye dest
Bes wan kera te’b heve¹²⁵ best ma tu bi bastînê çi kî
- 10 Ger te ji jînê ey herez lezzatê dunya bit xerez
Bê dil te enwa‘ê meraq ma tu bi ma’înê çi kî
- 12 ‘Umrê dinê havîn şîfat ger tê nekî se’y û xebat
Zad û zexîre bit te fat ma tu bi havînê çi kî
- 13 Ey şofîyê cahil nezan hêsîr û dîlê pir xezan
Ger tu bi fatîhê nizan ma tu bi amînê çi kî
- 14 Ey feqîyê xwey cil û qat ger tu nekî se’y û xebat
Her dem herî cax û civat ma tu bi ta’yînê çi kî

¹²⁵ Te bi heve

15 Ey ‘alimê xwey teb‘ û renc der ‘ilm û ‘irfan mişlê genc

Ger te nebin e‘malê qenc ma tu bi zanîne çi kî

16 Ey xwey zira‘et xwey xebat anî ji erdê haşilat

Ger jê nedî şedqe zekat ma tu bi anîne çi kî

17 Ey ê ku şen‘etkar î tu ger lê nebî hişyar î tu

Dê bit xirab aşarê tu ma tu‘b¹²⁶ xerabîne çi kî

18 Ey ê bi dîn dunya kirî eman li pey carek nerî

Dê te bixapîn ger herî ma tu bi xapîne çi kî

19 Ey tacirê îman qewî satîş bike rast û sewî

Li‘Dyarbekir ger bihewî ma tu bi Mardîne çi kî

20 Yusrî te şarîn kir dirêj herçî ne kor û kerr û gêj

Şê‘ra te can û dil dipêj ma tu bi şarîne çi kî

¹²⁶ Tu bi

Methiye

12

Fa‘iatun/fa‘ilatun/fa‘ilatun/fa‘ilun

Behra Remelê - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Ey hebibê rûh û qelban canê canan î Selîm
Ey çirağê cism û canan pak û nûran î Selîm¹²⁷
- 2 Şahê textê seltenet bû der Terîqa Neqşebend
Şed qesem billah dibêm îro tu sulţan î Selîm
- 3 Rewneqa şer‘ û terîqet menbe‘a ‘ilm û hikem
Gulşena bağê heqîqet şemsê ‘irfan î Selîm
- 4 Tûrê Sîna dil dibarin lê ku enwarê Ilah
Ateşê Wade‘l-Muqeddes dî bi dil fanî Selîm
- 5 Mezherê sirra hedîşa “kuntû kenzen mexfiya”
Bû yeqîn şahê Hezanê Xoceê Şanî Selîm
- 6 Sirrê sarî feyzê carî sirrê “mala te‘lemûn”
Lewhê mehfûz menzera dil ‘erşê Reħman î Selîm

¹²⁷ Ev qesîde ji bo Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî nivîsîye.

- 7 Meyyîtê şed sal e dê hey bit dema lêkî nezer
Tu ji bo emrazê dil 'Îsa û Loqman î Selîm¹²⁸
- 8 Asefê himmet Seba mesken bi text anî wucûd
Şed şukur îro li textê dil Suleyman î Selîm¹²⁹
- 9 Der tebessum xweş dirêjit xonçe leb qend û nebat
Pir dibarin lu'lu û yaqût û mercan î Selîm
- 10 Muşhefa husna muqeddes xal û nişanê di hûr
Min nexwendî şed esef ser xal û nişan î Selîm
- 11 Der tebessum lu'luê meknûn dema bêtin zuhûr
Gulşen û çiçek dibarin werd û reyhan î Selîm
- 12 Dîn û dunya ger divêtin hûn gelê yaran werin
Sa'etek rûnên li ber şuhbet di dîwanî Selîm
- 13 Da binûşin mey ji fincana şeraba nazidar
Kewşer û aba heyatê nehrê heywan î Selîm

¹²⁸ Ji mucîza Îsa ya ku kor û seqetan baş dîke û miriyan jî sax dîke îşaret hatiye kirin.

¹²⁹ Li vir telmîh ji bo qisseyê Suleyman pêxember heye.

14 Lu'luê mensûr ku her çend anî min silka neçim

Lê ji bo zînet û xemla te bi cî nanî Selîm

15 Qesd û daxwaz û emel Yusrî ji can û dil ev e

Dîn û dunya tev bi min dê şahê dewran î Selîm



XEZEL

1

Mustef`ilun/mustef`ilun/mustef`ilun/mustef`ilun

Behra Recezê - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

- 1 Îro li min êşa ye dil dilber ji nû tîr daye dil
Lew da`ima wek naye dil da`im bi ah û waye dil
- 2 Dil çû ku lê danî zehir ger ew bi ma îro li vir
Min dê bixwesta jê şebir lê ez çikim yexma ye dil
- 3 Neş`a ji fincana ferê zewqa ji cama kewşerê
Dil birne ser `eħda berê lew da`ima yekta ye dil
- 4 Şahê li dil şahî surûr ger da bi wê cama teşhûr
Dil lê bi da pir feyz û nûr lê da`ima naşa ye dil
- 5 Min dê di keşşafê cemal tefsîrê ħusna bê mişal
Ĥerfîn ku lê nişan û xal dil xwendî lew xwenda ye dil
- 6 Nişan û xal pir tê hebûn lew ew bi remz û nukte bûn
Remz û işaret hel nebûn lew tê muĥeyyer maye dil

- 7 Z̤ulmet li n̤ur̤e xelwe b̤u îman di kufre celwe b̤u
Dil b̤e şebat û selwe b̤u çawa ‘ecêb hêj maye dil
- 8 Ew Leyletu’l-qedra ‘uzar ew şeb Berata zulf û yar
Wan selbî kir jê ixtiyar lewra ku b̤e hiş maye dil
- 9 Çûm rewzeya husna hebîb min dî li wê şed ‘endelîb
Ser şorgulan dem‘ û şebîb pir rêhtibûn pêt daye dil
- 10 Ne ji abê çeşmê bilbilan pêta ciger da şorgulan
Ne’j ateşê jerg û dila şorgul xerîqê maye dil
- 11 Dil kuştîyê deh sale b̤u lew her bi ah û nale b̤u
Da’im bi qîl û qale b̤u her dem bi lerz û ta ye dil
- 12 Min dî ji şehmarê lefa şed tîr û sed cewr û cefa
Kî dî ji me rûyan mefa hetta ku xwey hez maye dil
- 13 Ey rewzeya husn û cemal ser çeşmeya nûra zelal
Borîn li dil pir mah û sal hêj b̤e hez û b̤e paye dil
- 14 Heb h̤u mefatihe’l-kunuz yefhem tefaşîle’r-rumûz
Min husnikum keyma yefuz lew husnê xûban xayê dil

- 15 Ew nazika şêrîn kelam avête ser rojê zulam
Ker kir¹³⁰ ciger dil bir tamam zerrek li cî nemmaye dil
- 16 Boya ji misk û mawerê cama zabad û ‘enberê
Ava ji hewza kewşerê her dem ji te xwestaye dil
- 17 Misk û zabadê pê weşîn aba heyatê lê reşîn
Jê rake huzn û kerb û şîn lew menzera mewla ye dil
- 18 Destê sipî zendê zerîn îro ji bin perdê derîn
Cama şedef vêra werîn ser dil birêj zem‘a ye dil
- 19 Cama şedef ser dil birêj can û cesed tev pê bipêj
Lew qelb û dil pir zeng e hêj ger bit sipî hêja ye dil
- 20 Xudrê ‘inayet bû refîq lew dil bi wê cama ‘eqîq
Hiştê li ser ‘ehda weşîq sozê qewî zûdaye dil
- 21 Wan lef û zulf û xumrîya wan xal û nişanê siya
Girtin ji te dil Yusriya îro li min wendaye dil¹³¹

¹³⁰ Perçe kir, jê kir

¹³¹ Ev helbest ji xezela Melayê Cizîrî re nazîre hatiye nivîsandin. Bnr. r.26.

Mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun

Behra Hezecê + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Ela ey zîneta dunya tu yî rûh û rewanê min
Ji bo te ey hebîb îro fida bin cism û canê min

- 2 Me birca dil kirî merkez ji bo şemsa evîna te
Şu'a û pertuwê hubba te da qelb û cinanê min

- 3 Ji husn û rewneqê şeq bûye ismê te hebîba min
Ku lew her sa'et û weqtan biye werdê zubanê min

- 4 Bi roj û şeb dikim tekrarê navê tey mubarek lew
Bi ismê tey şerîf zewq û helawet tê lisanê min

- 5 Şihab û lem'eê nûra se'adet her ji luţfa heq
Di wechê tey munewwer bèn zuhûrê rûh û canê min

- 6 Şenaberqa tecellaya 'inayet berq û tîrêjê
Li mir'ata teya Iskenderî din mîr û xanê min

- 7 Nucûmê kewkebê çerxê felek da'im ji zatê tey
Mukerrem kesbê enwara bikin ey muste'anê min

8 Du‘a kir min bi feryad û fişan ya reb dexîl im ez
Qebûl ke tu li dergahê xwe feryad û fişanê min

9 Me hêvî tewqe û zarî ji luţfa hezreta ‘alî
Qebûlke ew bi cewher ce ji asar û nişanê min

10 Nehin la‘îq ji bo tezyîn û xemla nazika şêrîn
‘Uqûdê cewherê medh û şenaê der dukanê min

11 Eger çenda ku şebaz û cihangîr im di nezmê da
Welî derd û xeman Yusrî kirin lal wan zimanê min

Xezela Mulemma

3

Mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun

Behra Hezecê + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Mekin lewmê di 'işqa wan şifet hûr û perî royan
Fema tedrûne ma qase'l-muħîbbî min belîyatî
- 2 Nizanit kes bi dax û şewt û jana vî dilê miskîn
Fela yedrî biha men lem yezûq ħubbe'l-ħenîyatî
- 3 Weŧîsa dil ku her jê tê duxana ħesret û ahan
Fehel lem yezûq ħubbe'l-ħenîyatî yedrî bihî men
- 4 Binê carek curûhê dil ku lew tê xûn ji çavê şil
Meta ma tenzurûhû yelte'îm kulle'l-ceraħatî
- 5 Bi wan nûnê li ser şadan di dil da agirek dadan
Fesaret zumretu'l-'uşaqqî helka beyne emwatî
- 6 Li bedrê eqreban gerdan li selwa marê reş berdan
Tekadu'r-rûhû şewqen tismû tîlqa es-semawatî

- 7 Ji tîrê nuqteya nûnê ku pir rêhtî ji dil xûnê
Ke-Nîl in ew ke-Ceyhûn in ela heyhate neccatî
- 8 Ku şeb rakir ji ser rojê vekir elmasê bijkojê
Bedel enwarî fi'l-afaqî dunya be'de zulmatî
- 9 Hebeş berdane ser Ke'bê ku lew hacî ketin te'bê
Fe-kanû lem yerewha min kemali'l-izdihamatî
- 10 Xuya wê xal û nişanê kufur rakir ji îmanê
Feqed eđha cemî'el-kewnî enwarîn we zew'atî
- 11 Ji babê luţfê min şakir ku luşsamê ji rû rakir
Fe-sare'l-kewnî beħre'n-nûrî za berqîn we lem'atî
- 12 Efa'ê erqemê selwa ku da min miħnet û belwa
De'anî xariqe'l-ħusnî ila ma fewqe taqatî
- 13 Me qurşa rojê der şeb dî di wê qurşê me kewkeb dî
Ema testexribûne'l-qişşeta min xerqî 'adatî

14 Me der şeb dî şiba ‘îdê li min kir ruhñî xurşîdê
Ke-enne şemse qed-daret ila nişfi semewatî

15 Fena bit Yusriyê miskîn ji hubba wê gula rengîn
Fekeyfe’l-inqitamî we’l-hewa mişbaħu mişkatî



Fa'ilatun/fa'ilatun/ fa'ilatun/ fa'ilun

Behra Remelê - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Tên ji qewsê nûnê Leylê bê 'eded tîr û nesil
Lehm û dem musqeb kirin ta ew gihiştê cerg û dil

- 2 Dil bi dağ û dil birîn im lew me feryad û enîn
Min ji hêcra wê hebîba rojî rû xwarest û mil

- 3 Ha'imû qeqmi't -tîzarî min secamin xedemê
Fewqe xeddîn kel beharî men zenî şetî şemil

- 4 Haqebî ceysi'l-umûmî min cewa hubbî xeda
Axîzen qelbî fe-la yecdî melamun we 'ezil

- 5 Min di dil sed ax û hesret tên ji çeşman ab û xûn
Şahidê 'adil li derdan ah û wah û çavê şil

- 6 Ger ku çêbit bey' û bazara wişala xed gula
Rûh semen hindik dibînim naye desta pê weşil

- 7 Milk û mal û bab û da ewlad û cerg û can û dil
Hem hewasê zahir û batin digel fehm û ‘eqil
- 8 Tev ne hêja ne bi yek dîna hebîba muhteşem
Ya bi etles da şeref weqtê ku lê danî ne‘il¹³²
- 9 Ey murad û meqşeda dil selweta qelbê hezîn
Agirê huznê giha dil ma ji şebrê mu‘tezil
- 10 Eslihû qelben xeda mişkatû mişbaħi’l-hewa
Bî surûrîn we’nbisaťîn we nişatîn we cezil
- 11 Bilbilan danîn serî ser ‘utbeya dergahê tu
Wan xeređ carek bibînin her du çavê tey bi kil
- 12 Der kitaba husnê dil dî nûnê Leylê nuqte şad
Katibê xeybê nivîsî mu‘tena û mu‘tedil
- 13 Bağçeya husna muqeddes rewzê ayatê cemal
Nake tefsîrê me haşil cumle şed keşşafê dil

¹³² Dema pêxember çû mihracê û piyê xwe datîne ser ‘erşê ‘ala

- 14 Ger di nîva şeb beratê de xuya bit rojê 'îd
Xerqî bin 'alem di behra nûrê xariq muştêmil
- 15 Kewkebê saqib bi dorê neyyiratê lem'e ro
Çûm xurûbê tev dema derkeftû roja muşte'il
- 16 Ger derê carek ji birca cewherê ew ro enî
Dê leyalî bin ji dunyâê fena û mutmeñil
- 17 Min ji baxê husnê yarê pir gul û reyhan çinî
Hemd dikim bo Heq Te'ala ez nebûm bilbil mişil
- 18 Lebsê xaliş-tebreq û sundûs bi ser tilyê beyan
Min dirûtin lê nela'iq ew bi qedda mu'tedil
- 19 Kî ji bax û beşçeê husn û cemala muhteşem
Mêweê hubbê hewa 'uzrê çinî ew bû ehil
- 20 Fahe fi'l-ercaî min fî Yusrî enwa' û şeza
Misku şî'rîn fî hebîbin zî kemalîn we feðil

Mefa‘îlun/mefa‘îlun/mefa‘îlun/mefa‘îlun

Behra Hezecê + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Nişan da ھusnê xariq bo cemî‘ê xaş û ‘am ebrû
Ji bo wê cewherê ھusna muqeddes bû xitam ebrû

- 2 Bi rûh û cerg û can û dil bi zerratê wucûda xwe
Bi şîranî didim ez şed teھiyyat û selam ebrû

- 3 Melaھet daye birca ھusnê pir Eqda Şureyyaê
Ji wê ‘eqda nucûmê da bi dil ‘işq û xeram ebrû

- 4 Ji şehd û şekkerê lêvê me‘anî xweş dibarin dil
Çewa tînin bi yek remz e wezîfa şed kelam ebrû

- 5 Gula bessam û bişkeftî di gulzara cemalê da
Ji bilbil girtî can û dil ne bes da şed xurram ebrû

- 6 Xuya bit carekê ger wechê wê zatu‘l-cemalê dî
Muھeyyer kit bi wê ھusna bedî‘ cumle enam ebrû

- 7 Di rengê nûnê Leylê da ku kêşa katinê mazûn
Li ser cama şedef tê dîn di wechê mişlê cam ebrû

- 8 Ku ew qewsê qerex da hiştî ser rewza cemala wê
Melaḥet kir ‘ecîb zêde di rewzê ḥusnê tam ebrû
- 9 Cemal û rewneqa rewza melaḥet her du ebrû ne
Ji ḥusna neqşê wê rewzê re da nemra tamam ebrû
- 10 Şeraba kewserê aba ḥeyatê bo dilê miskîn
Rîza ba le‘lê leb lakin di gel wê min meram ebrû
- 11 Li ma fewqê du celladan di şûrê made elmasê
Bi heybet tèn ḥucûmê da li dil din subḥ û şam ebrû
- 12 Leqed eşkû we me’ş-şekwa lede’l-feyḍa bizî nef’in
Elem da cerg û dil werdê rûwan ker¹³³ kir ‘izam ebrû
- 13 We-ma milna ila zarîn ‘eleyna bil hewa inna
Wecednahû bî e‘maqi’l-heşa na dit fetam ebrû
- 14 Fe inne’l-qelbe yehwe’l-hacibîne yebtexîl weşla
Ebed naçit ji dil carek bi tewbîx û melam ebrû

¹³³ Perçekirin

- 15 Ela ey serwerê xûban ji luþfa te telebdar im
 Ku yek carek nezer dim ez welew bit der menam ebrû
- 16 Di nûnê Leylê neqqaþê ezel kêþa li ser þada
 Te‘ale‘l-lah çî rewneq daye ev neqþê ku tam ebrû
- 17 Nivîsî wî di keþþafa cemalê ayetê husnê
 Beha û behcet û berqa ku da xûba þisam ebrû
- 18 Ku sulþanê ezel þusn û beha da new‘ê insanê
 Ecellê eþsenê teqwîm þebîba xwe meqam ebrû
- 19 Ji Yusrî ‘unsurê xamis beyana cewherê bû lew
 Di nezma lu‘luê menþûrê da rutba tamam ebrû¹³⁴

¹³⁴ Ev helbest ji xezela Melayê Cizîrî re nazîre hatiye nivîsandin. Bnr. r.26.

Xezela Musemmat

6

Mustef`ilun/mustef`ilun/mustef`ilun/mustef`ilun

Behra Recezê - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

- 1 Ev firqet û hicr û newa derdê mezin nabit dewa
Dara şebir hişk û ziwa lê darê hesret kal û şîn
- 2 Ya reb ileyke'l-muşteka min mûcibatîn li'l-buka
Mimma dehanî îneka berrun bi luţfi dil geşîn
- 3 Her dem me xware bask û mil agir di nîva cerg û dil
Lew xûn dirêjit çavê şil em şed esef tali' reşîn
- 4 Şed hesret û ab û girî min rêhtî ser wî agirî
Pê geş dibî natemirî qetrek ji reḥmet lê reşîn
- 5 Xweziya ku der 'alem mişal carek me bidya ew xiyal
Şûret muzeyyen ḥusnê ḥal lew kê m dibit pê kerb û şîn
- 6 Lew kê m dibî agir şewat lew em bi wê dîtî xweşîn
Dê çenebin agir şewat lew em bi wê dînê xweşîn

- 7 Merhûmetu'l-beri'l-kerîm saret ila dari'n-ne'îm
En'em 'eleyha ya Rehîm wexfîr leha ma testeşîn
- 8 Ey dil te 'adet ah û nal şîn û girî kir te du sal
Abê ji çeşman bes vemaal dar û devî pê bûne şîn
- 9 Matem te da çewrê tamam wicdan 'ezabê dîn 'enam
Bo te girîn tev xaş û 'am bûn dil şewat û hem neşîn
- 10 Rebbî bi cahi'l-Muştefa we'l-alî xeyrun min wefa
Cudlî bima yu'ta'ş- şefa we'rhem weşun mim-ma yeşîn
- 11 Ey xaliqê 'erşê mezin ey dafî'ê kerb û hezîn
Ni'met te bê 'edd û wezin dara ferec der dil ke şîn
- 12 Yusrî ji ber hemmû xema şahî û rahet wî nema
Ey fatirê erd û sema rehmet ji bo Yusrî bişîn

Xezela Musemmat

7

Mustef' ilun/mustef' ilun/mustef' ilun/mustef' ilun

Behra Recezê - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

- 1 Ah û fixan şed el-eman tîr û keman dil kir nişan
Pir derd û jan der qelb û can min dî ji wan dêm kewkeban
- 2 Ew yar û xil anîn ji mil qews û nebil avête dil
Çar şed û çil tîrê qeril lertzîn û kul dan rûh û can
- 3 Şêrîn leba dêm kewkeba Hudhud Seba mesken Seba
Da min neba dil kir heba şed merheba min gote wan
- 4 Wê xed gulê çîn sunbulê xal filfilê rû meş'elê
Qelb û dilê min wek qelê heland belê rakir duxan
- 5 Şêrîn lebê dêm kewkebê mahê şebê dil musqebê
Weqtê ku bê ya Reb nebê her mezhebê derd û xeman
- 6 Dêmê bi nûr perde sutûr ji bo ne dûr neqşê di hûr
Lê bûn zuhûr ew bê quşûr lê girtî sûr wan eswedan

- 7 Ten ‘enberê bo ma werê dêm fenerê leb kewşerê
Min dil birî danî serî lê da ferî tîr û keman
- 8 Sedd û sedem derd û nedem ser ta qedem têk kir hedem
Çab û ‘edem ez ab û dem her çi xedem bo laristan
- 9 Ew zehregûn jê şad û nûn kul kir derûn jê ab û xûn
Da’im diçûn nale funûn wek erxênûn hatin ji can
- 10 Yarê şepal mehrû metal hûsn û cemal nûra zelal
Şewq û şemal da dil behal heyran û lal mabû lisan
- 11 Xob û zêrîf nar û ‘efîf gerden xefîf ned û şerîf
Qedda elif bejna letîf dêma nezîf atêş me can
- 12 Nazik beden dil bû weten ew keft û ken ruh bû semen
Borîn li ben da left û qen dê şûx û şen kê pir zeman
- 13 Dêma dur î zendê zer î dîsa derê ew ser perî
Cerhê berê nû kul kirî derman werî jê ra me can
- 14 Haze’l-cewa hâle’n-newa yeşwu’ş-şewa fewqe’l-qewa
Dabîn ruya haze’l-hewa ‘emma hewa hel ‘arîdan

15 Hel yeştefi qelbî we fihî yextefî narun tefî
Herqen we fî lutfin xefî ma yektefi Yusrî'r-mehan



Xezela Musemmat

8

Mustef' ilun/mustef' ilun/mustef' ilun/mustef' ilun

Behra Recezê - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

1 Îro li min dijwar e dil bê rahet û bê çar e dil

Her dem bi pêt û nar e dil lew her bi ah û naz e dil

2 Wan 'eqreb û wan eswedan yek yek bi can û dil vedan

Lê zêdetir zehra xwe dan lew kuştîyê şehmar e dil

3 Dîsa li selwayê şebîn cotek ji wan marê şebîn

Wan zîqt e her wek xeşebîn musqeb kirin yek car e dil

4 Şewq û şemala rûmehê elf û evîna wê şehê

Da dil lehîba dojhê lew pir şewat û nar e dil

5 Weqtê ji perdê hate ew bû dew û nûr û lem' e cew

Berqek li ser dil daye lew wek kewkeba seyyar e dil

6 Çeşmê seya dîmê gulîn carek ji ser biska hilîn

Ba dil ke rehm û luft û lîn lew bêkes û bêçare dil

- 7 Lew name fi be‘di‘l-leyal qelbî leca tîfe‘l-xiyal
Minkum ela ya ze‘l-cemal lê da‘ima hişyar e dil
- 8 Wan rû-perîyy û xed-gula pîr derd û afat û bela
Da ‘endelîb û bilbîla lew wan bi şewk û xar e dil
- 9 Qewsê birû şem‘a li rû pêt û xurû da hundiro
Ten matenê lew da firû perwaze wek çeyyar e dil
- 10 Fû xatemê rû meş‘elê sosin ji ser rişka gulê
Hilda cîger can û dilê min hûr kirî deh par e dil
- 11 Îro dilê min wê şehê şehnaz û şêrîn meşehê
Avête carek ser şehê jendê li ser mîsmar e dil
- 12 Ew her du şad û her du nûn anîn ji sihrê pîr funûn
Dan ‘aşîqa ser‘ û cunûn lew pîr ji wan xeddar e dil
- 13 Ew Yusriyê zana xeyûr şê‘ra te gotî bêquşûr
Naçe ji te huzn û kudûr dil merkeza êşa ye dil¹³⁵

¹³⁵ Nazîre ji bo xezela Melayê Cizîrî. Bnr. r.26.

Xezela Musemmat

9

Mustef`ilun/mustef`ilun/mustef`ilun/mustef`ilun

Behra Recezê - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

1 Min dî ji hîcra xed gula pir derd û afat û bela

Wan dil helandin wek qela feryad ji destê rûgula

2 Weqta ji min xatir ku xwest min hêş û `aqil çû ji dest

Min wê demê mirna xwe xwest feryad ji destê rûgula

3 Van rûgula `estî¹³⁶ kewand ma şik û şîş tê de tewand

Can û cesed her du şewand feryad ji destê rûgula

4 Îro ji şewqa xed gulê min dil fitîla meş`elê

Mişlê Nişanê wek Melê feryad ji destê rûgula

5 Min dî ji hicrana hebîb derdê mezin êşa xerîb

Da`im di dil pêt û lehîb feryad ji destê rûgula

6 Rûgul ku fincana şerab da min li ser tilîyê zirab

Dunya li pêş min bû serab feryad ji destê rûgula

¹³⁶ Peyva hestî li vir bi eyn hatiye nivîsandin.

- 7 Ew rûgula wek ro-enî şekker şikand û hem kenî
Go kuştîyê ‘işqa min î feryad ji destê rûgula
- 8 Ew keff û tilîyê sade nûr mey rêhte fîncana tîhûr
Jê ra’îha mîske di fûr feryad ji destê rûgula
- 9 Ew rewzeya hûsn û cemal ew menzera kewkeb mîşal
Danî di dil şewq û şemal feryad ji destê rûgula
- 10 Ew nazîka şêrîn kelam sed roj û sed bedrê tamam
Nabin jê re hemî xulam feryad ji destê rûgula
- 11 Ew Leyletu’l-qedra ‘uzar ew şeb Berata zulfîyar
Da dil lehîb û pêt û nar feryad ji destê rûgula
- 12 Ew xed gula zemzem riçab leb kewşera şekker di nab
Mey da tamamê şeyx û şab feryad ji destê rûgula
- 13 Rûgul li ser tîlyê ‘eqîq da ‘aşîqa cama rehîq
Bê hêş ketin jê şed ferîq feryad ji destê rûgula

14 Yusrî ji ‘iŝqê yek newat ŝîn bû di dil jê darî hat

Pir jê çinî agir ŝewat feryad ji destê rûgula¹³⁷



¹³⁷ Ev helbest ji xezela Melayê Cizîrî re nazîre hatiye nivîsandin. Bnr. r.27.

Xezela Musemmat

10

Fa'ilatun/fa'ilatun/fa'ilatun/fa'ilatun

Behra Remelê - + - - / - + - - / - + - - / - + - -

1 Selwî qedda xed gul î tu sipî zenda zer tilî tu

Zînetâ cerg û dil î tu dil revandî dil ji min

2 Ro di nîva şeb beratê kewşer û aba heyatê

Şad û nûnê leb nebatê dil revandî dil ji min

3 Cennetu'l-me'wa cemalê rewżeya 'izz û kemalê

Rûgula kewkeb mişalê dil revandî dil ji min

4 Şeb Berata zulfî yarê Leyletu'l-qedra 'uzarê

Şubhê 'îda nazidarê dil revandî dil ji min

5 Eswedîn leffê li bala bû wê miska zulf û xala

Zînetâ qewsê hilala dil revandî dil ji min

6 Awirê eswed 'uyûna remz û nazê şad û nûna

Rakirin pir qetl û xûna dil revandî dil ji min

7 Şubhê ‘îdê der şeba reş kir tecellê ruh dibû xweş
Lê şifet hûra şêrîn meş dil revandî dil ji min

8 Zülmeta ser qurşê rojê can û dil kir mislê dojê
Kê ku dî dil pê disojê dil revandî dil ji min

9 Şeb ji ser rojê ku rabû ateşê Mûsa xuya bû
Dil ji ‘uşşaqan cuda bû dil revandî dil ji min

10 Awirê wan her du çeşman kî ji ber wan ‘eql û hêş man
Ê ku jê dî her nexweş man dil revandî dil ji min

11 Yusrî cerg û dil disotî lew ku pir şê‘ra digotî
Wek Nişanê Şeyxê Botî dil revandî dil ji min¹³⁸

¹³⁸ Nazîre ji bo xezela Melayê Cizîrî. Bnr. r. 27.

Xezel

11

(Fa'ilatun)Fe'ilatun/fe'ilatun/fe'ilatun/fe'ilun(fa 'ilun)

Behra Remelê ++ -- / ++ -- / ++ -- / ++ -

- 1 Bi heyata te qesem min tu xiyal î şeb û roj
Tu di dil wek lukuzê şewq û şemal î şeb û roj

- 2 Ku bi mir'atê muhebbet me di qelbê xwe te dî
Ger çî dîr î bi cesed lê tu li bal î şeb û roj

- 3 Ji 'ezab û elem û derdê xwe ey Yusrî mudam
Tu ji çeşmê xwe sitêran vedimalî şeb û roj

- 4 Bese ey Yusrî te go şê'rê şewatê bişewat
Tu wî bispêre Ilahî Rebbê 'alî şeb û roj

- 5 Kull û derd û elem û kerb û cefaê ku te dî
Tu bi wan derd û kulan her we dikalî şeb û roj¹³⁹

¹³⁹ Nazîre ji bo xezela Melayê Cizîrî. Bnr. r. 25.

Xezela Mesemmat

12

Mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun

Behra Hezecê + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Nedî neqdê dil û can ser nuhas û paxer û mermer
Li sûk û çarşiya cewherfiroşan dil bi cewher de
- 2 Di baxê dilber û yaran biçî werda ji gulzaran
Meger xaran ji exyaran di caê wê gula zer de
- 3 Ji xeyrê te nema yarek neda qelbê me reşmarek
Bi zarî şekerê carek were xweş ke dilê merde
- 4 Were zû her wekî posta bike te'rîf hewa dosta
Bi resm û heddeya hosta ku çêbit 'eksê hem ter de
- 5 Bi husnê kil de çavê şil bi bihna wê siya bê xil
Ji luţfê qelb û can û dil zabad û misk û 'enber de
- 6 Gelek heşret gelek axîn kişandî me ji ber daxîn
Di gel nemrîn û nemsaxîn me dil pir daş û pir derd e

7 Di vê silka ku sadennûr me danî lu'luê menşûr
Ku Yusrî dil bike mesrûr ji qeyda  esretê berde



Xezel

13

Mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun

Behra Hezecê + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

1 Du reşmaran li dor bedra munewwer dager û helqe

Di meydana qitalê wan li min dil kir du şed felqe

2 Bi şehmaran muşelsim bûye ginca qameta selwa

Di fetħa xerneya ħusn û cemalê hebrî bin xelqe

3 Biye zêr û ziber dunya li min îro di 'alem da

Ji ber derd û xema derbû di dil da cerħe û pelqe

4 Ji ab û histirê carî ji ber daħa dilê meħzûn

Di xeddê zer de min çêbûn du xetħê morî wek silqe

5 Li van derd û xeman bigre şibak û pencere û taqan

Derê dil Yusriya bigre li ser wan tu bi şed xelqe

6 Emanet şed emanet da nedî dil tu bina ehla

Bike teşrîħ tu jê xar û xes û xwaran bi sê telqe

7 Ebehtum bi-dumû'in iz ebehtum bi-đıřarin iz
Leqeytû min esa e'yel esama kuntû lem elqe



Xezel

14

Fe‘ilatun/fe‘ilatun/fe‘latun/fe‘ilun

Behra Remelê ++ -- / ++ -- / ++ -- / ++ -

1 Te bi xewf û bi hezer dil ji me melhûfê kirin

Lew bi qeydê esefa dil te me wek şofî kirin

2 Ez nizanim bi çi sûc û çi xeta û çi gunah

Me di zindan û hebixana xwe mewqûfî kirin

3 Bi şehê cewr û cefaya xwe çû mû dil şekenî

Bi kelîmatê xezeb dil li me mendûfî kirin

4 Me nedî weşfê zemîran di tu qewlê mezëban

Lê bi ‘işqa xwe zemîra me te mewşûfî kirin

5 Me ku ayatê cemala te li elmasê dixwend

Xeç û herfên Şemedî şibhê xeçê kûfî kirin

6 Şemera medh û şena an şecera levz û eda

Ji te ra min di hezar rengê de meqtûfî kirin

7 Cewherê medh û şenaê di ‘uqûdê şedefî
Me ji bo zînet û xemla te ku meZRûfî kirin

8 Ez dizanim te xelîq in bi cenabê te şehê
Lê ji ‘eynê kerema xwe te ne meşdûfî kirin

9 Mun‘etif ma dibû Yusrî bi du şed fa û heta
Lê bi waweynê xweyê zêr hel te me me‘tûfî kirin¹⁴⁰

¹⁴⁰ Nazîre ji bo xezela Melayê Cizîrî. Bnr. r. 28.

Xezel

15

Mef'ûlu/mefa'îlu/mefa'îlu/fe'ûlun

Behra Hezecê - - + / + - - + / + - - + / + - -

- 1 Her lehze kişandî me divê dêrê xerab e
Pir cewr û cefa û elem û derd û 'ezab e
- 2 Şed ah û fîxan tèn me ji nîva cigerê kul
Eşkîne me dicarîne ji manendê hubab e
- 3 Lê dûr e ji eşkîn me ku dûzexê vembrîne
Nêzîk e ji pêta cigerê behrê zuwa ye
- 4 Ne'j ateşê dil xerqê ke min abê du çeşman
Ne'j histirê çavê me be duxan ji me rabe
- 5 Min dil wekî barûd e li ser danî te ateş
Rehmê bike carek li me pir xêr û şewab e
- 6 Tedbê me bikuj bi elem û derd û cefaê
Zanim di rizaya te mirin 'eynê şewab e

7 Xweş hat kewê gozel me bi şahîn û fereh bû

Şahîn qezaê ji xwe ra bir bi hewa be

8 Eşraqê şifet bû li te ‘erza emelê min

Hêvî me ji lutfa te ku bê husn û cewab e

9 Berqek ji şena husn û cemala te dixwazim

Ûacet me xurşîdê nehî ger tu xuya be

10 Wek tûle li dergahê te Yusrî ku dikûze

Hêvî me ji lutfa te ku negrî li me babe

Xezel

16

Mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun

Behra Hezecê + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

1 Du ța sosin du ța gul min girêdabû di nav hev de

Eger çarê dijî hebwa bila-şek ew dibû qevde

2 Lebaleb sîne min reyhan û sosin werd û gulnar in

Ne ku sosin tune ya gul welê kes nîne berhevde

3 Were carek temaşa ke li baxê werd û nesrîna

Gul û reyhan û sêv û sunbulan serda bi ser hevde

4 Teferruc ke li narinc û binefş û çiçekê taze

Dibînin ger te dil xweş bî bike teftiş hemî tevde

5 Biçin werdan ji gulzarê hebîba min welê zinhar

Ku siqlet dê li xûban ew te babêjin bi ser devde

6 Dibî mecrûhê derbê wan nîgar û şahidê xezban

Ku xûna reş di cerhê dil bi tîrê dîlbira kef de

- 7 Dixwazî tu eya şofî dilê reş ger te rewşen bî
Here meyxaneya saqî ji bo te camê qerqef de
- 8 Wekî ‘enqa tu perwazî bidî dil pê munewwer bî
Ji rengê ‘endelîban ku li baxê şorgulan refde
- 9 Dema bê der ji perdê ew hebîba dilbera nazik
Hela bêje meke jê ra di wê gavê nebit ‘evde
- 10 Nebit mecrûhê ‘işqa wê perî rengê şifet horî
Şifet perwane perwazê nedit şem’ê di nîv şev de
- 11 Nebêtin Yusriya ger te xerez zulfê perî-rûyan
Kî ye va sosin û werda li qedda nêgizê lev de

MUSEMMAT

Muselles

1

Mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'êlun

Behra Hezecê + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

1 Eya şêrîn şifata min eya qend û nebata min

Eya şebr û şebata min eya rûh û heyata min

Derê carek ji perdê da bibînim bejn û balaê

2 Çi pir husn û cemal î tu ne wek bedr û hilal î tu

Yeçîn nûra zelal î tu li kewnê tev şemal î tu

Derê carek ji perdê da bibînim bejn û balaê

3 Dixum sondê bi xala te bi selwa bejn û bala te

Bi wê husn û cemala te nedî kes min bi nala te

Derê carek ji perdê da bibînim bejn û balaê

4 Bi wê husna Xuda dahê ku 'alem tê temaşahê

Ne hin kes misle wê şahê bi qedr û qîmet û cahê

Derê carek ji perdê da bibînim bejn û balaê

5 Di ھusnê ‘alî şan î tu ne bedra asiman î tu
Ne hin dunya de şanî tu xezaya rûh û can î tu
Derê carek ji perdê da bibînim bejn û balaê

6 Cemala mah û salaê ne mişle Zîn û Leylaê
Necîb û şah û mewlaê şeref pir dî bi lewlaê
Derê carek ji perdê da bibînim bejn û balaê

7 Bi şehd û şekkerê lêvan bi miska ser gul û sêvan
Dibûn ‘alem li te mêvan mezin nûrek te kir çêvan
Derê carek ji perdê da bibînim bejn û balaê

8 Ji wê ‘eşra ku ez bû me mumeyyez ta xweyê rûme
Bi navê te bilind bûme heta gerdûnê ez çûme
Derê carek ji perdê da bibînim bejn û balaê

9 Eceb nîne bilindbûna şexîr û şaxîr û dûna
Ji vir heta bi gerdûna bi navê rind û xweş nûna
Derê carek ji perdê da bibînim bejn û balaê

10 We-lem teşxî ile’z-zarî bi-ħubbîn fi’l-heşa sarî
We şewqîn ‘uzrîyîn narî we seccîm ‘endemî carî
Derê carek ji perdê da bibînim bejn û balaê

11 Ela ya rewequ'd-dehrî ela ya kasîfu'l-bedrî
Ela ya munteha fexrî ela ya mubtefî Yusrî
Derê carek ji perdê da bibînim bejn û balaê



Taşîr

1

Mustef`ilun/mustef`ilun/mustef`ilun/mustef`ilun

Behra Recezê - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

1 *Dilber şekîna şekerek fe-qultû ya rûhî meta*

Ye'tî lene't-tencîzû we'l- we'dû's-şerîfû qed eta

Ya leyte şê'rî hel era mînkum qerîben wecneta

Go mim heta xaîr hebit min go çikim ez ba heta

2 *Zulfân tu bes çîn çîn bike biskan muqabil dîn bike*

Lê tu bi tedrîc hîn bike meczûbê kewkeb tel'eta

Çendê xuyê ulfê hebin meqtûlê wan şulfê te bin

Pêşkêşê yek zulfê te bin mulkê Xetîn textê Xeta

3 *Dilbendî dafa zulfekî keftî kemenda ulfekî*

Bo kuştîyê yek şulfekî lew ez dikêşim hesreta

Yeşwî şewa ye's-şewqû şey yekwî heta ye'l-hubbû key

Helfî yedi'l-meftûnî şey ew keyfê esne' ya feta

4 *Zulfîn bi tu şêrîn leban zehrîn e şubhet eqreban*

Lê tê ji her çar mezheban fetwa tu bigrî qametan

Şeb hate ser roja ferî carek izîn da go werî

Lê min ji subkê pir girî îro tenê girtin du ça

5 *Nisbet perî zîba ye ew wek nêrgiza yek a ye ew*
Rû muşhefa xoca ye ew ez lê dixûnim ayeta
In qîle ferdun qed 'ecel men nale şe'wen qed weşel
Ya men yera xilli fe-he'l-yeşbeğ bi-şeyîn qameta

6 *Me'j beğçeya yar zeyyînî bê-pirs Mela sêvek çinî*
Şabûm bi sêvê dil kenî yarê kişandî xîreta
Yusrî' tebîr mîn hefvetî qed eddebetnî munyetî
We bî-ma ceneytû ħibbetî el qed 'eleyye cînayeta

Mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun

Behra Hezecê + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

1 *Çi nûrîn t̄el'etek bo min di camê da temaşa kir*

Bi wê husna munezzeh dil esîrê nûn û şada kir

Şifet perwane mam da dil şihab û lem'eê agir

Bi şed t̄ewrî 'ezabê can û dil talan û yeşma kir

Ji hûş û 'aqilî xistim dema perde ji rû rakir

2 *Niqabê Yûsifî avêt we 'alem xerqê nûrê kir*

Kufur rabû ji îmanê me dil teşbîhê Tûrê kir

Şena berqa tecellaê li min keşf û huşûrê kir

Wucûda muşleqa zatê li Tûrê dil zuhûrê kir

Wucûda 'arîzî bo meş w û min yekca xwe wenda kir

3 *Di gulzar û gulistanê nema qedrê gulan êdî*

Li cem bilbil dema kir mêze baxê dilberan hêdî

Gula dehhak ku bişkefte di wê rewza cemalê dî

Ji bo bilbil zeman bû wek zemanê Hezretî Mêdî

Dema werda rûyê dilber dilê 'aşiq bi xwe şa kir

4 *‘Eca’ib heyretê girtim nema ‘alem li meydanê*
Bi mir’ata muşeffa min nezer da xal û nişanê
Ji idrakê mucçered bûm ji ber wê dew’ û lem’anê
Çi şûret mezherê sirra nebû ayatê Furqanê
Nezer min daye rû weqta ewê zulfâ xwe ber ba kir

5 *Nezer iksîrê e‘zem ew ku şemsa ‘alem-ara ye*
Kesî ew rû nedîbû der semaê dil hubara ye
Şukur lillah ku dil min cahî hubb û dost û yara ye
Li wê meyxaneyâ nûrîn her ro mey tê bi bara ye
Ku qelbê paxirî me her wekî zêrê muşeffa kir

6 *Dema dil kefte dama zulf û sîmayê hebîba xwe*
‘Elîl û xeste mabû ew li dergahê tebîba xwe
Ku cerhan bîne ser hev ew bi dermanê lebîba xwe
Ji babê luţf û ihsanê şifa dayê bi tîba xwe
Ser û can û cihanê me bi yekcarê fîda pa kir

7 *Ji lew axîn li dergahê xezala şîr û şeh-efken*
Ji xeyrê ‘utbeya yarê tu waran qeţ meke merken
Bike beşta zîra‘ê berr û seydoş her ew e mesken
Bi heşret hem bi zarîn û girîn û her bes e ev ken
Ji qeyda mekrê dunyayê bi saya dil ku aza kir



8 *Dibînîm şukur û li'l-lah halê ebnayê cihanê tev*
Di vê dêrê xerab ew mar û dûpişkan dikin ber hev
Çû kurmê qoze pêçan e li xwe qoze nema jê rev
Welakin qul dikin qoze ji van kurman tenê yek hev¹⁴¹
Ji rûyê feđl û îhsanê ku 'eyna dil mucella kir

9 *Dibêjim kafîr e secde nebit ê ber qed û qamê*
Welê mu'mîn ew e îman ji kufra kafîrê camê
Keşif kir ew dibe la'îq ji bo mizgîn û peyxamê
Di şerha muslima husnê ev e fetwa ji bo 'amê
Ji Qu'rana cemala xwe ku ayet wê huweyda kir

10 *Bi şîrê ebrû şîranî ji çeşmê şahîbê heybet*
Dil û can û ciger ruħ perçe kir xel lê dima heyret
Bi sed tewrî 'ezabê ez gerandim rakirî hêcet
Nema şey'ek ji bo vî bilbilê miskîn û pir zeyxet
Ser û saman û dil yekser ewê talan û yexma kir

¹⁴¹ Heb

11 *Kerem ke saqiya yek destegîrê camê mey bîne*
Ku hey bin tev bi wê camê me qelb û can û dil sîne
Mukedder ma dilê miskîn di fincanê de mey nîne
Di wê weqta te da min ew meya şafî we nûrîne
Me dî miskîn û dil merd e xênîy û hem jê îhya kir

12 *Muqabil hate mira'ta dilê min wechê mehbûbê*
Me berda qibleya husna muqeddes 'eynê meqlûbê
Ji exyaran nedî kes tê ji xeyrê ferz û mendûbê
Nema cî tê ji bo şey'ek ji xeyrê zikrê merxûbê
Xwe tê de dît û kes nîne ewê dîsa xwe wenda kir

13 *Bila dil xeste bî ey dil di qeyda derdeya raşa*
Welew derd û xeman ew lê giran kin wek berê aşâ
Heye vemrit ji dil atêş bi wê berda cefa haşa
'Inayet ger hebî bo dil li dunya her ew e paşa
Çiqa pîr derdê bê derman e madam wê muheyra kir

14 *Dizanim derd û ekdarê hebîbê cumle îhsan in*

Li Yasîn Yusrî lew derd û elem tev jê re nişan in

Hezar hemd û şukur bo Heq Te‘ala derdê derman in

Îlac¹⁴² û melhema cerhê tivingê zenb û ‘işyan in

Ji ber vî ‘Eskerî jê hemd û şukr û hem temenna kir



¹⁴² Îlaç bi (l) elifê nayê nivîsandin, peyvek Erebi ye û bi eynê tê nivîsandin lê belê di vê helbestê de bi elifê hatiye nivîsandin

Texmîs

1

Mefa'îlun/mefa'îlun/mefa'îlun/ mefa'îlun

Behra Hezecê + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Sena berqa tecellaê li can û dil 'ekis daye
Li ser şem'ê şifet perwane min zû can û dil daye
Ji zewqa badeya camê hiş û 'eqlê me wundaye
Ji neş'a badeya kasê dilê mecrûhê şeyda ye
Ji şewqa badeya saqî zemîr û dil mucella ye
- 2 Nezer carek bide şofi bi çavê min ku dûrbîn e
Li naz û dilber û yar û şifet horê ku min dîne
Bi vê se'y û sulûka zahirî saqî mexapîne
Were şofi musilman be bi saqî secdeê bîne
Ku sûret mezherê zatê sifâtê Heq Te'ala ye
- 3 Bike teqwîm dilê yek ta beder sirr û 'elanî da
Şebir kin ber cefa ey dil di vê seyra me'anî da
Ji ne'leyna qedem derxe di 'işqa cewheranî da
Dilo ernî meke gazî cewaba "lenteranî" da
Ji ber fikrê di Mûsaî dilê min Tûrê Sîna ye

4 Dilo ger te dibê carek ji tenzîma tê ekwanî
Bikî seyrê di eþwarê heqîqet seyrê rewþanî
‘Urûc kî tu li eflak û semaê ‘ilm û ‘irfanî
Bixwazî gewhera ‘îşqê bi terka emrê nefsanî
Eger cuz’ek ji me maye yeqîn neqşê heyûla ye

5 Buhar e wextê seyranê ku nesrîn û gulê-geştên
Were ey ‘endelîbê dil şedaê bulbula xweş tîn
Mebe meþzûn çû Yusrî lew perî mestane û meş tîn
Seher hero li meyhanê xerab û mest û serxweş tîn
Mela ‘uzrê me meqbûl e ku dilber mahê sîma ye

Fe‘ilatun/fe‘ilatun/fe‘ilatun/fe‘ilun

Behra Remelê ++ -- / ++ -- / ++ -- / ++ -

1 Çemena ھusn û beha rewzê cemal î şeb û roz

Ji sera ta bi qedem nûra zelal î şeb û roz

Li sera perdeê can şewq û şemal î şeb û roz

Tu dîzanî bi Xudê min tu xiyal î şeb û roz

Bi xiyala xwe mudam min tu li bal î şeb û roz

2 Şerھ û ھalê me eda kirye sukûtê ne ku deng

Kull û derd û xemê ‘işqa zerîya keş e ji reng

Me ciger şubhetê barûd e li ser pêt û pereng

Her bi mîzan direşînin cigerê tîr û xedeng

Ji neseq sa’iq e me’j qewsê hilalê şeb û roz

3 Li ciger daye ji nîv zulmet û nûrê bisekîn

Zerîya nazik û xwey şê’r û qebaya kesikîn

Yan ji tîrê sî û tavê me nema qeţ tesikîn

Mişlê goyîn te rewan nale ji dil tîn mesikîn

Em nizanin tu çira her we dinalî şeb û roz

4 Te bi ah û heseratê xwe qulûban cerrî kir
Te bi pêt û zeferatê xwe bi hōran berrî kir
Te bi wan abê du çeşmê di xwe ateq qerrî kir
Te bi feryad û fîxanê di xwe bilbil kerrî kir
Ellah Ellah ji çi derdî we dikalî şeb û roz

5 Te li rê danî du çeşmê xwe ku tê rozenî kit
Ro te neşsarê qedem ger ku li ser moşenî kit
Ji te dil bir ku ji lebsê hubbê lê cewşenî kit
Da ku dilber qedemê lê binehit roşenî kit
Lê tu xûnê we ji çava ve dimalî şeb û roz

6 Cuz û cewher bexişandî te ji wê cewherê ra
Pur bi şahiyî û bi şahane bi leb kewşerê ra¹⁴³

¹⁴³Dewama vê texmîse natiye peydakirin.

Fe'ilatun/fe'ilatun/fe'ilatun/fe'ilun

Behra Remelê ++ -- / ++ -- / ++ -- / ++ -

- 1 Gulê iqbal û se'adet me ji baxê Iremê
 Ku bi cellabê du'a hate ji kenza keremê
 Dibe warê çû ku lê da bereda keyf û kemê
Hêviy û tewqe dîkin em ji Xudana heşemê
Wê nigar û senem û padişeh û muhteşemê
- 2 Ku me bînit nezerê 'alî li halê me binêr
 Da bizanit ku di dil da me çîqa xençer û kêr
 Ji rûyê 'adiliy û belkî bikit şefqe û xêr
Carinan bendeê dil sohtiyê mecûrê fenêr
Bi lebê le'lê şeker barî ji 'eynê keremê
- 3 Me ji kerb û esefa dil ne xezâ û ne menam
 Çi diqewmit ku tu şakî me di nîv cumle enam
 Bike luţf û nezerê tu li me rind û hesenam
Pirsiyarê bike carek li me şêrîn di hênâm
Ku perihtîne fîraqa te li ser derd û xemê

4 Ku ji menzûmê du çeşmê me bixwazî tu neba
Dê beden şehd e ku min dil biye menşûrê heba
Ku negirt durr û lu'alê me ji wan le'l û leba
Erne Hudhud ji Seba bêt û wekî baê seba
Dê guher wê bigêhit dest me ji peykê heremê

5 Ne ji baranê du çeşman dibim ez pêt û lehîb
Ne ji pêt û lehebê dil ke xereq dem' û sebîb
Çi ku dûr bûme ji yarê me ne eħbab û qerîb
Purse yarê li me bit werne xwe mehcûr û xerîb
Dê li kî 'erzê bikim vê xem û derd û elemê

6 Munşerif nabe me dil gerçi di her weqt û zeman
Lê ji wan kesr û îzafê te bi feryad û eman
Surrê dil tê te zuhûrê qe bi êş û eleman
Haşa li'l-lah ku bikim eşkere van derd û xeman
Wer bisojim ji xemê 'îşqê tu ser ta qedemê

7 Ku nehat destê me weşla te bi sed cewher û zêra
Dil û can her dû fida kir me ji wê bejn û qedêra
Lê te dîsa zerreyek qet ji wişala xwe ne dêra
Me bi sehraê wişala xwe derîn tu ji Xudê ra
Werne weqt e ku bibin xerqê di behra 'edemê

8 Ku sena berqê cemala te ji nîv zulmet û nûrê
Leme‘anek de li kewnê hîv û ro têxe qusûrê
Ku ji ser rewzeê ھusna xwe vekî perde sutûrê
Ji gulistanê cemala te gulek bête zuhûrê
Ji dinê dê biçitin navê buhuşta Iremê

9 Me bi ‘eşwaq û evîna te di dil narê diîsin
Me nehin hemdemê derdan çî ku bê yar û enîs in
Şeb û roj em bi hewayê te ji manendê weşîs in
Şerhê ھalê xemê ‘işqa te ji ku tête nivîsin
Medhî û ewşafê cemala te kuca tê reqemê

10 ‘Esel û şehdê weyaxut tu nebat û şekerî
Li sera perdeê xûban tu gula mu‘teberî
‘‘Eھsenelullah û tebarek’’ çî bi ھusn û nezerî
Wê mecalê ku cemala xwe tecellî dikirî
Lazim e secde bibin ber te di wê gav û demê

11 Mûyekî ez ji te nadim bi du sed ‘izzet û Zîna
Ku bi ھukmê te xweş im ez tevî van cerh û birîna
Ji te ra ferz e îta‘et me di her lehze û ھîna
Secde bin ber te riwaye di hemî mezheb û dîna
Kî dibit mişrik û kafîr ji wê şerîn û femê

12 Ji gulaba serê zulfa te şemek bête wucûdê
Bi deh şed te'ne li miska Xetenê 'enber û 'ûdê
Tu yî meqşed û murada me ji mihrab û sicûdê
Ger bibim ber te sucûdê di dema keşf û şihûdê
Me li dil dê bidirit pertûy û nûra qedemê

13 Qed 'era min hubbike'l-'uzrî bî qelbî qebesa
Hel lekum en tenzurû 'etfen ileyhî fe-'esa
Yecidu'r- rewşê mine'l-herri we rûhen deresa
Qibletî wechukê fi kullî şebahîn we mesa
Bi du ebrûyê te canan dixurim ez qesemê

14 Cewherê ferdê di husnê te di dil daş û birîna
Fikirî qeş nekirî şefqe bi şed ab û girîna
Ne 'edîl î tu bi husnê bi tu mehbûb û qerîna
Mûyekî ez ji te nadim bi du şed Zîn û Şêrîna
Çi dibit ger tu hesêb kî me bi Ferhad û Memê

15 Selţenet te ku li eqlîmê dinê têkî gerandin
Te li ser cumle mulûk û umera hukmê xwe şandin
Şed wekî Qeyser û Xaqan te bi kes ra veşewandin
Te Firing û 'Erebistan û Mecer têkî sitandin
Celewê xweş fikirîn hatine nûba 'Ecemê

16 Yusriya çendî heba dil ji te da baê felaê
Mişlê ma ger çi nefî kir cezmê da şubhetê laê¹⁴⁴
Lê belê hemd û sena tu ku ji aşarê belaê
Me didî wana se‘adet seyrê kir şubhê Melaê
Tu bi navê me gedaê bikişînî qelemê



¹⁴⁴ Ma û la di ‘ilmê nehwe de edatên nefyê ne.

Fe‘ilatun/fe‘ilatun/fe‘ilatun/fe‘ilun

Behra Remelê ++ -- / ++ -- / ++ -- / ++ -

1 Me ne şebr û ne sukûn ey zeriya me şebehê

Zankî rûh soxteê başit ji evîna te şehê

Goftem ez badê seba ra ji dilê sohtî çehê

Ey nesîmê seherê ma di mecala sibehê

Şed selaman bigehênî ji me wê padişehê

2 Ya li min sohtî ciger lebşekera ebrû hîlal

Zerîya nazik û dêm gewheriya mihr û mişal

Serwî qed xonçe li ba qewl û soxen şehrî seyal

‘Er‘era qamet elîf neyşekera şox û şepal

Nazika sîme ten û Xusrew û zêrîn gulehê

3 Bi leţafet here ser dêmê hilîn şetrîy û zulf

Teb‘ê nazik nekirî şiqlet dibî mani‘ê ulf

Bi hezer lew nere wê yaxût û we‘dê bikî xulf

Diberê da tu bibûsî bi du şed zarîy û luţf

Asitan û der û dîwar û şibakên qelehê

4 Qul meta ma nîltû ya rîhu'ş-şeba minke eman
Ji şudûda te di dil şahî û raħet me neman
Sebebê bû hemî da û kul û derd û eleman
Nameya cewr û cefa û elem û derd û xeman
Dê bi destê zeriye muħteşemê serwî sehê

5 Belkî xûrbet ke Merîxa ne hes û meş'emetê
Keşfê bit tali' di nîva şerefa meymenetê
Riqqet û şefqe ku bêtin dilê ħorî şifetê
Belkî dilber ji rûyê 'adilîy û merħemetê
Reħmekî kit bi feqîran we bipirsit gelehê

6 Çendî bêjî di evîna te de ew nebde we ye
Heçî renc û elem û cewr û cefa tev ji te ye
Fereħ û keyf û tesellî me di dil da tune ye
Ma ji ber derb û firaqa te sukûnek me heye
Cerg û dil her du binalî ne wekî ceng û jehê

7 Bes ke cewr û sitemê li me ey ruħ û rewan
